

**BAJARÊ CIZÎRA BOTAN
Ü
HUNERA MÎR BEDIRXAN**

KONÊ RES



BAJARÊ CIZÎRA BOTAN Û HUNERA MÎR BEDIRXAN
Konê Reş

WEŞANÊN AZAD

Dîrok: 02/05

Gerinendeya Weşanê

Eslîxan Yildirim

Sererastkirin

Weşanê Azad

Berg û Rûpelsazî

J&J

Wêneyê Bergê: Medreseya Sor

www.erbuinsaat.com

Çapa Yekemin/2013

Çapxane

İMAJ MATBAACILIK SAN. TİC. LTD. ŞTİ.
Litros Yolu, 2. Matbaacilar Sitesi, C Blok 2 BC 6
Topkapı/İstanbul
Tel: (0 212) 501 91 40
Sertifika No: 26954

ISBN: 978-605-64041-4-6

Azad Yayınevi Sertifika No: 27924

Navnişan

AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah. 34330 Sk.
No: 15 A/4
Mezitli/Mersin

Web: www.wesanxaneyaazad.com

Email: info@wesanxaneyaazad.com

© Mafê wê parastî ye. Ji bili danasînê bêyi destûra weşanxaneyê û nivîskar bi tu awayî
nayê kopikirin û nayê belavkirin.

BAJARÊ CIZÎRA BOTAN
Û
HUNERA MÎR BEDIRXAN

KONÊ RES

DÎROK

Konê Reş: Nivîskar û helbestvanekî Kurd e. Navê wî Selmanê Osmanê Evdo ye.

Sala 1953'an li gundê Doda, nêzikî Qamişlo çêbûye. Dibistana destpêkê li gund ya orte li Qamişlo û ya lise li Hesekê xwendiyê. Di sala 1977'an de, bi dû xwendinê çûye Elmanya, lê zû ziviriye welat.

Di malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbir de mezin bûye. Ji mêj ve hez ziman, folklor û toreya gelê xwe kiriye. Xwedî û berpirsyarê kovara 'Gurzek Gul' bû di navbera salên 1989-1992'yan de. Her wiha xwediye stûneke rojnemevanî bû bi navê (Hindik Rindik) di heftnameya 'Peyman' de, li Duhokê û bi dehan gotar lêkolîn pexşan û helbestên wî di kovar û rojnameyên Kurdistanî de hatine weşandin. Gelek pirtükên wî hatine çapkirin û bi serketin di her çar parçeyên Kurdistanê de hatiye naskirin. Konê Reş, li Qamişlo dijî û bi dehsalan e bi zimanê Kurdi dinivîse. Hê jî kar û barêن xwe yê nivîsandinê berdewam dike. Ew hebûna gelê Kurd di hebûna zimanê Kurdi de dibîne û her dem dibêje: Zimanê me dîroka me ye...

Berhemên wî:

*Serpêhatiyêن Mîran(1) Beyrûd-1991

*Mîr Celadet Bedirxan: Bi Erebî, Şam-1992, bi Kurdî, Stokholm-1997

*Sîpan û Jîn (helbestên zarakan: 1), Beyrûd-1993

*Serhildana Sasonê: 1925 -1936, Şam-1995

*Şagirtê Bedir-Xan im (helbestên zarakan: 2) Beyrûd-1996

*Osman Sebrî: 1905-1993, Şam-1997

*Welato! Helbest/Beyrûd-1998

*Komela Xoybûn û Bûyerêن Rojane yên Şoreşa Araratê, Erbil-2000

*Dergehê Jin û Evînê, Helbest/Beyrûd-2001

*Pirtûka Qamişlo, Lêkolîn bi Erebî/Stenbol 2003 û Heleb-2004

*Cûdî Çiyayê Miradan, Helbest/Wergerandina Hejar İbrahîm /Şam-2004

NAVEROK

PÊŞEK.....	11
PÊŞGOTIN	13
BAJARÊ CIZÎRA BOTAN BÜKA MEZOPOTAMYAYÊ	
YE.....	19
GEŞTEK DI NAV SEYRANGEH Ü ŞÜNEWARÊN	
DÎROKÎ YÊ CIZÎRA BOTAN.....	23
Medreseya Sor:	29
Gora Nebî Nûh:	31
Medreseya Mîr Evdal:.....	32
Gora Mem û Zîn:	33
Goristana Cizîrê:	34
Mizgefta Mezin (Bi Tirkî, Ulu Camii):.....	34
Westanî:.....	35
Birca Belek:	36

Çemê Zeytûnê:.....	42
Qesrika Gelî:	42
Mizgefta Mishefa Reş:.....	50
Mizgefta Mîrekan:.....	53
Seqlanê Mema:.....	56
Kaniya Qesara:.....	57
Nêrgizî:	57
Şikeftên Kora:.....	58
Seqnefîs:.....	58
KOMELE, DIBISTAN, KOVAR Û ROJNAMEYÊN KU ZAROK Û NEVIYÊN MÎR BEDIRXAN XWE DI BER DE WESTANDINE.....	65
A. KOMELE:.....	65
1 - Kurd Teawin û Tereqî Cemiyetî:	65
2 - Komeleya "Kurd Teşkilat Îçtîmaiye Cemiyeti":.....	65
3 - Komeleya "Kurd Neşri Mearif Cemiyeti":.....	65
4 - Komeleya "Gihandin":.....	65
5 - Komeleya "Kurdistan Îstiqlal Komîtesî":.....	66
6 - Komeleya "Xoybûn":.....	66
7 - Komeleya "Dostaniya Kurd û Ermeniyan":	67
8 - Civata Alîkarî Ji Bona Belengazên Kurdan li Cizîrê: ...	67
B. DIBISTAN:	67
1 - Dibistana Stenbolê:.....	67
2 - Dibistana Xoyê:.....	67
3 - Dibistana Teblîsê:.....	67
4 - Dibistana Beyrûdê:.....	68
5 - Dibistana Şamê:	68

6 - Beşê Kurdî di Instîtuya Rojhilatnasan li bajarê Saint Petersburgê:.....	68
7 - Instîtuya Kurdî li Parîs:	69
8 - Komeleya Xeyrî ya Kurdî li Beyrûdê:.....	69
9 - Instîtuya Washington a Kurdî:	69
10 - Civata Selahedîn Eyûbî li Emmanê (Urdin):.....	69
C. KOVAR Û ROJNAME:	70
1 - Kurdistan (1898):.....	70
2 - Omîd (1900):.....	70
3 - Kurdistan (1908):.....	71
4 - Kurdistan (1912):.....	71
5 - Yekbûn (1913):.....	71
6 - Jîn (1916):.....	71
7 - Hawar (1932):	72
8 - Ronahî (1942):	73
9 - Roja Nû (1943):.....	74
10 - Stêr (1943):.....	75
BEDIRXANÎ XWEDIYÊN BANGA NETEWEYÎ YA	
KURDÎ NE.....	77
MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN (1893–1951).....	93
Awayê xebatê:.....	101
Awayê nivîsandinê:	102
Ji berhem û afirandinên Mîr Celadet Bedirxan:.....	108
MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN DI NAVBERA POLÎTÎK	
Û ROJNAMEVANIYÊ DE	111
1 - Eniya polîtîkî:.....	111
2 - Eniya rojnamevaniyê:.....	116

DEWLETEK Ú ZIMANEK

Mîr Celadet Bedirxan Zilamek Bû Bi Karê Dewletekê	
Radibû	123
Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdî	129
<i>Le bo Pîrûtê xoşewîst</i>	129
<i>Di Her Tiştî De Yekîtî</i>	129
<i>Xwediye Hawarê</i>	131
Zilamek û Zimanek	
Herekol Azîzan: (Mîr Celadet Bedirxan).....	133
JI ŞÎRETÊN MÎR CELADET BEDIRXAN	
(Xwebinas)	139
HÎNBÛNA ZAROKAN Ú VEKIRINA DERSXANEYAN	
DI NÊRÎNA MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN DE	143
ELFABEYA MÎR CELADET Ú PÎVANA PÊWISTIYA	
TÎPAN	151
BEDIRXANIYAN BI ŞÊWIR KOVAR Ú ROJNAMEYÊN	
XWE DIWEŞANDIN	155
1898 – 1943, Roja Me A Nû.....	156
MÎR XELÎL RAMÎ BEDIRXAN (1862 – 1932)	158
MÎR DR. KAMÎRAN BEDIRXAN (1895 – 1978).....	163
Berhemên Wî:.....	167
Berhemên Çapnebuyî:	169
<i>Dildiziya Gulekê</i>	169
REWŞEN XANIM BEDIRXAN (1909–1992)	171
Ji Kar û Xebatêن Rewşen Bedirxan di warê rewşenbîrî de:	
.....	175
Rewşen Xanim Bedirxan kî ye?	178

Min wiha Rewşen Xanim Bedirxan Nas kir,	
Digot: "Malê Kurdan malê min e..."	184
Wiha, Min Xatir Ji Rewşen Xanim Bedirxan Xwest	188
DR. CEMŞİD CELADET BEDIRXAN (1939-1999)	193
Dr. Cemşid Bedirxan kî ye?	193
SELAH SADELLAH ZAVAYÊ MÎR Û SALEK DI SER KOÇKIRINA WÎ RE	199
ÇIROKA GORA MÎRÊ CIZÎRA BOTAN (MÎR BEDIRXAN) LI ŞAMÊ.....	203
ALA KURDAN DI NAVBERA BEDIRXANÎ Û BARZANIYAN DE.....	211
ÇIROKA VEKIRINA PIRTÛKXANEYA BEDIRXANIYAN LI DUHOKÊ.....	217

PÊŞEK

Carna min nivîsê Konê Reş di ser û internetê re di malpera de dixwend. Nivîsê wî pir zelal û bi fikirandina Kurdî hatibûn nivîsandin. Ev ji min re pir muhîm bû, ji ber ku gelek ji me Kurdê li aliyê Tirkî dijî û bi Kurdî dinivîse em dinerin em bi Tirkî fikirîne û me di serê xwe de vergerandiye Kurdî. Loma pir xelitî û kîmaniyê nivîsê me hene û ta’ma Kurdîya me kêm e. Îca dema ez nivîsê yê wek Konê Reş dixwînim, dilê min rehet dibe û hêviyê min ji bo Kurdî zêdetir dibe.

Mijara kitêbê jî Cizîra Botan û Malbata Bedirxaniyan e ku Konê Reş ji zû ve bi vê mijarê mijûl e û danhevek bedew ketiye ser hev. Di van salê dawî de xebatê pir hêja di derbarê Mîrekiya Botan û mîrê wan de hatin kirin,

belgefîlm hatin amadekirin, kitêb hatin nivîsandin; lê hîn jî gelek mijar hene ku hewce ye mirov li ser bisekine. Ji aliye din ve ev xebatê ku têr kirin gerek li nav xelkê bêr belakirin û cihê xwe bibîne. Ev kitêb jî dilopek ji van xebata ye. Konê Reş zanînê xwe bi hestê xwe jî rapêçaye, loma ev ne lêkolînek rijî ye. Vegotina Konê Reş ji dil diherike û piraniya gel himbêz dike. Loma ez bi hêvî me ku ev xebat wê bi baldarî bê xwendin û wê jê sôd bê wergirtin.

Heke em bêr ser karê teknîkî, dema dosya vê kitêbê ya Konê Reş ji me re hat, nivîs bi pirayî ji qunciknivîsan pêk dihat û di formata nivîsê rojane de bûn. Gelek ji wan berê di malpera de hatibûn weşandin. Loma di dosyê de gelek tişt hatibûn dubarekîrin. Li ser xwesteka nivîskar me dosya di ber çava re derbas kir û ev şiklê dawî stend.

Wek ku tê zanîn dîroka Kurdistan ji insanetiyyê re tije nirxê giranbuha ne, lê pirî caran ji aliye neyaran ve bi çewtitî derbasî rûpela bûye. Ez hêvî dikim di derheqê mîrekiyên Kurda tevdan de xebatê zanistî bi zêdebûn bêne kirin û dîroka gelê me ya pir hêja derkeve holê.

Gerînendeya Weşanxaneyî Azad

Eslîxan Yıldırım

PÊŞGOTIN

Ez ne bawer im ku tu malbatan wek malbata Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxanê Azîzî (1802–1868) ji dil û can kar, xebat û bizav di ber gelê Kurd de kiribin û tev malê xwe û canê xwe di ber de winda kiribin. Mîr Bedirxanê ku di sala 1842'yan de, di herêma Botan de mîrnişiyek ava kir, pere bi navê xwe deranîn û di bin navê ‘Peymana Pîroz’ de Kurd li dor xwe civandin. Ji aliyekî ve jî belav kir û got: “*Dîn dînê Xwedê ye, em tev birayên hev in.*” Û wiha biyaniyan di pesnê wî de gotin: “*Bedirxan edalet e û edalet Bedirxan e.*”

Tevî ku neferên vê malbatê ji sala 1847'an ve di koçberî û sîrgûniyê de dijiyan, wan qet welatê xwe Botan, warê bav û kalên xwe ji bîr nekir, ji desthilanîn neketin, li ber xwe

dan û gelek xebat û bizav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin. Neferên vê malbatê di sirgûniyê de, di bin şert û mercên çetîn û dijwar de, xwe berpirsyarê gelê xwe didîtin û kêşeya gelê Kurd barê xwe yê yekemîn dinasîn. Bi gotin û kirinê dixebeitîn; ci di warê civakî û rewşenbîriyê de û ci di warê siyasî de û wiha tev di sirgûniyê de, dûrî xaka Cizîra Botan mirin.

Her û her daxwaza wan pêşxistina gelê Kurd û bilindkirina navê Kurdistanê bû. Bedirxaniyan gelek komele û dibistan damezirandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem jî bi saya wan gelek navend û enstîtu ji gelê Kurd re hatin avakirin.

Piştî koçkirina Mîr Bedirxan di sala 1868'an de li Şamê, kurê wî Mîr Miqdad Midhet Bedirxan, li ser rê û şopa bavê xwe kir qîrîn û gazî. Qîrîn û gaziya wî ji ya bavê wî bû. Wî di roja 22'yê Nîsana 1898'an de, yekemîn Rojnameya Kurdî li Qahîreyê bi navê KURDISTAN weşand û di nav rûpelên wê de gazî û qîrînî li Kurdan kir û got:

"Geli Mîr û Axano! Kurmancno! Qenc bizarin xwendin, ilm û merîfet li dinyayê û axretê rûyê mirov sipî dike, mirov mihtac nabe. Riya Xwedê de paş niho zaroyên xwe bie'limînin ilm û merîfeta, hûn bi xulaqetê xwe şûca' û cesûr in, heke hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinyayê hemîyan xurtir û dewlemendtir bin."

¹ Mir Miqdad Midhet Bedirxan, Kurdistan, hejmar 4/1898 Qahîre

Neviyê Mîr Bedirxan Mîr Celadet Ali Bedirxan (1893–1951) ji, hêviyên bav û bapîrê xwe li erdê nehiştin, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî heta roja dawî yê temenê xwe. Wî ji di roja 15.5.1932'yan de hejmara pêşîn ji kovara xwe HAWAR a bi tîpêن Latînî, li Şamê çap kir û di nav Kurd û biyaniyan de belav kir. Wî ji bi Hawara xwe, qîrîn û gaziya bav û bapîrê xwe gihand Kurdan û got:

“Herçî em Kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxifin, piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletékî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî.

Heçî bi vê wezîfê ranebûne, wezîfa xwe ya milî pêk neanîne û bi kêrî miletê xwe nehatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletékî bihesibîne, divêt ko bi kêrî wî bê.”²

Di nivîseke xwe ya din de jî dibêje:

“Malixerabino! Ma we ew çend wext nîne, ko hûn ji bo hînbûna zimanê biyaniyan bi salane ve xebitîne, îro ji dixebitin, ji bona ko bikarin - fîfoneke - derewîn bi lêv bikin. Kuro! Eybe, şerme, fihête, an hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin, an mebêjin em Kurd in, bê ziman Kurdîtî ji we ra ne rûmete, ji me ra rûreşiyek girane. Heyf û xebînet û hezar mixabin,

² Mîr Celadet Ali Bedirxan, Kovara Hawar, hejmar: 40/1942

*nemaze ji wan ra ko bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û alfabêya zimanê xwe hêç nas nakin.*³

De werin em bi hev re vê pirtûka bi navê “Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan”, bixwînin û pêlekê di nav xebat, kar û bar, komele, dibistan, kovar û rojnameyên ku zarok û neviyên Mîr Bedirxan, xwe di ber wan de westandine, mijûl bibin... Mijarêن vê pirtûkê têvel in û di demêن têvel de hatine nivîsandin û tev li ser yek zîlanê dizivirin; Bedirxaniyetî anku Kurdayetî... Eger hin gotinêن Mîr dubare bûbin, ez wê dubarebûnê jî bi sûde dibînim.

Konê Reş

Qamişlo, 11/09/2012

³ *Mîr Celadet Bedirxan, kovara Hawar, hejmar 27, Şam/1941*

BAJARÊ CIZÎRA BOTAN
Û
HUNERA MÎR BEDIRXAN

BAJARÊ CIZÎRA BOTAN BÛKA

MEZOPOTAMYAYÊ YE

Bajarê Cizîrê yet ji kevntirîn bajarê dinyayê ye. Mirovahiyê mohra xwe li gelek perestgeh, mizgeft, keleh, qesir, pir, sûr, birc û gelek avahiyên wê yên cur bi cur xistiye. Gelek şaristanî têre derbas bûne û her şaristaniyekê bermayê xwe, şop û şûna xwe lê hiştine.

Ji heyamê kevn ve û heta roja îro taybetiyek xurt bajarê Cizîra Botan û Kurdan bi hev ve girê dide û Cizîra Botan bûye kaniya rewşenbîriya Kurdî ya ku namiçiqe. Di vî bajarî de bingeha rewşenbîriya Kurdî hatiye danîn û gelek şûnewarêñ dîrokî lê hene; wek: Gora Nûh Pêxember, Medreseya Sor, Gora Mem û Zîn, Bircâ Belek, Mizgefta Mezin û Mizgefta Mishefa Reş. Bajarê Cizîra Botan ji Kurdan re bajarekî pîroz e, ew jî mîna bajarê Qudsê (Orşelîm) ye. Ji ber ku hê jî ew bajarê Kurdî yê orjînal e; Kurdîtiya xwe parastiye, zimanê Kurdî di kolan û çarşiyêñ wê de tê axaftin û yê bazarê ye.

Jixwe wek ku tê zanîn, piştî tofana Nûh Pêxember mirov li herêma Botan ango Mezra Botan; bajarê Şîrnex û Cizîrê bi cih bûne. Di pişt re li cîhanê belav bûne. Dibêjin

dema keştiya Nûh Pêxember li ser Çiyayê Cûdî sekiniye, nav li Çiyayê Cûdî hatiye kirin û gotine (Cî dî), ango keştiya wî cihek ji xwe re dît.

Di Qur'anâ pîroz de jî hatiye; ‘*We estewet e'ell Cûdî*’ ango keştiya Nûh Pêxember li ser Çiyayê Cûdî sekiniye. Jixwe Kurd dibêjin; di heyamê tofanê de, dema keştiya Nûh di ser Çiyayê Şengalê re derbas bûye, li çiya ketiye û kunek tê de vebûye. Mar xwe kiriye gulofitek û ew kun girtiye, da ku av nekeve keştiya wî. Û dibêjin ku kevokê bi nikilkê xwe şaxek ji dara zeytûnan wek mizgînî ku nêzikî bejâyê dibin, ji Çiyayê Cûdî ji Nûh Pêxember re biriye û ji wê hingê ve kevok û şaxikê zeytûnê bûne sembola aştiyê. Hem jî dibêjin ku navê Nûh Pêxember ji gotina ‘Nû’ a Kurdî hatiye, bi wateya nûbûnê. Ji ber ku Dinya wê hingê ji nû ve hatiye avakirin. Dema ku Nûh û her heştê hevalên xwe, li ser Çiyayê Cûdî ji keştiya xwe daketine, wan di quntara Çiyayê Cûdî de gundek bi navê Heştêyan ava kiriye. Ew gund heta roja iro jî di pala Çiyayê Cûdî de ye. Xuya ye ku di pey gundê Heştêyan re, bajarê Şîrnexê hatiye avakirin û jê re gotine Şarê Nûh ango bajarê Nûh an Şarê Nû. Bi dirêjiya demê û pirbûna mirovan re xelk ji herêma Botan derketine û li dinyayê belav bûne û wiha Kurdmanc li cihê xwe, herêma Botan mane û ji wan re hatiye gotin *Kurdmanc*, ango (Kurd man li cî).

Di baweriya min de, bajarê Cizîra Botan ji Kurdan re mîna bajarê Mekke ye ji Ereban re. Zimanê wê jî ji Kurdan re mîna zimanê Qureyşîyan e ji Ereban re. Ji kevn de û heta roja iro, zimanê Kurdî tekane zimanê axaftina xelkên wê

ye. Zimanê danûstandin û bazirganiya wê ye. Di roja îro de bajarê herî dawîn e di nav kurmancîaxêvan de, ku bi tenê zimanê wê Kurdî ye û zimanê Kurdî parastiye û diparêze. Piştî ku serhildana Mîr Bedirxan di sala 1847'an de beravêtî bûye, Mîr û malbata xwe di sirgûnê de dûrî welatê Botan jiyana xwe derbas kirine û bi taybetî piştî damezirandina Komara Tirkîyeyê di sala 1923'yan de, şerê ziman, dîrok û hebûna Kurdan bi tundî hatiye kirin. Ango ji 170 salî zêdetir e xelkên Cizîrê li ber xwe didin.

Ev nêzikî 100 salî ye, dagirkeran bi sedema ku zimanê Kurdî nemîne, bi rêk û pêk şerê zimanê Kurdî kirine. Zimanê Kurdî wek sembola paşverûtiyê û nezaniyê destnîşan kirine û dikin. Dagirkeran ne tenê planên bişaftina çand û ziman li ser Kurdan meşandine, lê belê wan xwestiye ku Kurdan di her warî de paşketî bihêlin û asîmîle bikin. Lê Botanî, di roja îro de şerm dikin ku bi hev re bi Tirkî biaxifin. Xuya ye ku Mîrên Botan jî, digel serhildan, nakokiyêن xwebixweyî û têkçûnan, hişmendiyekê Kurdewarî di herêma Botan de çandine. Her wiha di bin desthilatiya wan de çandek Kurdewarî hatiye afirandin û zimanê Kurdî wek zimanekî şaristaniya pêşketî di nav çerx û dewranê salan de hatiye bikaranîn û cihê xwe girtiye. Wêjeyek bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin û wiha gelek zanyar û rewşenbîr ji nav civaka Botan derketine. Nav û dengê gelekan ji wan di cihanê de belav bûye. Armanca dagirkeran ne tenê pişaftina çand û zimanê Kurdî bû, belê wan xwestiye ku hişmendiya dîrokî jî, ya gelê Botan, ji holê rakin. Li gor ku min dît û nas kir, dîroka

Mîrnîşîna Mîrekêñ Botan a ku di herêmeke berfireh de, bi navê Mezopotamya ku dor hezar salî dom kiriye, qet destûr nedaye û nade dagirkeran ku planêñ xwe bi rehetî derbas bikin, her dem û gav Botanî bûne kelem û asteng li pêşıya projeyên wan. Ü tevî ku van demêñ dawî 84 mizgeft li bajarê Cizîra Botan hene û Dewleta Tirkeyeyê mehiya 84 melayan dide, lê min ew bandora olperestiya Îslamê a zêde lê nedît.

Erê! Cizîra Mîr Şeref; roka jiyanê ye... Landika şaristaniya mirovahiyê ye... Navendek ji navendêñ olêñ cîhanê ye... Deftera afirandina ramyariyê ye... Kaniya reseniya Kurdewariyê ye... Keleha berxwedana azadî û zimanê Kurdî ye... Heca Kurdan e û bûka Mezra Botan e an (Mezopotamya ye).

GEŞTEK DI NAV SEYRANGEH Û ŞÜNEWARÊN DÎROKÎ YÊ CIZÎRA BOTAN⁴

Nizanim ji kengî ve ye ku min navê Cizîra Botan, Mîrê Botan û Birca Belek bihîstiye. Ji biçûkaniyê ve, ev nav di mala me de dihatin gotin. Nexusim dema ku me li çirokên mîrekên Botan guhdarî dikir. Erê, di wî biçûkaniyê de, bi rêzgirtinek mezin me li çirokên mîrê Botan guhdarî dikir. Me kes ji wan mezintir nedidît û wiha mîrekên Botan û koçka wan Birca Belek di çavê me de mezin ma û bi me re mezin bû. Hesreta naskirina neferekî ji malbata Mîrê Botan û dîtina Birca Belek ji me re xewn û xeyal bûn. Heta vê paşiyê, di sala 1989'an de çavên min bi dîtina Rewşen Xanim Bedirxan kil bûn û ancax ez di 2008'an de çûm

⁴ Ev nivîsa xwe dema di 2008'an de ji bo 2'yemîn Rojên Huner û Çandê ya di navbera 22-24'ê Tebaxê de li Cizîra Botan bi slogan "Rûmeta Ziman, Zimanê Rûmetê" hatibû lidarxistin ez çûbûm Cizîra Botan û pê de min nivisibû.

Cizîra Botan. Ji mêt ve, min diviyabû şarê Cizîra Botan bibînim, ne tenê dîtin, lê belê lê jî bimînim, lê razêm û li çarşiyên wê bigerim, bi xelkên wê re biaxifim. Ji xwe serdana gora Mem û Zîn, Melayê Cizîrî, Medreseyâ Sor, Birca Belek, gora Nebî Nûh, xewnek ji xewnêñ min bûn. Ev navêñ ku ji mêt ve min bihîstibûn lê min ew nedîtibûn, xewn bû ji min re ku wan ji nêzik ve bibînim.

Di 10'ê Tebaxâ 2008'an de, zengilê telefona min lêda; xortekî xwe bi min da nasîn û got: Ez Metîn im, tu Konê Reş î? Min got: Belê. Got, ez ji şaredariya Cizîrê xeber didim. Mamoste! ji 22'yê Tebaxê ta 24 ê wê, li Cizîrê bi dirûşma "Rûmeta Ziman Zimanê Rûmetê" Rojêñ Çand û Hunerê têne lidarxistin, gelo tu dikarî beşdariyê bi me re bikî..? Min lê vegerand û got: Ser çavan, çawa ez nikarim, ez çıkışkandî me ji hatin û beşdariyê re... Min jê pirsî; Gelo mijarê ku ez pê beşdar bibim, pêwist e li dor ci zilanê bigere? Wî got: Ya te û kek Firat Cewerî bi navê Qîrîna Mîr Bedirxan: Hawar e. Hem jî got wê Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan jî, ji Parîsê bê û beşdar bibe. Bi vê gotina wî a dawî re kêfa min dubare bû. Dawî me xatir ji hev xwest û telefon girt û min mizgîniya çûna Cizîra Botan guhest zarokêñ xwe.

Vê paşiyê min seh kir ku wê mamoste Deham Abdulfettah jî beşdar bibe. Vêca me pêwendî digel hev ava kirin û di roja 20'ê Tebaxê de me berê xwe da dergehê Nisêbînê û em derbasî Serxetê bûm. Li dergehê sînor, ji rexê Serxetê ve, çend kes ji mirovêñ min li hêviya me bûn. Diyariyêñ ku min ji wan re biribûn, min dane dest wan û

di eynî katê de xatir ji wan xwest, bi hêviya ku li vegevê, ji nû em hev bibînin û li wan bibin mîvan.

Li Nisêbînê, em çûn buroya Mustefa Yildirim neviyê Ehmedê Silêman, axayê Omeriyan. Camêr, wî û birayê xwe, yê dermanfiroş Omer Yildirim, li gor urf û adetên Kurdan, pêşwaziya me kirin. Me digel wan firavînek kurmancî xwar, cihê meyirê jî di nav wê firavînê de hebû. Di nav re em ketin giftûgoyeke dîrokî, bi taybetî dîroka mala Osman, axayê Omeriyan û pewendiyêن wan bi mîrekên Botan re. Yek ji kalikên wan Sadûn Axa, di serhildana 1847'an de hevalbendê Mîr Bedirxan bû. Dema serhildan têk diçe û Mîr Bedirxan sirgûn dibe, Sadûn Axa jî sirgûnî Rusçûk ya Bulgarîstanê dibe û li dor 13 salan li wir dimîne.

Piştî ku me firavîn xwar, kak Omer bal kişand ser xortekî zîrek bi navê Ardal an Mam Elî, mamoste yê li Nisêbînê û ji nezik ve ew nas kiriye. Telefon jê re kir, Ardal hat, em ketin giftûgoyeke dîrokî a herî kevnar. Mamoste Ardal gelekî bi zimanê Avestayê mijûl dibe û xwe di vî warî de westandiye. Ji me re digot ji Îsa bi wir de ji min bipirsin..! Jê û bi vir de ez nêzik nabim, ji we re..! Derfetek xweş bû ku min her sê mirov li Nisêbînê nas kirin, digel ku min bavê romannivîsê Kurd Silêman Demir jî di eynî buroyê de dît û hin kesên din ji Omeriyan. Di wê navê re me destûr ji mazûbanan xwest, ku rê bidin me, em kêlikêkê, bi tena xwe li bajarê Nisêbînê bigerin heta ku otomobîla şaredariya Cizîrê bi me ve bê.

Ez û mameste Deham derketin, di ber parka bajêr re derbas bûn, me berê xwe da ziyareta Mazilevdînê nava Nisêbinê, wek ku Kurd bi nav dikin û tê bîra min ku di zaroktiya me de, dê û bavêne me pê sond dixwarin. Li ser dergehê ziyaretê bi Erebî wiha hatiye nivîsandin; ‘Ev gora Zeynelabdîn û xwîşka wî sitî Zeyneb e, di sala 553 hicrî de mirine.’

Ji wir, me berê xwe da Dêra Mar Yaqûbê Nisêbinî, ew jî li kêleka ziyaretê ye, xuya bû ku arkeolog tê de dixebeitîn. Ji wîr me berê xwe da parkê. Li parkê, ez çav bi dostekî bavê xwe ketim, jê re dibêjin Hecî Zahir, ciwanmêr bi zor em rûnandin, avek cemidî û çayek ji me re xwest. Hem jî mala xwe şanî min da. Wiha otomobîla şaredariya Cizîrê bi me ve hat. Xwe bi me dane naskirin; Mîrza Ronî ji şaredariya Cizîrê, digel xortekî bi navê Ûnis û lêborîna xwe xwestin ku hinekî bi derengî ketin. Me jî xatir ji Mustefa û Omer Yildirim xwest û me berê xwe da Cizîra Botan, landika şaristaniyê di Mezopotamyayê de. Bi rê de, çendî min dixwest ku em li Alaqemşê bisekinin, weneşekî ji vî gundî bikişînim, ev gundê ku di sala 1927'an de, 234 kes bi saxî lê hatin şewitandin, bi tenê pîrejinek di bin terman de mabû, ji mirinê filitî. Hingê Cegerxwîn ev helbesta xwe a pêşîn bi navê Pîra Torê bi wê behaneyê honandiye:

*Hilkişîme çûme jorê, her du rex min bend û rez
Min dî pîrek tê ji Torê, ker di berde tê bi lez
Hate nêzik rojbixêrek da û wek min dil bi xem
Pîrebî bû, por spî bû, taqî reş bû, rû gewez
Min ji pîrê xweş dipirsî; Ey metê tu ji kuve tê ?*

*Go ji Sêrtê diçme Bêrtê, xwîniya Romê me ez
 Xan û eywan kirne wêran, mér û jin ser jê kîrin
 Min go pîrê qey tu Kurdî ? Çûye tîlyên xwe bi gez
 Gotî dayê; em dixwînin wek Cegerxwîn gotiye:
 Zû bixwînin, hev bibînin, biçne Kurdistan bi lez.*

Dor kat 8'ë evarî em gihan Cizîrê. Dêrekt em birin hotelê a ku li navenda bajêr, li kêleka çarrê ye. Li wîr, şaredarê Cizîrê Aydin Budak û wekîlê wî Ahmed Dalmış pêşwaziya me kîrin. Bi dîtina wan, min pirsa hatina Emîre Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan kir û got: Gelo wê kengî bigihîje Cizîrê? We ci hazirî ji pêşwaziya wê re kiriye? Ev yekemîn car e ku neferek ji malbata Mîrekêñ Botan bi rengekî fermî tê warê bav û kalêñ xwe bajarê Cizîrê. Piştî dor 160 salî ji sirgûn, zîvarî û derbideriyê..? Û min berdewam kir û got, pêwîst e bi dahol û zirnê pêşwaziya wê bibe. Ciwanmêran bi tenê li min guhdarî dikirin. Dawî wan bi ser xist, wek ku min diviyabû, zêdetir kîrin. Ji min re gotin, sibe êvarê wê bigihîje Cizîrê, îro ew ji Parîsê gîhiştiye Stenbolê û sibe wê bigihîje Amedê û Cizîrê. Ji ber ku wê derengî şevê bigihîje Cizîrê, em ê sibeha 22'ye Tebaxê, li ber şaredariyê pêşwaziyeke layiqî wê bikin.

Wê şevê piştî bêhnvedanekê, em birin Navenda Çand û Hunerê ya Mem û Zînê, ev navenda ku di sala 2004'an de hatiye avakirin. Çalakiyek navendê hebû, ji stranêñ jin û mîran pêk dihat, me jî bi şadî li wan guhdarî kir heta bi dawî bû.



Birca Belek (Gertrude Bell-1909)⁵

A dinî rojê, ango 21'ê Tebaxa 2008'an, me dest bi gera bajarê Cizîrê kir. Bajarê Cizîrê ji kevntirîn bajarên Mezopotamyayê ye. Tevî ku şetê Dîcle xwe li vî bajarî dipêçe, ev bajar bi sûr û beden bû, hê jî kavilên bedena wê di gelek cihan de maye. Ji sê rexan ve dergeh di sûrê de hebûn, ew dergeh jî bi nav bûn, wek: Dergehê Çiyê, dergehê Torê û dergehê Deştê. Hem jî ev bajar, ji mej ve û heta roja iro bi çend taxan bi nav e, wek: Taxa Kelehê, Taxa Mîr Elî, Taxa Torê. Lê vê paşiyê hin taxên din hatine avakirin, wek: Taxa Sûrê, Taxa Cûdî, Taxa Şaxê û Taxa Nûrê.

Rêberên me kak Mîrza Ronî, Ûnis û xortekî din bi navê Ridwan bi wan re bû. Ev xortê dawî, xwe bi me da naskirin û got; ez ji neviyên Elo Dîno me. Bi vê gotinê re, xeyalan ez bi paş ve vegerandim, li heyamê mîrnîşıya

⁵ www.panoramio.com

Botan zivirandim. Ew heyamê ku ji keleha Bafê re digotin; keleha Elo Dîno. Di wî heyamî de Elo Dîno li ber mîrê Botan asê bûbû û wek hikumdariyekê di keleha Bafê de ava kiribû, bêş û bac nedida mîrekên Botan. Lê li vê yekê jî nesekinîbû, belê wî rîka çûn û hatina kelekvanîyan di şetê Cizîrê de, bi zincîrekê girtibû; yê bac nedaba Elo Dîno, nikaribû keleka xwe di şet re derbas bike û xwe bigihîne bajarê Cizîrê. Belê çiroka Elo Dîno dirêje. Ridwan got ez ji neviyêن Elo Dîno me, ew jî wê sibehê bi me re li Cizîrê geriya û digel me hat Çemê Zeytûnê û Qesrika Gelî.


Medreseyâ Sor:

Belê di destpêka gerê de, me berê xwe da Medreseyâ Sor, ev medreseyâ ku mîrekên Botan, Mîr Şeref kurê Mîr Evdal ji malbata Azîzan, di destpêka salên 1500'ê zayînê de ava kiriye. Mîr Şeref û Melayê Cizîrî, hevçerxên hev bûn û Melê Cizîrî di vê medreseyê de mamosteyî kiriye, hem jî pesnê Mîr Şeref daye dema di dîwana xwe de dibêje:

*'Ne tenê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xurasanê defrewarê te be...'*

Medreseyâ Sor di heyamê xwe de zaningehek bi nav û deng bû. Mîr Şeref ji malê xwe ava kiriye. Û heta niha bi navê Medreseyâ Sor navdar e, ji ber ku bi qermîdên sor hatiye avakirin. Di vê Medreseyê de hemû ilmên hemdemî dihatin dersdan û xelkên Botan bi wî ilmî dihatin perwerdekirin. Ne tenê ilmên olî di vê medreseyê de dihat dersdan, belê şagirtên vê medreseyê di warê Fiqih, Hedis, Tefsîr, Tesawif, Rêziman, Mentîq, Exlaq, Tib, Dîrok,

Matematîk, Hendese, Endezyarî, Mîmarî, Leşkerî, Felsefe û tev şaxên zanistiyê hemdemî de, bi dilê xwe dixwendin. Li gor ku min she kiriye; di vê medreseyê de pirtûk ji zimanê Erebî, Farisî û Osmanî dihatin wergerandin bo zimanê Kurdî û tev şagirtan bi zimanê Kurmancî dersên xwe digirtin. Rola zaravayê Zazakî û Soranî gelekî kêm bû Zaravayê Kurmancî yê sereke bû.



Medreseya Sor⁶

Mesrefa xwendinê ji xezîna Dîwana Mîrê Botan, Mîr Şeref dihat dan. Di baweriya min de, Medreseya Sor di heyamê xwe de, ne kêmî zanîngeha Elezherê bû, ya ku îro li welatê Misrê, bajarê Qahîrê ye. (Hejaye gotinê ye ku di orta çerxê derbasbûyî de Bediuzzeman Seîdê Nûrsî jî diviyabû

⁶ www.cizredh.gov.tr

zanîngehekê mîna Medreseya Sor li Wanê ava bike.) Ez li tev ode, xilwet û hicrikên ve medreseya dîrokî geriyam, bi Melayê Cizîrî re kûr û dûr çûm:

*Ger lûliwê mensûr ji nizmê tu dixwazî
Wer şîirê Melê bîn! Te bi Şîrazî ci hacet...
Hem jî dibêje:
Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im*

Wiha rêberê me berê me da ser gora Melayê Cizîrî (1570–1640), ya ku parçeyeke ji Medreseya Sor û dikeve kêleka wê de û jê nizimtire ango di odayeke binerd de ye. Di medreseyê re em derbasî quba gora Cizîrî bûn û di derveyî medreseyê re, em derbasî xanîkê ku gora Melayê Cizîrê tê de ye, bûn. Me dît ku şes gorên din li dor gora wî hene. Hina ji me re got, ev gorên mîrekên Botan e û hina jî gotin, ev gorên şagirtên Melayê Cizîrî ne.

Gora Nebî Nûh:

Ji wir me berê xwe da gora Nûh Pêxember û mizgefta wî; gor gelekî dirêj bû, min bi gavan pîva dor 6 metreyan dirêj bû.




Gora Nebî Nûh⁷

⁷ fotografdefteri.com

Nûh Pêxember, ev ê ku ji ber tofanê, bi keştiyeke mezin reviya. Kevoka aştiyê bi nikilkê xwe şaxek ji darên zeytûnan, ji çiyayê Cûdî jêre bir, wek mizgînî ku gihaye bejayê. Hem jî çiyayê Cûdî pişta xwe ji keleka wî re xûz kiriye, wek ku Kurd dibêjin. Di Qur'ana pîroz de jî hatiye: We estewet ela el-Cûdî. Digel gora Nûh de, mizgeftek nû û bedew bi navê wî hatiye avakirin. Hem jî di rex de aşxaneyek heye, xwarina belaş li feqîr û fiqereyan belav dike.

Di bakurî gora Nûh de bi çend metreyan, gora Îsmail Ebûl-Îz El Cizîri heye, ku di navbera salên 1136 û 1206'an de li Cizîrê jiyaye û bi navê Bedîûzeman hatiye naskirin. Dibêjin, ew di warê mekanîkê de gelekî şareza bû û ew yekemîn kes e ku bîra çêkirina Robotê biriye. Lê mixabin ez tiştekî zêde li dor jiyana wî nizanim.



Xebatek ji yê Îsmail Ebûl-Îz⁸

Medreseya Mîr Evdal:

Di baweriya min de ev medrese kevnîrîn medrese ye di bajarê Cizîrê de, li ser dergehê wê hatiye nivîsandin, ku

⁸ www.cizredh.gov.tr

ev medrese di sala 1437'an de, di heyamê Mîr Evdal ê Azîzî de hatiye çêkirin.

Gora Mem û Zîn:

Gora Mem û Zîn di Medreseyaya Mîr Evdal de ye. Ev medreseyaya ku di orta goristana bajarê Cizîrê de ye, di odayek bin erdê de, ji vê medreseyê, ji rex bareş ve gora Mem û Zîn e û li ber serê wan gora Beko ye. Wek ku hûn tev dizanin Şêx Ehmedê Xanî di sala 1695'an de destana xwe Mem û Zîn li dor wan honandiye. Hin dibêjin û ez jî bi wan re, ku Ehmedê Xanî ev destana xwe ji çîroka Memê Alan biriye, lê belê, kirasekî nû lê kiriye.



*Gora Mem û Zîn*⁹

⁹ www.cizredh.gov.tr

Goristana Cizîrê:

Goristana Cizîrê di hundirê sûrê de ye û cihekî mezin ji bajarê Cizîrê girtiye. Medreseye mîr Evdal û gora Mem û Zîn jî dikevin nava vê goristanê de. Hem jî gora şehîd Orhan Dogan, Mustefa paşa Miran... û bi hezaran gorên şêx û ewliyayan hene. Min di jiyana xwe de, goristan wek goristana Cizîrê mezin û dîrokî nedîtiye. Lê min keskek li ser gorekê ji gorên van şêx û ewliyayan nedît, wek ku li nav goristanêne me binxetiyen belav in.

Mizgefta Mezin (Bi Tirkî, Ulu Camii):

Ev mizgeft bi mîmarî û endazyariya xwe hunereke mezin şanî mirov dide. Jixwe her 12 neqşen ku li ser dergehê wê hatine xemilandin, mirov diheyirîne, yek mîna ya din nîn e. Di temâşekirin û pojinandina wan neqşan de, mirov pêrgî simbola ola Îzîdiyan dibe, (ango mirovê bi simbêl), hem jî stêra Cihûyan a şes niçik, wiha jî xaçê Xiristiyanan. Û her wiha her 12 neqş di rex hev de, di ser deriyê mizgefta mezin re li ber çavan rêz dibin û diyar in. Mizgeft li ser dor 30 stûnên gulover û stûr ji kevirên reş bilind dibe. Em li hundirê mizgeftê geriyan, lê Mihraba wê (Cihê Îmam), wek ku pêdivî hebûya min nedît, ji bilî mihrabeke nû, ku ji text hatiye çekirin. Xuya ye ku ev mihraba textî piştî İslâmê hatiye çekirin. Di baweriya min de, gelek çerx û dewran di ser vê mizgeftê re derbas bûne, gelek olan ev mizgeft bi kar anîne. Dibe ku di destpêkê de perestgeha Îzîdiyan bû, di pey re bûye a Zeredeştiyan û wiha bûye Kenîşt ji Cihûyan re û Dêr ji Xiristiyanan re,

heta ku di sala 639 an de Misilmanan ji xwe re kiriye mizgeft bo nimêjê. Jixwe minare ji avaniya mizgeftê cuda ye, dikeve bi alî bakur ve û ji minareyên mizgeftên dinyayê tevî bi cuda ye; ji xwar ve çarçikî ber bi esman ve dirêj dibe, di ser re gulover an gindorî û di ser wan re tütikî ber bi esman bilind dibe. Di baweriya min de ev mizgeft di destpêkê de wek perestgeh an kenîşt hatiye avakirin di pey re bûye dêr û mizgeft.

Ji Mizgefta Mezin, me berê xwe da çarşıya bajarê Cizîrê a kevn. Pêlekê em li bazarên wê geriyan. Germa wê zêde bû. Bi vexwarina ava cemidî û çayekê re, min çend pirs ji kalemerekî Cizîrî kirin: Çima jinêñ wê kincêñ reş li xwe dikin û xwe dinixumînin? Li min vegerand: Şîna li ser Mem û Zîn e, ji heyamê wan ve jinêñ me cilêñ reş li xwe dikin û yên ku wiha cil li xwe nekin ew ne ji Cizîriyên esîl in. Dawî me ji kak Mîrza xwest ku me bibe Westanî. Wek yekî ku bicefile ji min pirsî, mamoste! Tu ji ku Westanî nas dikî?! Îro roj, Westanî bûye parka bajar û çalakiyên rojên Çand û Hunerê, wê lê bêne lidarxistin. Me berê xwe da Westanî.

Westanî:

Di heyamê berê de, meydanek fireh û mezin bû, li rojhilatî bajarê Cizîrê, ser peravê şetê Dicle. Di vê meydanê de pehlewan kom dibûn û hunera xwe şanî xelkên Cizîrê didan. Cizîriyan hespêñ xwe lê dibezandin û lê cirîd dikirin. Di wextê şer û cengê de leşkerên Botan lê dicivîyan, kom dibûn û karê xwe û şer dikirin. Hem jî wek

seyrangehekê bû ji xelkên Cizîrê re. Roja îro jî eynê seyrangeh bûye parka bajarê Cizîrê û tev çalakiyên rojên Çand û Hunerê, di bin siya darêن wê de, li ser peravê ava Dicle, di bin pala çiyayê Cûdî de û bi beşdarbûna Emîre Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan hatin lidarxistin.

Birca Belek:

Me ji Mîrza û Ünis xwest ku me bibin bi rex Birca Belek ve. Gotin mamoste! Qedexe ye, qijleya leşkerî ye. Em dikarin di ber re derbas bibin. Wiha em li otomobîlê siwar bûn û di rex Birca Belek re derbas bûn. Tevî ku ji dûr ve Birca Belek wêran xuya dikir lê kavilên wê yên reş û spî payebilind û berz xuya dikir.



Birca Belek (2009)¹⁰

Wek ku hûn tev dizanin, Birca Belek ji sala 1847'an de, piştî dîlkirin û sîrgûnkirina Mîr Bedirxanê Azîzî, ketiye destê artêşa Împaratoriya Osmani û ji wê hingê ve, wek bargehek leşkerî, artêşa Tîrkan bi kar tîne û jê

¹⁰ ku.wikipedia.org

desthilatdariya xwe di herêma Botan de berdewam dike. Hê jî qijleyeke leşkerî ye, cendirmê tê de çilvîtkan didin. Qedexe ye ku mirov nêzik bibe.

Di vê navberê de ez dixwazim hebekî behsa dîroka Keleha Cizîrê û Birca Belek bikim ku mirov nikare wan ji hev cuda bike. Dîroka avakirina keleha Cizîrê û Birca Belek di gelek qonaxan re derbas dibe; vedigere heyamê Împaratoriya Gutî, 4000 sal berî zayînê. Ev keleh li bakurê bajarê Cizîra Botan, li ber peravê ava Dîcle bicih dibe.



Keleha Cizîrê¹¹


Wek me got di dema Împaratoriya Gutîyan de hatiye avakirin, bi demê re ketiye destê Hurrî-Mîtanî, Aşûrî, Medî û Babîliyan... Û hin nûjenî tê de hatine kirin. Di serdemê Împaratoriya Sasaniyan de bi serokatiya Erdeşêr Babekyan 241-226, careke din hatiye nûjenkirin an restorekirin. Di heyamê İslâmê de û bi taybetî heyamê Ebasîyan de car dî hin guhertin tê de hatiye kirin û kirasê İslâmê lê hatiye kirin.

¹¹ www.panoramio.com

Birca Belek ji sedê salan ve cihê rûniştina mîrekên Botan bû, cihê şêwir û mişêwira wan bû, cihê ra û tevdîra wan bû. Di heyamê Mîr Seyfeddînê Botî de, wî Medreseyâ Seyfiyê bi navê xwe di hewşa kelehê de ava kiriye. Dibêjin ku roja iro mizgefta wê medreseyê hê jî dimîne, lê medrese bi tevayî bûye kavil.

Ji bo rehetî û fesihandina neferên malbata Mîrên Botan, cihek bi navê Şaneşîn di navbera Medreseyâ Seyfiyê û Birca Belek de hebû. Ava kelehê jî bi borîyan ji Cehfer Sadiq dihat kişandin hundirê kelehê an Bircê. Li bakurê kelehê, di navbera kelehê û ava Dicle de bexçeyek bi navê Rezê Mîra hebû. Heta sala 1700'an jî Rezê Mîra bi cûreyên têvel ji darêن fêkî, gul û çiçekan dihat xemilandin, her wiha gelek tebayên çolê yên kedî û dirinde tê de dihatin xwedîkirin.

Dibêjin zindanek di kelehê de hebû û hê jî dimîne, dîwarên wê pir stûr bûn, avahiya wê gilover bû, pîvana wê 3 metre bi 4 metreyan bû. Hem jî dibêjin ku di heyamê berî İslâmî de ew keleh wek perestgeh dihat bikaranîn. Birca Belek, di geşbûna xwe de, ji 366 odayan pêk dihat. Bilindahiya dîwarên wê, sî metre ye. Li ser dergehê wê wêneyên du şêran hene, yek li çiyayê Cûdî û yek li çiyayê Gabarê mîze dikin û wiha di nav çerx û dewranên salan de, her mîrekî Botan ji malbata Azîzan ev Birca Belek spartiye yê di pey xwe re ku dawiya wan Mîr Bedirxan bû.



*Qesra Mala Bedirxaniya*¹²

Xelkên Botan jî, ji hêla wan Mîrekên Azîzan ve, bi hezkirina ziman û welatê xwe hatine perwerdekirin. Erê, Birca Belek ji Kurdan re di heyama geşbûna xwe de mîna Koçka Spî bû a ku îro li Washingtonê ye ji Emerîkiyan re, hem jî wek Koçka Elîzê ye ji Fransizan re. Lê sed mixabin ku roja îro ji bilî Birca Belek gelek şûnewarêñ dîrokî yên din jî hene û wêran bûne, gelek cihêñ dîrokî hene, ku şop û şûna wan nema xuya dikan. Dagirkieran cihêñ dîrokî li Cizîra Botan wêran kirine, hin jî di bin ava Dicle de mane. Gelek cih jî di bin erdê de nebedî ne, xebat û xepartin ji wan re pêwîst e.

¹² www.panoramio.com

Gelek birtyarê ku di xizmeta mirovahiyê de bûn ji vê kelehê û Birca Belek hatine der wek: avakirina piran, aşan, hilanîna cudahiya ku di navbera Misilman, Xiristiyan û Cihûyan de hebû. Û ev gotina Mîr Bedirxan “Dîn dînê Xwedê ye em tev birayên hev in.” deng vedaye. Hem jî ew Peymana Pîroz a ku Mîr Bedirxan di navbera axa, beg û serokeşîrên Kurdan de danîbû, ji wê Bircê hatiye der. A din ew birtyarê guhdana bi ilim, zanîn û zanyaran ku ji encamên wan birtyaran Medreseyâ Sor hat avakirin, ji wê Bircê derketine. Ev Medreseyâ ku di heyamê xwe de Zanko bû, kêm zanko wek wê di Rojhilata Navîn de hebûn, ew jî mîna zankoya Elezherê a li bajarê Qahîre yê, bû. Û ji encamên avakirina wê zankoyê kesên wek Îsmâîl Ebû Îz Elcezerî, Îzeddîn Îbin Elesîr, Mecddîn Îbin Elesîr, Melayê Cizîrî, Feqayê Teyran... hatine holê ku wan xizmeta mirovahiyê kirine.

Gêra Mîr Mihema dikeve baxerbî Bircê de. Di heyamê berê de, Gêra Mîr Mihema wek benderekê bû ji bajarê Cizîrê re, tev kelek û qeyikên ku ji Amedê û zozanan, di çemê Dîcle re dihatin, di wê gêrê de kom dibûn û li bajar û derdorê belav dibûn, ango navendek bazirganiyê bû.

Westanî jî dikeve rojhilatî Birca Belek. Ji dûr ve min çend wêne ji Birca Belek kişandin. Lê sed heyf û mixabin ku warê şera biyanî lê dikan gêra... Vî danê sibehê, em têra xwe geriyan heta ku em westiyan û li hotelê vegeriyan.¹³

¹³ Roja 08/02/2010 an de kak Abdulcebar, ji bajarê Cizîra Botan ez agahdar kirim û ji min re got: Di roja 12 Sibatê de, wê artêşa Tirkan bi rengeki fermî ji Birca Belek derkeve û Birca Belek li xwediyyê xwe vegere. Eger iro piştî 163

Li hotêlê, em çav bi nivîskarên ku ji her sê perçeyên Kurdistanê yên din hatibûn, ketin. Tev ji bo 2'yemîn Rojên Çand û Hunera Cizîrê hatibûn. Ji Kurdistana Başûr, Birêz Mueyyid Teyib helbestvan û serokê Weşanxaneya Spîrêz li Duhokê; ji Kurdistana Rojhilat, Celaleddin Nîzamî nivîskar û rojnamevanekî gewre ye ji bajarê Ormiyeyê û gelek kar û xebatê wî di warê ferheng û zimanê Kurdî de hene; ji Ewrupa, Firat Cewerî nivîskar, rojnamevan û xwediyyê kovara Nûdem a ku li Swêd dihat weşandin; ji Stenbolê, Samî Tan nivîskar û serokê Enstîtuya Kurdî a Stenbolê; ji Wanê, Qahir Bateyî nivîskar; ji Amedê, Reyhan Sarhan û Lal Laleş ji helbestvanên Amedê û hwd. Hem jî gelek hunermendên bi nav û deng ji Ewrupa û Kurdistanê gihabûn hotêlê, wek; Xero Ebbas, Aynur Dogan, Hekîm Sefkan, Şahê Bedo, Ferhat Tunç û gelek komên hunerî. Lê hê jî Emîre Sînemxan negihiştibû.

Li hotêlê hin jî hatibûn, pirsa min dikirin; dixwestin min bibînin. A rast, min jî diviyabû wan bibînim û pirsan ji wan bikim. Di serê wan kesan de kak Abdulcebar ê Cizîrî; ku di şaredariya Cizîrê de kar dike, hem jî serwextî şûnewarên Cizîrê û derdorê ye. Li gel wî min avokat Ridwan nas kir. Ez û kak Ridwan ketin guftûgoyeke dîrokî,

salan, ew diwanxaneya Mîrê Botan di Birca Belek de ji leşkerên Tirkan vala bibe, gereke li xwediyyêne xwe yên Kurd vegere û têkeve bin parastina UNESCO de, UNESCO lê bi xwedî derkeve, wek pêmayekî şaristaniya mirovahiyê bê parastin û ji nû ve restore bibe. Bi vê helkeftê em doza wî pêmayê Bedirxaniyan jî dikin, ew pêmayê ku Osmaniyan di sala 1847'an de destêne xwe danîne ser û birine Stenbolê. Em bi hêvîne ew pêma jî lê vegere û bibe wek mûzexaneyekê ji mirovahiyê re.

li dor Mîr Bedirxan û hevalên wî yê serhildanê, Xan Mehmûd û Nûrellah Beg... Çirok dirêje... Dawî Avokat Ridwan, wek dîdevan pirtûkek Sînan Hakan ji min re anî, ku li dor Kurdan di arşîvê Osmaniyan de ye. Ez ji dil spasiya wî dikim. Lê ciwanmêran; Mîrza, Ûnis û Ridwanê din soz dabûn, ku piştî nîvro me bibin Qesrika Gelî û Çemê Zeytûnê. Wiha danê êvarî, me rêka zozana girt û berê xwe da Çemê Zeytûnê û Qesrika Gelî.

Çemê Zeytûnê:

Me berê xwe da bakur û bi fetlonekên çemê Dicle re em meşîyan, bi rê de em pêrgî komên komirê hatin. Ji me re gotin, ev komir e, ji Şîrnexê tînin, li vir kom dikin û difiroşin. Piştî ku me cihê komirê derbas kir li dor 10/12 km'yan, li ber xelaseka ku em ji çem bi dûr kevin û bi çiyê ve hilkişin, panavek berfireh, di navbera çem û çiya de ket pêşîya me. Ji min re gotin ev dever jê re dibêjin Çemê Zeytûnê. Belê xwendevano! Di bihara 1847'an de, li vê deverê, cengek mezin di navbera leşkerên Botan bi serkêsiya Mîr Bedirxan û leşkerên Osmaniyan de, bi serkêsiya Osman Paşa qewimiye. Di vî şerî de leşkerên Botan bi ser ketine. Ji ber vê yekê dîtina Çemê Zeytûnê ji min re balkêş bû. Û em bi riya xwe de meşîyan heta ku em gihan Qesrika Gelî.

Qesrika Gelî:

Qesrika Gelî ji heyamê kevn ve, havîngeha mîrekên Botan bû. Û wiha ma havîngeh heta bi heyamê Mîr

Bedirxan ji. Li gor urf û adetên mîrekêñ Botan, wan mîrekan di demsalêñ payîz, zivistan û biharan de, çax û demê xwe li bajarê Cizîrê, di Birca Belek de, hikumdariya Botan dikirin. Belê di demsala havînê de, ji ber germa zêde, bi malbatî xwe li cihê hênik digirtin û diçûn Qesrika Gelî û ji Qesrika Gelî hikumdariya xwe li Botan û derdorê dimeşandin. Heta ku her sê mehêñ havînê dibihurîn û dibû payîz, dinya hênik dibû, hingê careke din, li bajarê Cizîrê û Birca Belek vedigeriyan û hikumdariya xwe berdewam dikirin. Ango Qesrika Gelî, ji mîrekêñ Botan re paytexta wan a havînî bû.

Gelek çîrok û serpêhatiyêñ mîrekêñ Botan di Qesrika Gelî de çêbûne, gelek karwan, di geliyê wê de hatine şelandin, gelek şer û kuştin di boxaza wê de qewimî ye. Qesrika Gelî, gundekî zozanî ye, li ser rêka Dêrgul û Şîrnexê ye. Di nav du çiyayêñ asê de bi cih dibe. Bi kaniyêñ ava sar xemilandiye, ew kanî dibil çemek bi navê Bakirtal û di nav gelî re diherike.... Kavilê pirek kevnar, ji temtêla Pira Bafit nîv wêran, lê xuya dike... Kes nikare ji zozanan here germiyanan û ji germiyanan here zozanan bêyî ku di geliyê Qesrikê re derbas bibe. Erê Qesrika Gelî paytexta mîrekêñ Botan a duyemîn bû. Me çend weneyêñ bedew ji Qesrika Gelî re kişandin, dinya li me bû êvar, em zivirîn bajarê Cizîrê.

Li hotelê şevbihêrka me dest pê kir, em çav bi gelek kesayetyêñ balkêş yên Cizîrê ketin. Min ji kak Abdulcebar xwest ku Mizgefta Mishefa Reş, Medreseya Serê Meydanê, Mizgefta Mîra, Gora Mîr Mihemed,

Seqlanê Mema û Seqnifîş şanî me bide, ciwanmîr soz da me ku sibehî derfet hebe, wê me bibe diyarî wan cihan.

Dawî em mîvan, xwe bi xwe, li hev kom bûn û em ketin dabaşa standardkirina zimanê Kurdî de; li başûr, şêweyê Soranî li talana me xistiye, zimanê Cizîrî, Xanî û Feqehê Teyran li ber bablîsoka Soran tarûmar dibe ku xwediyyê vî şêweyê di hawara wî de neyên gelekî zor e. Ez ne zimanzan im, lê min jî tizbiya xwe bi wan re berda û min li wan ciwanmîrên zimanzan guhdarî dikir. Ew ên ku zimanê Kurdî ji wan re kul e, ew jî ev bûn; Deham Abdulfettah, Mueyyid Teyib, Celaleddin Nîzamî û Samî Tan.

Ü her wiha em li hêviya hatina Emîre Sînemxan bûn. Saet yekê şevê, Emîre Sînemxan digel wê mamoste Samî Tan gihan hotêlê. Em derketin pêşwaziya wan. Di hêwana hotêlê de, em li dor Sînemxan bûn xelek, me pirsa rewşa wê kir û wiha em man hetâ derengî şevê. Di wê navê re birêz Metîn devê xwe kir guhê min de û got. Mamoste! Me karê xwe û pêşwaziye baş kiriye bo Sînem Xanim, bila dilê te di cî de be.

Sînemxan Bedirxan kî ye? Ew neviya mîrê Botan, Mîr Bedirxanê Azîzî ye. Mîr Bedirxanê ku di tîrmeha 1847'an de ji Cizîrê hatiye bidûrxistin û tev jiyanâ xwe, tevî zarok û neviyê xwe di sirgûniyê de winda kirine. Tevî ku Mîr Bedirxan bi hesreta axa Cizîra Botan bû, lê sultanê Osmaniyan rê nedidayê ku vegere, ne ew û ne zarokên wî. Belê Sînemxan neviya kurê Mîr Bedirxan, Emîn Alî Paşa ye, yê ku di sala 1851'an de li Stenbolê çêbûye û di sala

1926'an de, li welatê Misrê, bajarê Qahîre miriye. Bavê wê Mîr Celadet Bedirxan e, yê ku di sîrgûniyê de, li Stenbolê, di sala 1893'yan de çêbûye û sala 1951'ê li Şamê miriye. Diya wê Rewşen Xanim Bedirxan e, di sala 1909'an de li Qeyserî çêbûye û di sala 1992'yan de li Sûriye, bajarê Banyasê çûye rehmetê.

Rewşen Xanim, yekemîn jina Kurd e ku bi Kurdiya Latînî di kovara Hawarê de nivîsandiye. Sînemxan, di roja 21'ê Adara 1938'an de li Şamê çêbûye, ji ber zewacê, xwendina xwe di hiqûqê de nebiriye serî û di roja 22'yê meha Tebaxa 1959'an de bi nivîskarê kurd Selah Saadellah re zewiciye. Bi çend zimanên biyanî dizane, lê zimanê Kurdî, zimanê axaftina mala wê ye. Li dor berî bi salekê hevserê wê Selah Saadellah çûye ber dilovaniya Xwedê. Niha mala wê li Hewlîrê ye. Ji tesadufî û balkêsiya 2'yemîn Rojên Çand û Hunerê ya Cizirê, ku Sînemxan ji berî 49 salan ve, di rojek mîna vê rojê de 22/08/ zewiciye, hem jî ku di rojek mîna vê rojê de, apê wê Mîr Doktor Kamîran Bedirxan: 1895-1978, li Stenbolê çêbûye. Û va ye piştî 161 sal, neferek ji malbata mîrekên Botan, Emîre Sînemxan Bedirxan bi rengekî fermî tê warê bav û kalên xwe Cizîra Botan. Gelekî xweş bû ku xelkên Cizîrê ew bi gul û kulîkan pêşwazî kirin. Ev yek jî xweş nîşan e ji wefadariya xelkên Cizîra Botan ji mîrekên Botan re û tê wateya ku gelê Kurd zindî ye.



Sînem Bedirxan

22 Tebaxê roja ûnê saet dehê sibehê, me berê xwe da şaredariya Cizîrê. Li ber dergehê şaredariyê qîr û qiyamet bû; dahol û zirna Botanî li dar bû, komek keçên cil û berg spî, ji Navenda Çanda Mem û Zînê li erbaneyan dixistin, cemawerekî zexim ji xelkên Cizîrê û derdorê, ji bo pêşwaziya Emîre Sînemxan li ber deriyê şaredariyê kom bibûn. Di nav wan de parlementerê DEPê yê berê Selîm Sadak, parlementerê Şîrnexê yê DTPê Hasîp Kaplan, wekilê şaredarê Cizirê Ahmet Dalmaş, serokê DTP a bajêr Halîl Îrmez, endamê PM ya DTPê Fadil Bedirhanoglu, serokê DTPa navçeye Resûl Sadak, şaredare Şîrnexe Ahmet Ertak, şaredarê Cizirê yê ji peywirê hatibû dûrxistin Aydin Budak ku bi şal û şapikên Botanî xwe girê dabû, Şaredarê Nisêbînê Dr. Mehmet Tanhan, nûnêrên saziyan û gelek kesên din... Piştî ku gurzek gul û kulîlkên spî dane dest Emîre Sînemxan, bi dahol, zirne û erbaneyan ve, me dest bi meşa

festîvalê kir û me berê xwe da parka şaredariyê li ser peravê çemê Dicle. Li wir şerîta vekirina festîvalê û pêşangehê ji aliyê Sînemxan Bedirxan, Selîm Sadak, Hasîp Kaplan, Aydin Budak û Konê Reş ve hat qusandin. Şerefek mezin bû ku min jî bi wan ciwanmêran re şerîta vekirina festîvalê qusand, qet ez vê rojê jibîr nakim. Niha ez dihisim ku bare min girantir bûye. Di vekirina pêşangehê de parlamenterê berê yê DEPê Selîm Sadak axîfî û got: "Hatina Sînemxan Bedirxan rûmetek e." Û dom kir: "Bila gora Mîr Celadet Bedirxan jî bînin Cizîrê. Gora Mîr Bedirxan li Şamê ye, ji Şaredariya Cizîrê daxwaza min ew e ku bila ji bo wî abîdeyeke li Cizîrê çêbike." Her wiha Selîm Sadak li ser zimanê Kurdî jî axîfî û da zanîn ku kes nikare zimanê Kurdî têk bibe. Di pey re Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan axîfî û ji kêfan re rondik di çavên wê de kom dibûn: "Ez ne jinek wiha qels im, lê pêşberî Cizîra Botan û xelkên wê ez xwe qels dibînim." Û berdewam kir: "Nizanim çi bibêjim. Xwezî ew jî li cem me bana." Parlamentê DTP'ê Hasîp Kaplan jî got: "Çalakî rastî rojbûna Kamûran Bedirxan hatiye." û got: "Îro 103'yemîn sala rojbûna Kamîran Bedirxan e û gelek bi wate ye." Şaredarê Cizîrê Aydin Budak di axaftina xwe de got: "Xwediya malê a rastîn Sînemxan Bedirxan e." Û berê xwe da Emîre Sînemxan û got: "Niha xwediya malê a rastîn hûn in. Me navê mîhrîcana xwe danî 'Rûmeta Ziman, Zimanê Rûmetê. 80 sal in her tim xwestine zimanê me tune bikin, lê bi ser neketin. Divê em jî li ziman û rûmeta xwe xwedî derkevin."

Piştî axaftinan, pêşangeha ku Razaman Îmrag amade kiribû bi navê "Ji her alî ve Cizîr", digel tev hejmarên Hawarê, ewa ku birêz Firat Cewerî ji nû ve li Stokholmê dabû çapê, li parka şaredariyê, di bin konê pêşangehê de hat vekirin. Hem jî pêşangeha Navenda Çanda Ciwanên Demokratik bi navê "Reng diherikin nava axê" hat vekirin.

Di dawiya bernameyê de koma dansa gel a Kulîlkên Botanê hunera xwe bi çend reqs û semayêñ bedew pêşkêş kir. Danê evarî panelan dest pê kir; panelîst Evdilqadir Bingol, Fadil Bedirxanoglu û Hesen Çeter bûn. Mijara wan bi navê; Bi Çavêñ Nivîskarêñ Cizîrê Bajarê Cizîrê. Wek Moderator Feysel Sariyildiz ew pêşkêş kirin. Belê mixabin min nivîskarê Cizîrê yê gewre Abdullah Yaşîn (Xanîzade) nedît?! Di pey wan re û piştî bêhnvedanekê, Çiroka Penaberekê, ji rex Emîre Sînemxan Bedirxan ve hat gotin. Ciwanikê bi têr û tesel çiroka sîrgûniya malbata xwe a xwe û bavê xwe anî ziman û got:

"Sîrgûnî, derba herî mezin a li jiyana mirov dikeve... Ez serbilind im ku ji diyarê malbata Bedirxaniyan, li Cizîra Bota me. Sîrgûnî jiyana mirovan parce parce dike." Û Sînemxan, anî ziman ku tev neferêñ malbata wê di sîrgûniyê de mirine. Lî hesreta welat her tim di dilê wan de bû. Û berdewam kir û got: "Bavê min Celadet, hê ez 5-6 salî bûm, dema ez dibirim dibistanê, her tim bi rê de wiha ji min re digot: 'Keça min! Binihêre, em Cizîri ne, ji malbata Bedirxaniyan in û welatê me Kurdistan e...' Û wek şîret Sînemxan got: "Bi zarokêñ xwe re bi Kurdî biaxifin, çanda Kurdan bidin jiyînê... Û Sînemxana qedir bilind, di

hizûra Cizîriyan de wesiyyeta xwe kir û got: “Dema ku bimirim bi hêvî me li Cizîrê bême veşartin.” Sînemxan Bedirxan di berdewama axaftina xwe de wiha got: “Zimanê xwe xurt bikin û dev ji zimanê biyanî berdin. Bavê min digot: ‘Zimanê biyanî wekî cilê mirov e. Kengê bixwazî dikarî ji xwe bikî. Lê zimanê dayikê wekî çermê mirov e. Mirov nikare ji xwe bike.’” Û got: “Divê em di bin sîwana Kurdî de bêñ cem hev. Îro çi qas ne di rewşeke zêde baş de be jî, tu dinêrî li aliyekê rojname bi zimanê Kurdî derdikevin. Li Bakur yan jî li derveyî welat pirtûk têñ nivîsandin û çapkirin. Divê em dev ji zimanê xwe bernedin. Her gel bi zimanê xwe tê zanîn. Eger me bivê em ziman bi pêş bixin divê ji bo yekitiya zimanê Kurdî xebat bêñ meşandin.” Û bi van gotinan Emîre Sînemxan dawî li axaftina xwe anî: “Bi hesreta Kurdistanek azad we hemûyan silav dikim.” Kesên amadebûyî jî, çend xuleyan jê re li çepkan xistin.

Danê şevê konsera vekirinê festîvalê di stadyuma şaredariyê de, bi navê Rûyê Cizîrê yê vediguhere pêk hat. Hunermendêñ ku tê de besar bûn ev bûn; Hekîm Sefkan, Koma Evîna Botan, Ferhat Tunç, Koma Nûarîn, Şahê Bedo. Bi hezaran, ez dikarim bêjim ku dor 40 hezar mirov di stadyumê a bajarê Cizîrê de kom bibû.

23 Tebax 2008/Roja Şemîyê ji saet 10'ê sibê ve, li parka şaredariyê di bin navê ‘Bi çavêñ Kalan Cizîr’ me li sihbeteq xweş a van kalemêran guhdarî kir; Sebriye Seyît Keko, Aşiq Selîm, Evdila Abak. Her yekî ji wan serboriya xwe ji zaroktî û heta roja îro anîn ziman. Hem jî bersivêñ pirsên

beşdaran bi dilekî fireh ve gerandin. Di pey re û piştî bêhnvedanekê, li salona Meclîsa Şaredariyê, di bin navê “Ziman û Jin”, panelek ji rex birêz Xemrevîn ve hat lidarxistin. Danê êvarî, li parka Şaredariyê me li panela bi navê: Globalîzim, Asîmilasyon û Zimanê Kurdî, guhdarî kir. Ev panela ku ji rex birêzan: Qahir Bateyî, Deham Ebdulfettah, Mueyyîd Teyîb, Celaleddîn Nîzamî ve hat gotûbêjikirin. Semra Ozbey wek moderator ew pêşkêş kirin. Her yekî ji wan li gor bîr û baweriyêن xwe dewla xwe di bîra globalîzimê û zimanê Kurdî de dakirin.

Piştî bêhnvedanekê rola helbestê hat û di eynî parka şaredariyê de birêzan, Reyhan Sarhan û Lal Laleş helbestên xwe xwendin. Lê mixabin ew derfet bi min re nebû ku amade bibim. Min lêborîna xwe ji helbestvan Lal Laleş xwest. Di wê navê re kak Abdulcebbar Cizîrî em birin gel wan şûnewarên kevn yên ku hê jî me nedîtibûn û me diviyabû bibînin, wek: Mizgefta Mishefa Reş, Mizgefta Mîra, Mizgefta Serê Meydanê an Medreseyâ Serê Meydanê, Gora Mîr Mihema, Seqlanê Mema, Nêrgizî, Şikeftên Kora û Seqnefîs...

Mizgefta Mishefa Reş:

Navê vê mizgeftê bala me kişand, ji ber ku “Mishefa Reş” navê pîrtûka pîroz a Îzîdiyan e. Gelo çawa Misilmanan navê Mishefa Reş ku pirtûka pîroz a Îzîdiyan e li vê mizgeftê kirine?! Ji ber vê yekê bi germî me dixwest vê mizgeftê bibînin. Mizgeftek gelekî kevnare ye. Roja îro, kurê nivîskarê Cizîrê Evdilqadir Bingol îmamê wê ye. Li ser

daxwaza me, kak Cebbar jê re telefon vekir û got mîvan hene, dergehê mizgeftê vekirî bihêle. Em birek ji evîndarên Cizîrî, Feqehê Teyran û zimanê Kurdî wek; Samî Tan, Deham Abdulfettah û gelek kesên din, bi rêberiya kak Abdulcebar Cizîrî, Mîrza Ronî û Ûnis, me berê xwe da Mizgefta Mishefa Reş, ku di hundirê sûra Cizîrê de ye. Ango di Cizîra kevn de ye. Em çûn, Melayê (Îmamê) mizgeftê li hêviya me bû. Me dît ku mizgeft di sala 1980'yi de hatiye restorekirin, tevî ku hatiye nûjenkirin lê ji binê ve xuya dike ku bi kevirên reş hatiye avakirin. Gelekî biçük e. Xuya bû ku berî sala 1980'yi jî, hatiye restorekirin. Îmam nesxeyek ji Qur'aña ku li ser çermê xezalan hatibû nivîsandin, di nav kîsekî de danî ber me û got; ev Qur'an bi destê cendirman hatiye şewitandin. Li gor ku min bi çavê xwe dît, bûbû xwelî, mirov nedikarî tîpekê jî, jê bibîne, tev reş bibû, bûbû qirik. Ji me re gotin ku, di hatina Misilmaniye de, ji sala 639'an û pê de, çar dane (nesxe) ji Qur'aña pîroz ku li ser çermê xezalan nivîsandî bûn, yek ji wan, ango nesxeyek ji wan anîbûn Cizîra Botan, di Mizgefta Mishefa Reş de danîbûn. Ew nesxeya Qur'anê ya ku li ser çermê xezalan nivîsandî bû ji aliyê mele û feqeyan ve, di hundirê sandoqekê de, li Mizgefta Mishefa Reş parastî bû... Lê li gor derbasbûna çerx û dewranên salan, çend carekî ev mizgeft hatiye nûjenkirin (restorekirin).

Xuya ye ku piştî hilweşandina Împaratoriya Osmanî û damezirandina Komara Tîrkiyeyê a nû, êdî nema wek heyamê berê qîmet û nirx ji Misilmantiyê re hatiye girtin. Vêca Qur'an û mizgeft di ser guhan re hatine avêtin.

Piraniya mizgeftan ji aliyê hikûmata Tirkîyeyê a nû ve bûne qereqolên leşkeran. Û wiha, leşker li Mizgefta Mishefa Reş jî bi cih bûne. Birêz Baheddîn Robar, di nivîsek xwe de ku di van rojan de, di kovara W, hejmar 22'yan de belav bûye, bi navê Mizgefta Mishefa Reş, eynî vê gotinê dibêje û li ser zimanê Mele Evdilkerîm Ozer wiha dibêje: "Demsala zivistanê eskerên ku li wê mizgeftê peywirdar dibûn, agirek pêdixistin û xwe li derdora agir germ dikirin. Di wê navê re eskerek, sandoqekê di mizgeftê de dibîne, radihêjê tevî hûr û mûrên ku di sandoqê de ne, digel wê nesxeya Qur'anê ya ku li ser çermê xezalan hatibû nivîsandin û diavêje nav agir. Eskerek dibîne ku hevalê wî Qur'an avêtiye nav agir, bixar Qur'anê ji nav agir derdixe, lê dişewite û û reş dibe. Îdî gel ji vê nesxeya Qur'anê re gotin nesxeya reş an jî Mishefa Reş. Bi demê re ma di bin bandora Mishefa Reş de û ji wê hingê ve ji wê mizgeftê re dibêjin Mizgefta Mishefa Reş... Sebareti min, qet ev gotin neketin serê min de. Dibe ku nesxeyek ji wê Qur'ana ku li ser çermê xezalan nivîsandî bû, hatibe Cizîra Botan. Çinku piştî ku ola Îslamê hatiye deverê, bajarê Cizîr bûye navenda Misilmaniyê û cihê ilm û zanînê û ne dûr e ku nesxeyek ji wê Qur'anê hatibe Cizîrê û paşê hatibe şewitandin. Lê Mizgefta Mishefa Reş, navê xwe ne ji wê Qur'ana şewiti girtiye, navê wê ji wilo kevtir e bi gelekî. Di baweriya min de, navê wê ji Mishefa Reş ku pirtûka pîroz a gelê Kurd yên ku bi ola xwe Êzîdî ne hatiye girtin. Gelek dîrokzan dibêjin ku perestgehêن agir li Cizîra Botan hebûn, hem jî dibêjin ku malbata mîrekêñ Botan bi koka xwe Êzîdî ne. Ew gotina

ku hin wan digihînin Xalid Bin Elwelîd, qet ne rast e, ew bi xwe ji eşîra Xalta ne, a Êzîdî. Hê jî ev eşîra dêrîn heye. Ji wir me berê xwe da Mizgefta Mîrekan (Medreseya serê Meydanê).

Mizgefta Mîrekan:

Xuya ye ku ev mizgeft, di heyamê kevn de bi taybetî ji bo mîrekên Azîzan hatiye avakirin. Ji ber vê yekê piraniya wan tê de hatine veşartin. Mixabin, gorêن piraniya wan mîrekan nebedî bûne, bi tenê kavilê gora Mîr Mihemed şêxê nêçîrvanan xuya ye. Mixabin ku Mizgefta Mîrekan jî wek Mizgefta Mishefa Reş, ew guhdana pêdivî pê nehatiye kirin.

Mizgefteke biçûk e, di bakurî wê de, odayek nîv restorekirî û bêderî heye. Gora Mîr Mihema yê navdar bi navê şêxê nêçîrvanan, di hundirê wê odayê de ye. Ji me re gotin ku piraniya mîrekên Botan di vê mizgeftê de dihatin veşartin. Di baweriya min de, Medreseya Serê Meydanê an Mizgefta Serê Meydanê û Mizgefta Mîrekan yek in. Li gor ku ji me re gotin di heyamê berê de, sê medrese li Cizîra Botan hebûn; a pêşîn Medreseya Serê Meydanê bû (Ango Mizgefta Mîrekan), a din Medreseya Mîr Evdal bû a ku gora Mem û Zîn tê de ye û a dawî Medreseya Sor bû. Di van her sê medreseyan de hemû ilmên hemdemî dihatin xwendin, ne tenê ilmên olî, wek; Mentiq, Exlaq, Tib, Dîrok, Matematîk, Hendese, Endezyarî, Mîmarî, Leşkerî, Felsefe û tev şaxên zanistiyêن hemdemî. Me Medresa Serê Meydanê nedît û ne jî Mizgefta Serê Meydanê, bi tenê me Mizgefta

Mîrekan dît û gora Mîr Mihemed tê de bû. Di baweriya min de, ew di roja iro de, bi navê Mizgefta Mîra an Mizgefta Mîrekan têne binavkirin. Ji ber ku gora Mîr Mihema an Mîr Mihemed tê de ye, hem jî piraniya mîrekên Botan tê de hatine veşartin wek ku ji me re hat gotin.

Di lavijek Mîr Mihema de, vê yekê diçespîne dema lavijvan dibêje:

Ez ê serekî bilind fikirîme; li me bîne gurî

Qentarê kul û xema li ser dilkê kul de dihêwirî

Piştî Mihemed Begê, êdî xizmeta tu mîr û hakima nakim

Ez ê bikim xizmeta wî patîşahî, yê mîr û şah mazûlkirî.

Ez ê li dinya gewrik fikirîm, çiqa li min danayî.

Efno û Hejale bavên karan e.

Cepera Mihemed Begê, şêxê nêçîrvanan li xwe nadayî

Eger hûn tirba Mihemed Begê şêxê nêçîrvanan nas nekin

Herin Medresa Serê Meydanê li kêla wî binêrin

Tîrkevan û şeşxane li kêla wî kêşayî.

Di lavijek din de lavijvan wiha dibêje:

De were li min û vê dimaxê

Wey lê, avmijxwera te Çiravê

Were, çêrexwera te, li Gelikê Şaxê

Hey hey babê mino

Weleħ min heyfek û sêsed mixabin e

Mihemed Begê şêxikê nêçîrvana bimirê

Îro serê sê rojan û sê şevan e

*Li şehrê Cizîra Bota,
Li Mizgefta Serê Meydanê,
Wey babo, li wêdê
Piştka xwe bidê kendalê axê...*

Mihemed Beg, mîrek ji mîrekên Botan bû, bi navê Şêxê Nêçîrvanan dihat naskirin. Wî du karên pezkoviyan bi navê Efno û Hejale xwedî dikirin, her karek toqek zêr kiribû gerdena wê de. Di heyamê wî de tiving hebûn. Dibe ku ew di salêن 1790'an de miribe, li gor ku ji lavija Mîr Mihema tê naskirin û ew di Medreseyâ Serê Meydanê de hatiye veşartin. A ku roja iro jê re dibêjin Mizgefta Mîrekan.

Em vejerin roja xwe. Beşê şevê li Navenda Çand û Hunerê ya Mem û Zînê bû, me li şanoya bi navê: Nexweşxaneya Zimanê Kurdî, temaşe kir. Ev şano ji rex Teatra Mezopotamya ve hat pêşkêşkirin, gelekî xweş bû. Min xwest danerê wê nas bikim, lê mixabin nehat naskirin.

24 Tebax 2008/ Roja Yekşemê ji saet 10'ê sibê ve, li parka şaredariyê, li ser peravê şetê Dicle û di bin navê Dîwana Dengbêjan de, me guhdariya dengbêjên Cizîra Botan kir. Ew jî ev ciwanmîr bûn: Silêmanê Şirnexî, Cemalê Mihê, H. Ehmedê Şilyanî û Evdirrehmanê Mehîmûdê Ala. Di wê guhdariyê de Mîr Celadet Bedirxan û dengbêjê wî Ehmedê Fermanê Kîkî hatin bîra min. Wan dengbêjan em di warekî Kurdî Botanî de kûr û dûr birin; Xelefê Şûvî anîn bîra min, ew ê ku razî nebû ji Ezdînşêr re bibêje Mîrê Botan, bi tenê jê re got: Ezdînşêr Begê Botan e.

Piştî bêhnvedanekê, em digel Emîre Sînemxan Bedirxan çûn şaredariyê, ku em silavekê li şaredar Aydin Budak bikin, hem jî spasiyên xwe jê re pêşkêş bikin. Li şaredariyê ciwanmîr ji bo her yekî ji me çend pirtûkên ku li dor Cizîra Botan hatine çapkîrin dane me; di pey re, wî her yek ji me bi xelateke yadîgarî, wek bîranîn bo festîvala 2'yemîn a Rojên Çand û Hunera Cizîra Botan, em xelat kirin. Û wiha ger û geşta bajarê Cizîrê dest pê kir. Li gor programa gerê, em bi wan re çûn wan cihêن ku berê me ew dîtibûn wek: Medreseyî Sor, Medreseyî Mîr Evdal, Gora Mem û Zîn, Mizgefta Mezin, Gora Nûh Pêxember û gora Parlementerê Kurd Orhan Dogan(1955 – 2007), yê ku di Adara 1994'an de hat girtin û zêdeyî 10 salan di zindanê de ma.

Digel ku gelek cihêن dîrokî li bajarê Cizîra Botan hene wek ku li jor me ew bi nav kirin, wiha jî gelek cihêن seyranan û gulgeştan lê hene wek: Seqlanê Mema, Kaniya Qesara, Nêrgizî, Şikeftên Kora û Seqnefîs... Û her yek ji van seyrangehan taybetiyek wî heye. Jixwe diyar e ku Cizîrî kîfçî ne, ku ne kîfçî bûna kesên wek Seîd Axa Cizrawî, Hesen Cizîrî, Mihemed Arif Cizrawî, Meyremxan, Fato Korê... nav û deng di Kurdistanê de nedidan... Di nav re me xwe ji komê vedizî û em çûn wan cihêن ku me navêن wan bihistibû lê nedîtibûn, yê ku me li jor behs kir.

Seqlanê Mema:

Em çend kes bûn, bi rêberiya kak Abdulcebbâr Cizîrî, me berê xwe da başûrî bajarê Cizîrê, li ser rêka Zaxo û

Eyndîwerê, nêzikî sînorê Sûriyê bi dor 2 km'yan, em gihan çemê Seqlanê Mema. Seqlan; çemekî biçûk e, ava wî ji kaniyên Ciyyâ Spî dizê û ber bi başûr ve diherike heta ku di nav tixûbêñ Binxetê de tev li çemê Dicle dibe. Li wir, em çav bi kavilê pirek kevnar, di rengê Pira Bafit de ketin, lê jê biçûktir bû. Hem jî kavilên sê aşen avî hebûn. Dibêjin ku berê cend daristan li dor çemê Seqlan hebûn, her dem şîn bûn û ew dever xweş seyrangeh bû ji xelkên Cizîrê re, nexasim di havînan û payîzan de.

Kaniya Qesara:

Ev kanî jî nêzikî Çemê Seqlan e. Ava wê jî tevî ava Seqlan dibe û ber bi Eyndîwerê ve diherike. Ji mêj ve jin û keçen Cizîrê cil û cawên xwe tê de dişûştin, hem jî wek seyrangehekê bû ji xelkên Cizîrê re. Navê vê kaniyê gelek caran di Memê Alan de derbas dibe. Piştî ku Mem gihaye Cizîrê, yekemîn car, li ser vê kaniyê çav bi Zînê ketiye. Mixabin roja îro ne ava Seqlanê Mema û ne ava Kaniya Qesara wek heyamê berê diherikin.

Nêrgizî:

Ji mêj ve du seyrangehêñ ku di biharan de bi nêrgizan dihatin xemilandin, li derdora Cizîrê hebûn; yek jê li bareşî Cizîrê bû, niha cihê wê bûye nexweşxane. A din li başûrî Cizîrê ye, nêzikî Seqlan û Kaniya Qesara, ew jî niha di nav sînor de hatiye parcekirin, beşek jê ketiye rexê Sûriyê de. Navê Nêrgizî li van her du gulgest û seyrangehan hatiye kirin ji ber ku di biharan de, nêrgiz bi tov li wan cihan

çêdibûn. Ji Seqlan, me berê xwe da bareşî Cizîrê, cihê herî bilind di ser bajar re ku niha nexweşxaneya bajar li ser ava kirine. Ji wir me li bajarê Cizîrê temaşe kir. Bajar bi tevayî xuya dikir, minareyên mizgeftan ber bi asman ve bilind dibûn, goristana Cizîrê, bêser û ber di hundirê kavilê sûra wê de xuya dikir. Ji wir me berê xwe da Şikeftên Kora û Seqnefîs.

Şikeftên Kora:

Ev şikeft li ser rêka Eyndîwerê û Zaxo ne. Dibêjin di heyamê mîrekên Botan de û heta bi heyamê Mîr Bedirxan, ev şikeft terxankirî bûn bo koran û hejaran. Da ku bajarê Cizîrê ji koran paqij be, ew şikeft ji wan re terxan kiribûn. Di wî heyamê ku dermanê xuriyê nebû, xelik bi xuriyê dikerin û piraniya wan kor dibûn, vêca mîrekên Botan ew şikeft bo wan koran terxan kiribûn û di nav gel de belav kiribûn ku, kesê zekata xwe an xêrekê bike, bela bide korêwan şikeftan. Û wiha ew şikeft bi navê Şikeftên Kora hatine naskirin.

Seqnefîs:

Kaniyeke avê ye. Berê, derî sûra bajarê Cizîrê bû. Havînê ava wê sar e û zivistanî germ e. Xaniyek li ser vê kaniyê hatiye avakirin, di hundirê wî xanî de birkek heye bo şûştin û helalkirinê. Dibêjin ku ev kanî bi taybetî hatiye terxankirin bo wan kesên ku bi cenabet bin, ji dê û bavê xwe şerm dikan ku di mal de xwe tahir û helal bikin, vêca diçin derî bajêr xwe di vê kaniyê de helal dikan. Gotin

Seqnefîs bi gelek dengen tê bilêvkirin hin dibêjin; Senefîs, hin Seqnefîs û hin Sitnefîs dibêjin. Lê ya rast dibe ku bi navê Sitiya Nefîs hatibe binavkirin û Sitiya Nefîs jina mîrekî Botan be û gelekî hez vê kaniyê dikir, ji lewre bi nave wê hatiye naskirin. Belê ji ber sivikbûnê, roja îro jê re dibêjin Seqnefîs. Dibêjin ku di heyamê berê de dora vê kaniyê bi kulîlk û nêrgizan dihat xemilandin. Ji ber vê yekê di gelek çîrok û stranên Cizîriyan de, navê Seqnefîs û Seqlanê Mema derbas dibe, wek vê stranê:

*Cizîr xweş meqam e, berberî Misir û Şam e,
Seqnefîs hemmama me ye, Seqlan piçekî zêde ye...*

Li gor ku ji me re gotin, gelek seyrangeh û gulgeşt li dor bajarê Cizîrê hene, ew derfet bi me re nebû ku em herin wan jî bibînin. Hin ji wan di tixûbêñ Cizîrê de ne û hin ketine nav tixûbêñ Dewleta Sûriyê de wek: Eyndîwerê, *Pira Bafit*, *Kaniya Xeyda û Nêrgiziyek* ku ketine nav sînorê Sûriyê de, lê yên mayî ji wan seyrangehêñ ku Cizîriyan xwe li wan digirtin ev in: *Rezê Mîra*, *Caferê Sadiq*, *Cotikê Tûyan*, *Şikeftan*, *Mîr Hesen*, *Eyntirbê*, *Keylûşk*, *Emerî*, *Lawikê Xerîb*, *Kaniya Emo*, *Serê Sinsalê*, *Newala Tilik*, *Çemê Kursî*, *Çemê Cihûyan*, *Sitya Heyat*, *Mam Elo*, *Kaniya Evdilcelîl*, *Mîr Evdal*, *Banê Cirf*, *Şikefta Dilop*, *Delavê Qitkan*, *Borê Mirîşkan*... Hêjayî gotinê, ku ji kevn de û heta roja îro, her çarşem jinêñ Cizîriyan diçin Westanî, li ser peravê Şetê Dicle, ku îro bûye parka Şaredariyê, xwarina xwe bi xwe re dibil û roja xwe di bin wan darêñ çinar û mazîyan de derbas dikin. Bi tenê jin, keç û zarok diçin, çenabe ku zilam di nav wan de hebin. Dibêjin di wek vê

rojê de jin bûkan ji zarokên xwe re hildibijêrin. Hem ji xelkên Cizîrê, bi hatina Çarşema Reş re ku dikeve meha Nîsanê, derdi Kevin seyranan, derî bajêr, ji sibehê heta bi evarî dimînin. Dibe ku ev teqlîd ji pêşiyêن Kurdan yê ku berê Êzîdî bûn hatibe girtin, ji ber ku roja Çarşemê rojeke pîroz e ligel Êzîdiyan...

Danê piştî nîvro, panela festîvalê bi gotûbêja kak Samî Tan dest pê kir, ew a bi navê ‘Di pêşketina zimanê Kurdî de rola dîrokî ya Cizîrê’. Mamoste Tan bi têr û tesel li dor dîroka zimanê Kurdî û Cizîra Botan xepart, rola Cizîrê ji kevn û nû de, di parastina zimanê Kurdî de anî ziman û got: “Cizîr xwedî cihekî girîng e û li Cizîrê tenê zimanek hatiye bikaranîn û ew jî Kurdî ye.” Mamoste Samî Tan bi lêv kir û got ku: “Li bajarên Kurdistanê yên din zimanên cuda digel zimanê Kurdî hatine bikaranîn û ji ber vê yekê di zimanê Kurdî de Cizîr girîng e.” Tan diyar kir ku Cizîr bi çand, ziman û hemû tiştên xwe ve kurdewar e û her wiha kak Tan di berdewamiya axaftina xwe de got: “200 sal in li ser Cizîrê polîtikayêن kirêt têne meşandin. Lê gelê Cizîrê li hemberî wan kirin, zext û zordariyan dîsa jî li zimanê xwe xwedî derketiye. Ji ber vê yekê Cizîr di mijara zimanê Kurdî de xwedî cih û mîsyoneke girîng e.”

Piştî bêhnvedanekê gotûbeja min û kak Firat Cewerî dest pê kir. Gotûbeja min bi navê ‘Qîrîn û Hawara Mîr Bedirxan’ bû. Min wiha dest bi gotûbêja xwe kir:

Ez jî wek neferekî Botî, bejna xwe ji Emîre Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan re xûz dikim û bi çavekî dîrokî li vê hatina wê a bajarê Cizîra Botan mîze dikim.

Li ser daxwaza şaredariya bajarê Cizîra Botan û serokê wê, birêz Aydin Budak, wekîlê şaredariyê birêz Ahmed Dalmış ku gotin ‘ziman rûmet e û rûmet ziman e’... Li ser daxwaza xelkên Cizîrê, bajarê Cizîrê û serboriya wê a dîrokî ku landika şaristaniyê ye... Li ser daxwaza şêxê nêçîrvanan Mîr Mihema û her du pezkoviyên wî; Efno û Hejale û her du binemalên dêrîn; Bêgo û Zeydîn... Li ser daxwaza Mîr Şeref û Medreseya Sor... Li ser daxwaza Meleyê Cizîrî û Selamayê... Li ser daxwaza Feqehê Teyran û Ava Dicle... Li ser daxwaza Ehmedê Xanî û Mem û Zînê... Li ser qîrîna Mîr Bedirxanê Botî di Birca Belek de ku digot ‘Dîn dînê Xwedê ye, em tev birayê hev in’ û Peymana Pîroz... Ewê ku biyaniyan di derheqa wî de gotin: Bedirxan edalete û edalet Bedirxan e... Li ser hawara Xelefê Şûvî:

*Ez Xelef im Xelef im Hawar e mîro hawar e
Ez Xelefê Şûvî me Ezdînşer begê Botan e
Xwedyê şûrê sedef im Hawar e mîro hawar e
Gel eşîra şer dikim Deng, dengê mîrê Botan e
Ez Xelefê kinik im Hawar e mîro hawar e
Xwedyê şûrê çirik im Ezdînşer begê Botan e
Ez Xelefê Botî me Hawar e mîro hawar e
Ji eşîra bi hevî me Deng dengê mîrê Botan e*

Di gotûbejê de min di der barê Bedirxaniyan de agahî dan û anî ziman ku koçberiya malbata Bedirxaniyan ji sala

1847'an dest pê kiriye. Her wiha min diyar kir ku her çi qasî li sirgûnê mabin jî û dûrî Cizîra Botan jiyana xwe ji dest dabın, lê qet wan gelê xwe ji bîr nekirin û her gav ji bo gelê xwe xebitîne. Û ez pê de çûm û min got: Malbata Bedirxaniyan gelek komele, dibistan, kovar û rojnameyên Kurdî ava kirine... Yekemîn rojnameya Kurdî bi nave KURDISTAN di 22'ye Nîsana 1898'an de li Qahîreyê hatiye derxistin. Bedirxaniyan di hin deman de, li cihêن cuda 7 komele ava kirine, 10 dibistan çekirine û 10 rojname derxistine. Li jêr ez ê di der barê van de hin agahiya bidim.

Di pey min re kak Firat Cewerî di gotûbêja xwe de bi bîranîna Mehmed Ûzûn û Ordîxanê Celîl dest bi axaftina xwe kir. Û axaftina xwe di der barê çîroka çapkirina Kovara Hawarê de anî ziman û got ku kovara Hawarê bingehê Kurdiya nûjen ava kiriye. Her wiha Cewerî bilev kir û got: "Min hemû hejmarêñ kovarê ji nû ve çap kirine lê Kurd li kovarê xwedî derneketine." Her wiha wî çîroka xwe û çapkirina Hawarê anî ziman û got: " Di sala 1987'an de çûm Sûriyê/bajarê Banyasê, bal Emîre Rewşen Bedirxan min ji cem wê hin hejmarêñ Hawarê anîn. Min diviyabû wan ji nû ve çap bikim. Lê mixabin gelek hejmar ji wan kêm bûn. Rehmetî Mihemed Ûzûn ew hejmarêñ kêm dane min. Ew di sala 1985'an de çûbû bal Rewşen Xanim Sûriye, bajarê Banyas û wî tev hejmarêñ Hawarê anîbûn..." Û got, "Divê hemû hejmarêñ kovara Hawarê di malen Kurdan de cih bigirin..."

Konsera bi dawî anîna festîvalê, ji bo bîranîna Orhan Dogan û Yahya Menekşe hatibû terxankirin. Konser li

stadyoma bajarê Cizîrê pêk hat û bi stran û dengên Koma Rewşen, Aynur Dogan û Xêro Ebbas hat xemilandin; cemawerekî zor zexim ji xelkêن Cizîrê, Şîrnex, Nisêbînê û Silopî hazir bibûn.

KOMELE, DIBISTAN, KOVAR Û ROJNAMEYÊN KU ZAROK û NEVIYÊN MÎR BEDIRXAN XWE DI BER DE WESTANDINE

A. KOMELE:

1 - Kurd Teawin û Tereqî Cemiyetî:

Yek ji komeleyê ewil e yê ku Kurdan damezirandiye; yek ji hîmdarên wê yên sereke Emîn Alî Bedirxan bû, ev komele di sala 1908'an de li Stenbolê hatiye vekirin.

2 - Komeleya "Kurd Teşkîlat Îçtîmaiye Cemiyetî":

Hîmdarên vê komeleyê xwerû Bedirxanî bûn, ev komele di sala 1911-1910 an de li Stenbolê vebûye.

3 - Komeleya "Kurd Neşrî Mearif Cemiyetî":

Yek ji hîmdarên vê komelê Mîr Ebdirehman Bedirxan bû, ev komele di sala 1910'an de li Stenbolê hatiye damezirandin.

4 - Komeleya "Gihadîn":

Komeleya Kurdî ya rewşenbîrî bû ji bo belavkirina zanînê, ev komele di sala 1912'yan de li bajarê Xoyê li Kurdistanâ Êرانê, ji rex Mîr Ebdirezaq Bedirxan ve û bi alîkariya Simko Axa Şîkakî hatiye vekirin.

5 - Komeleya "Kurdistan

Îstîqlal Komîtesî":

Ev komele piştî ku Herba 1. ya Cîhanê qedyâ li Qahîreyê ji rex Mîr Süreya Emîn Alî Bedirxan ve hatiye damezirandin.



6 - Komeleya "Xoybûn":

Ev komele di sala 1927'an de li Beyrûdê hatiye damezirandin, yek ji hîmdar û serokên wê Mîr Celadet Bedirxan bû.



Endamên XOYBÛNê, Şam-1931

7 - Komeleya "Dostaniya Kurd û Ermeniyan":

Ev komele di sala 1914'an de li Saint Peteresburgê ji rex Mîr Ebdirezaq Bedirxan ve hatiye avakirin.

8 - Civata Alîkarî Ji Bona Belengazên Kurdan li Cizîrê:

Ev komele di sala 1931'ê de li Şamê hatiye damezirandin, yek ji hîmdarêne wê yên sereke Mîr Celadet Bedirxan bû û wî bi xwe nîzamnama bingehîn û hundirîn jê re danî û di sala 1932'an de bi Kurdi û Fransî û Erebî çap kir.

B. DIBISTAN:

1 - Dibistana Stenbolê:

Ev dibistan di sala 1910'an de li Stenbolê ji rex Komeleya "Kurd Neşrî Mearif Cemiyeti" û "Komeleya Kurdî Ji Bo Belavkirina Zanînê" hatiye vekirin, bi alîkariya diravî ji Mîr Ebdurehman Bedirxan û rêvebiriya wî.

2 - Dibistana Xoyê:

Ev dibistan di sala 1913'yan de li Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Xoyê, ji rex Mîrê şehîd Ebdirezaq Bedirxan ve û bi alîkariya Simko Axa Şikakî hatiye vekirin.

3 - Dibistana Teblîsê:

Ev dibistan di sala 1929'an de li bajarê Teblîsê ji rex Mîr Kamil Bedirxan ve (1872-1934) hatiye vekirin.

4 - Dibistana Beyrûdê:

Ev dibistan di sala 1943'yan de ji rex Mîr Dr. Kamîran Bedirxan ve li Beyrûdê ji bo fêrbûna zimane Kurdî ji mişextî û sirgûnkiriyên li Libnanê hatiye vekirin.

5 - Dibistana Şamê:

Di salên 1930'ı de di ber weşandina kovara Hawarê de, Mîr Celadet Bedirxan dibistanek li Şamê vekiribû bi navê dibistana 'Kurdistan'. Ev dibistan li taxa Kurdan bû, nêzîkî mala Xalid Bekdaş. Hêjayî gotinê ye ku wê hingê bi saya Mîr Celadet çend dersxane û dibistan li Cizîrê jî vebûn wek: Tilşîirê, Talikê, Qeremanê û Eyndîwerê.

6 - Beşê Kurdî di Instîtuya Rojhilatnasan li bajarê Saint Petersburgê:

Ev beş bi saya şehîd Mîr Ebdirezaq Bedirxan hatiye vekirin. Mîr Ebdirezaq Bedirxan (1864-1918) di sala 1918'an de ji rex waliyê Mûsilê Silêman Nezîf ê Kurd ve hat bidarvekirin û ew di goristana biyaniyan de hatiye veşartin.



*Evdîrezaq Bedirxan Beg,
1905, Stembol.*

7 - Instituya Kurdî li Parîs:

Di sala 1974'an de, Mîr Dr. Kamîran Bedirxan Komeleya "Frensa-Kurdistan" ava kiribû, ji dostêvê komeleyê gelek rewşenbîrên bi nav û deng hebûn, wek: Jean Paul Sartre, Sîmon Dîbavor, Maxime Rodinson û gelekê din. Piştî koçkirina Mîr Dr. Kamîran Bedirxan di sala 1978'an de û hatina partiya sosyalist a Fransî li ser hikm di sala 1981'ê de, rê li ber komeleya (Fransa-Kurdistan) hat vekirin ku bibe Instituya Kurdî û wiha Instituya Kurdî li Parîs hat vekirin, ew jî bi saya Dr. Kamîran Bedirxan.

8 - Komeleya Xeyrî ya Kurdî li Beyrûdê:

Ev civata xeyrî di sala 1968'an de li Beyrûdê bi saya peywendiyê Mîr Dr. Kamîran Bedirxan û dostaniya wî bi malbata (Elsulih) re hat vekirin.

9 - Instituya Washington a Kurdî:

Ev instîtu ji berî çend salan ve hatiye vekirin, yek ji hîmdarên vê instîtuyê yek ji neferêvî malbata Mîr Bedirxan e, şaxê Yezdan Şêr, navê wî Seyfeddin e.

10 - Civata Selahedîn Eyûbî li Emmanê (Urdin):

Yek ji hîmdarên vê civatê jî Selîm Bedirxan e, ew jî ji neviyêvî Yezdanşêr e.

Dawî hêjayî gotinê ye ku bi saya Mîr Dr. Kamîran Bedirxan gelek komeleyê dostaniyê di navbera gelê Kurd û yên Ewrûpî de hatine avakirin. Hem jî Dr. Kamîran Bedirxan

di Şoreşa Îlonê de wek nûnerekî bû ji şoreşê re li Ewrûpayê û bi navê şoreşê û Berzaniyê nemir diaxivî.

C. KOVAR Û ROJNAME:

1 - Kurdistan (1898):

Rojnameyeke 15 rojî bû, cihê weşandina wê ji hejmara 1-5'an li Qahîreyê bû, xwediyyê wê Mîr Miqdad Midhet Bedirxan bû. Hejmarên mayî ji 6-31'ê xwediyyê wan Mîr Abdurehman Bedirxan bû, birayê Mîr Miqdad. Cihê weşandina wan ji 6-19'an li Cinevreyê çap bûne; ji 20-23'an jî careke din li Qahîreyê çap bûne; hejmara 24'an li Londonê çap bûye; hejmarên 25-29 li Folkostonê û her du hejmarên dawîn li Cinevreyê çap bûne; hejmara 1'ê di 22'ê Nîsana 1898'an de derçûye û hejmara dawîn (31) di 14'ê Nîsana 1902'an de.

2 - Omîd (1900):

Rojnameye 15 rojî bû, cihê weşandina wê li Qahîreyê bû, xwedî û berpirsyarê wê Mîr Mihemed Salih Bedirxan bû (1874-1915), hejmara 1'ê di Îlona 1900'î de çap bûye.

Salih Bedirxan-1915



3 - Kurdistan (1908):

Rojnameyeke Kurdî û Tirkî bû, cihê weşandina wê li Stenbolê bû, xwedî û berpirsyarê wê Mîr Sûreya Bedirxan (1883-1938), an Ehmed Sûreya Emîn Alî Bedirxan bû, hejmara 1'ê di sala 1908'an de, ya dawîn di 13'ê Nîsana 1909'an de derketiye.

4 - Kurdistan (1912):

Kovareke Kurdî û Tirkî bû, cihê weşandina wê Urmiya bû, xwedî û berpirsyarê wê şehîd Mîr Ebdirezaq Bedirxan bû; hejmara 1'ê di sala 1912'yan de çap bûye; ya dawîn di sala 1914'an de; di sala 1913'yan de piştî ku Mîr Ebdirezaq çûye Saint Petersborgê, Simko Axa bi berpirsyariya wê rabûye.

5 - Yekbûn (1913):

Rojnameyeke Kurdî û Tirkî bû, di hefteyê de du caran dihat weşandin; cihê weşandinê Stenbol bû; di sala 1913'an de hejmara 1'ê derketiye; xwedî û berpirsyarê wê Mihemed Salih Bedirxan bû, bavê Xanim Rewşen Bedirxan.

6 - Jîn (1916):

Kovareke 15 rojî bû; bi Kurdî û Tirkî bû; cihê weşandina wê li Qahîra bû; di sala 1916'an de derketiye; xwedî û berpirsyarê wê Mîr Sûreya Bedirxan bû.

7 - Hawar (1932):

Ev kovar bi du zimanan, Kurdî û Firansî dihat weşandin, her 15 rojan derdiket; di warê ziman, ferheng û rewşenbîriya Kurdî a têvel de şoreşeke nû bû û dûrî siyasetê bû, cihê weşandina wê Şamê bû. Xwedî û berpirsyarê wê Mîr Celadet Alî Bedirxan bû. Ev kovara bedew û spehî, ji ber rewşa aborî di sê qonaxan re derbas bûye, heta ku hatiye rawestandin.

Temenê Hawarê yê aktiv sê sal e, lê ji ber rewşa aborî, ya ku Mîr tê re derbas dibû, yazdeh salan pêre dirêj kiriye. Hejmara (1) ê di 15'ê Gulana 1932'yan de, ya dawîn (57) di 15'ê Tebaxa 1943'yan de derketiye. Hawar, ji hejmara 1'ê heya 23'yan, heya roja 25'ê Tîrmeha 1933'yan bi dûv hev de hatiye weşandin; hejmara 24'an di roja 24'ê Nîsana 1934'an de derketiye, hejmara 27'an di roja 15'ê Nîsana 1941'ê de hatiye weşandin, heta ku hejmara dawî 57 di roja 15'ê Tebaxa 1943'yan de hatiye weşandin û êdì nema Hawarê ronahî ditiye.

Rûpelên kovarê bi tevayî li dor 20 rûpelan bû. Beşê Fransî 2-4 rûpel bû. Ji hejmara 1-23'yan bi du alfabetan, Erebî û Latînî, dihat nivîsandin, ji hejmara 24'an û bi şûn ve, bi tenê alfabetan Latînî maye berdest; hem jî tipê (Q) û (K), li ser daxwaza Elî Seydo Goranî bi hev hatine guhertin.

Mîr Celadet Bedirxan di hijmara pêşî di rûpelê pêşî de bi gotarekê, di der barê armanc û awayê xebata ‘Hawarê’ de jî wiha dinivîsî:

“Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide naskirin.

Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e. Hawar jû (ji iro û) pêve bi her tiştê ko Kurdanî û Kurdîtî pê bendewar e dê mijûl bibe, tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye, bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner û sinehetê de dê bixebeitin...”

Ji 2006'an û virde ji ber roja destpêka weşana ‘HAWARê her sal 15'ê Gulanê wek ‘Roja Zimanê Kurdi’ tê pîrozkirin.

8 - Ronahî (1942):

Kovareke mehane bû, xwerû bi Kurdiya Latinî bû. Li Şamê hatiye çapkiran, xwedî û berpirsyarê wê Mîr Celadet Alî Bedirxan bû. 28 hejmar ji vê kovarê hatine çapkiran û belavkirin. Hejmara 1'ê, di 1'ê Nîsana 1942'yan de derketiye; hejmara dawîn (28), di meha Adara 1945'an de, hatîye çapkiran û belavkirin û êdî Ronahî jî, wek xwişka xwe Hawarê hatiye rawestandin. Dibêjin ku ev kovar wek zêdeya kovara Hawarê bû. Di heyamê Hawarê de û tevî ku Mîr Celadet bi tena xwe Hawar derdixist, kovara wî, ji çêtirîn kovar bû di nav kovarên Erebî û Fransî de yên wê hingê li Şamê.

9 - Roja Nû (1943):

Rojnameyeke hefteyî ya siyasî bû; xwedî û berpirsiyarê wê Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan bû. Cih û warê çapa wê wek ku li ser hatiye nivîsandin: Libnan/Beyrûd bû. Hejmara pêşîn (1) ji vê rojnameya bedew di 3'yê Gulana 1943'yan de hatiye weşandin, hejmara dawîn (73) di 27'ê Gulana 1946'an de hatiye weşandin bi zimanê Kurdî û Fransî bû. Ev rojname ji 4 rûpelan pêk dihat 3 rûpel bi Kurdî bûn û yek bi Fransî bû, ji hejmara 49'an û pê ve hejmarek bi Kurdî û yek bi Fransî hatiye weşandin.

Belê cihê daxê ye ku ev rojname ji ber rewşa aborî û sosyopolotîkî, hem hejmarên wê li ser hev nehatine çapkiran li gor programê xwediyyê wê û hem jî hatiye rawestandin. Ev rojname ji hejmara (1- 12) her heftî bi dûv hev de roja duşemê dihat weşandin, hejmara 13'yan piştî wan bi 15 rojan hatiye weşandin. Ji hejmara (14 - 23) dîsa her heste di roja duşemê de hatiye weşandin, hejmara 24'an piştî 15 rojan hatiye weşandin. Ü wiha carinan 15 rojî û carinan hefteyî hatiye weşandin, hem jî carinan hejmarek bi Kurdî û carinan yek bi Fransızî û carinan jî her du ziman bi hev re hembêz dikirin û dihat weşandin.

Tevî ku Roja Nû rojnameyeke siyasî bû, belê gelekî guh daye folklor û çanda Kurdî, mirov dikare navê hin nîvîskarên wê yên beşê Kurdî diyar bike ji bilî navê xwediyyê wê Dr. Kamîran Alî Bedirxan, ew jî ev in: Mîr Celadet Alî Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Hesen Hişyar, Qedrî Can, Ehmed Namî, Mistefa Ehmed Botî.

10 - Stêr (1943):

Rojnameyeke xwerû bi Kurdiya Latînî bû, wek zêdeya Roja Nû bû; cihê weşandinê li Beyrûdê bû. Hejmara 1'ê di Çileyê berê de sala 1943'yan de derketiye, hejmara 2'yan di meha Sibata 1944'an de, hejmara dawîn, yanê ya 3'yan di 22'yê Çêriya berê de, sala 1945'an de derketiye; anku her salekê hejmarek hatiye çapkîrin û belavkirin. Dibêjin ku ev rojname wek zêdeya rojnameya 'Roja Nû' bû. Xwedî û berpirsyarê wê Mîr Dr. Kamîran Bedirxan bû. Hezar silav li giyanê tev neferên malbata Bedirxaniyan bibare, buhişt cih û warê wan be!

BEDIRXANÎ XWEDIYÊN BANGA NETEWEYÎ YA KURDÎ NE

Di baweriya min de, eger Bedirxanî û Mîr Miqdad Midhet Bedirxan yê ku Rojnameya KURDISTAN derxistiye, bi taybetî ne xwediyên banga neteweyî ya Kurdî a 2'yemîn bin, lê her ew xwediyên banga neteweyî a Kurdî ya 3'yemîn in. Rast e helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî bavê banga neteweyî Kurdi a yekemîn e û wek ku hatiye naskirin Hacî Qadirê Koyî yê duyemîn e, lê her Bedirxanî xwediyên wê qenciyê ne, çiko Hacî Qadirê Koyî di bin bandora Bedirxaniyan de, li Stenbolê fêr û serwextî Kurdewariya neteweyî bûye.

Mîr Miqdad Midhet Bedirxan kurê Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxan e. Wek ku me berê got, di sala 1847'an de, Mîr Bedirxan û malbata xwe sirgûnî Stenbolê bûne, di pey re girava Girîtê... Li Stenbolê, Mîr Bedirxan tev zarok û neviyên xwe li dor xwe komkirine û ji wan re gotiye:

“... Ez ditirsim ku hûn di nav Tirkan de zimanê xwe ji bîr bikin û ku we ziman ji bîr kir, hûn ê welatê Botan û Kurdistanê ji bîr bikin. Tiştê ku min ji we divê; hûn di malên xwe de, bi zarok û zêçên xwe re, bi zimanê bav û kalan biaxifin, yê wa neke, ne kurê min e...”

Mîr Miqdad Midhet Bedirxan, xwediyê rojnameya Kurdî a dayik KURDISTAN, di sala 1889'an de digel birayê

xwe Emîn Alî, bavê Mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan, kar û barê xwe û serhildanekê kirin li herêma Tirabzonê, lê mixabin bi wan re neçûye serî.

Di baweriya min de, weşana rojnameya Kurdistan û banga wî di hejmara pêşîn de, 3'yemîn banga neteweyî Kurdî ye, piştî banga bavê netewa Kurdî Şêx Ehmedê Xanî (1651-1707), yê ku bang li Kurdish kiriye û gotiye:

*Ez mame di hikmeta Xwedê de,
Kurmanc di dewleta dinê de
Aya biçi wechî mane mehrûm,
bilcumle ji bo çi bûne mehkûm?
Ger dê hebiwa me itifaqek,
vêkra bikira me inqiyadek
Rûm û Ereb û Ecem temamî,
hemîyan ji me re dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
tehsîl dikir me ilim û hikmet
Temyîz dibûn ji hev meqalat,
mimtaz dibûn xweda kemalat...*

Her wiha helbestvanê Kurd yê neteweyî Hacî Qadirê Koyî (1815-1897) yê ku di 1815'an de, li Kurdistanâ Îraqê, bajarê Koyê çêbûye; li gelek bajarên Kurdistanê, bi dû xwendinê de geriyaye, xwendiye û melatî kiriye. Piştî salên 1850'yî ji Kurdistanê derketiye û çûye Stenbolê. Li Stenbolê pêwendiyên wî bi Kurdish re çêbûye. Bi taybetî bi malbata Mîr Bedirxan re. Mîr Bedirxan jî, ew wek mamoste ji bo zarokên xwe girtiye. Wiha Hacî Qadir bûye mamostê

zarokên Mîr Bedirxan û ew nêzikî pirsa Kurdî bûye. Di baweriya min de Hacî Qadir li mala Mîr Bedirxan bêtir serwextî pirsa Kurdî bûye û ji wan fêrî Kurdevariye bûye. Nexasim dema ku ew yekemîn car Mem û Zîn a Ehmedê Xanî li mala Mîr Emîn Alî Bedirxan dibîne, dixwîne û felsefeya Ehmedê Xanî nas dike. Û wiha di bin bandora zarokên Mîr Bedirxan û felsefeya Ehmedê Xanî de helbestên xwe yên neteweyî dihone. Werin em bi hev re nivîsa ku Mîr Miqdad Bedirxan li dor Hacî Qadir nivîsandiye û di rojnameya xwe Kurdistan, hejmara 2'yan de belav kiriye bixwînin:

*“Alimek ji Sora hebî sala dî wefat kir, rehmeta Xwedê lê be, Xwedê gunehêن wî bixefirîne. Navê wî Hacî Ebdulqadir bî, ev mirov saxiya xwe de gelekî xebitî derheqa elimandina ilim û me'rîsetê re, gelek bêt û eş'arêن Kurmancî dinivîsi, rîdikir welatê xwe Sora, ezmanê wî ezmanê Sora ye, lewma Kurd hemi vî ezmanî nizanin. Pişta kitêba Mem û Zînê de bi xetdest xwe hin bêt nivîsi ne, teberiken min ew bebyat li vê cerîdeyê de, pêde binivisin, wekî bi diqet bê xwendin, me'na wan xweş têt fehimkirin:
Zemane risim caranî nemawe,
çirax nazim û mişî kijawe
Le dor ême roman û cerîde,
eger çi meqsede zanîn bawe
Eman qedrî bizane em kitêbe,
le dunya estekî ey hemtayî nemawe
Le eyamî heyatî Şêxî Xanî,*

*le ser nusxe xet ew nusrawe
Le layî erbab xoy bo qedir û qîmet,
xezîneye gewhere û kîse diraw e
Le mecm'î duwel; Soran û Botan,
le saye em kitêbe nasirawe
Le Kurdan xeyrî Hacî û Şêxî Xanî,
esas nezmî Kurdî danenawe¹⁴*

Hem jî di helbestek xwe de aresteyî Kurdan wiha gotiye:

*Ta rêk nekewin qebilî Ekrad
Her wa dibine xerabe abad!
Enwa'î mîlel le gewre heta çûk
Xemîlîwe memalîkî wekû bûk
Yek berg in û yek zuban û yek reng
Bê xeybet û xeyb û 'ar û bê deng.*

Evdilqadirê Koyî gava temaşa dinyayê dikir û didît ku her tiştên dinyayê guhêrîne û ji xwendinê re awayîne nû çêbûne û bi tenê bi xwendina medreseyan, berê Kurdan naçe serî, dinalî û digot:

Le dewrî ême roman û cerîde'
Eger çî meqsede zimanî bawe
Hacî Qadirê Koyî di 1897'an de li Stenbolê miriye.
Gora wî di goristana Qerece-Ehmed de veşartiye.

¹⁴ Mir Miqdad Midhet Bedirxan, Kurdistan/hejmar (3), sala 1898, Qahîre

Di dawiya sala 1897'an de Mîr Miqdat Midhat
 Bedirxan ji ber nexweşiyê
 çûye Qahîreyê û li wir
 rojnameyek bi nave
 'Kurdistan' ji bo pêşketina
 Kurdan weşandiye.
 Kurdistan (1898)
 rojnameyeke 15 rojî bû.
 Mîr Miqdat Midhat
 Bedirxan her 5 hejmarên
 pêşîn derxistine û
 naveroka her 5 hejmaran
 bi nivîsên wî hatine
 xemilandin.



Mîr Miqdad Midhet Bedirxan

Mîr Miqdad ji her hejmarê 2000 nesxe, di rêka Şamê
 re dişandin Kurdistanê, bo şêx, mela û xwendevanan. Di
 pey re birayê wî Mîr Abdurehman Berdirxan weşana
 rojnameya Kurdistan berdewam kiriye, heta ku hejmarên
 wê bûne 31.

Li xwarê çend deqêن ku min ji gotarên ku di her çar
 hejmarên pêşîn de belav bûne, bijartine. Mîr Miqdad
 Midhet Bedirxan ev banga xwarê ya ewil di rojnameya xwe
 a bi navê Kurdistan, hejmara 1'ê, roja 22 Nîsana 1898'an de
 belav kiriye. Ew rojnameya ku wî di sirgûnê de, li welatê
 Misrê, li bajarê Qahîreyê weşandiye. Belê, ev banga wî, ji
 cerg û kezeba wî hatiye der. Wî ev banga xwe bi zimanê
 Kurmancî arasteyî Kurdan gotiye û ji dil û can, bang û

hawarî Kurdan kiriye; ‘bes e nezanî, bes e hejarî, bes e perîşanî û feqîrtî. Xwe fêrî ilim û zanînê bikin...’

“*Sed hezar şikir û hemid ji Xwedê te'ala re, em Misilman xeliq kirin û zanîna ilim û me'erîfetê re hiş û zeka da me. Derheqa e'limandina ilim û me'erîfetê re gelek ayetên celîle û ehadîs şerîfe henin, di dinyayê de çi qas Misilman hebin gund û bajarêñ hemiyan de mekteb û medrese û cerîde henin. Dinyayê de çi dibe çi nabe cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyî hiş û zeka ne, camêrin, di dînê xwe de rast û qewîn in. Xurtin û dîsa wek qewmîn dî ne xwendan e, ne dolmenden, dinyayê de çi dibe, cîranê wan Misqof çawa ye, wê çi bike nizanîn. Loma riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî, bi îzna Xwedê te'ala paş niho her pazdeh roja de carekê, ezê cerîdeyekê binivîsim. Navê wê min kiriye ‘KURDISTAN’ vê cerîdeyê pêde ezê behsa qenciya ilim û me'arîfeta bikim, li kûderê mirov die'lime, li kûderê medrese û mektebêñ qenc hene, ezê nîşa Kurda bikim. Li kûderê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, ticaret çilo dibe, ezê hemiya hekat bikim. Heta niho kesî cerîdeki holê ne nivîsiye, ev cerîdeya mina ha ya e'wilî ye, loma wê gelek kêmâyî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemi tişt wekî nû çêdibin kêm in, paşê hinekî diçe, dikeve rê de. Eve êdî ezî dest meqsedê bikim. (We mînellahî eltewfiq)*

* * *

Hezretî Pêxember eleyhî elselewat welselam gotiye; (El'ûlemaa wereset elenbiyaa), ango ûlemaa warisên enbiya ne, ji teref Xwedê de memûrin, weiz û nesîhetê bidin xelkê, riya qenc nişa wan bikin. Loma gelî ûlemayêñ Kurda çawa hûn weiz û nesîheta nimêjê didin, welê dive hûn mîr, axa û kurmancêñ dinasin, wan teşwîqa zanîna ilim û merîfetê bikin, riya qenc nişa wan bikin, hekî hûn wî nekin, gunehê hemiya li stûyê we ye.

Dîsa Hezretî Pêxember eleyhî elselam gotiye; ‘El îlmû îlman, îlmûl ebdanî we îlmûl edyan’ ango didone, yek jê îlmê bedena ye, yek jî îlmê dîn û îmanê ye, îlim bidne hekîmiyê ye.

Gelî mîr û axano! Heta niho kî ji we vî emrê Pêxember, kê ji we zarwên xwe, birayêñ xwe, mirovêñ xwe rê kirine, dane xwendin. Kê ji we gundê xwe de, bajêrê xwe de mektebek, medresek daye çekirin. Gelî ilemano! Hûn çire wan hedîsa ji mîr û axa re naxwînin, hûn çire cerîdeyêñ Erebî naxwînin da hûn bizanin di dinyayê de çi dibe.

Dîsa Hezretî Pêxember eleyhî elselam gotiye (Elkasib hebîb Ellah), ango mirovê kesb û karî bike, Xwedê teala hez wan dike. We mirovê nexwendaye, nizane cerîdeya bixwîne, ew mirovê cerîdeya nexwîne nizane li kûderê ticaret qenc dibe. Cerîdeyêñ niho têñ nivîsandin behsa hemi tişta dikin, mirovêñ wan bixwînin wê bizanibe make destê wî de li kûderê pera dike.

Van salên ha de li Stenbolê mektebek hatiye çekirin, nave vê mektebê (Mekteba Eşîra ye), xêr zaroyên eşîra, zaroyên kesî qebûl nakin. Ji Bexda û Şamî û Yemenê Şemer û Îniza hemi zaroyên xwe rê dikin Stenbolê, vê mekteba eşîra de dixwînin, her sal dû hêwa dicing malên xwe, paşê dîsa têñ şeş, heft sala de alimên qenc ji wan derdikevin, paşê dûyên dicing gund û bajêrên xwe, dewlet her heyv pera dide wan, dibin mamûr, hêdî hêdî dibin muteserif, dibin wali. Gelî mîr û axano! Gunehê zaroyên we, wê stûyê we be, hûn jî zaroyên xwe rêkin bidin xwendin, dewlimendên we bela gundan de mekteba çêkin, riya Xwedê de xêra bikin.

Dîsa Hezretî Nebî eleyhî elselam gotiye (Elherbû xid'eh), gelî mîr û axa û kurmancno! Dinya zane Kurd camêrin, lê vî zemanê hade, şer bi camêriyê tenê nabitin, top û tivingênci ecîb derketine, hewqa dûr dicing, cihê mirov dengê wan nebihîs gule û berikêñ wan dicing, mirov dikujin, cihêñ mirov jî wek teyra di xweyê berikêñ van tivinga de dice, dikuje. Ev top û tifingênci ha bê mekteb û medrese mirov nedikare çêke, nedikare biemlîne. Loma bê van top û tivinga cisûriya we wek mirovên dest girêdayî ne.

Li Mishefa Şerîf de emir biye (Cahîdû fî sebilullahî), Ango riya Xwedê de şerî bikin, dijminêñ dîn re cihadê bikin, dijminêñ dîne we ciranê we Misqof e. Heta niha Misqof gelek der debit kirine, Misilman Fille kirine, dor wê têt Kurdistanê, heke we jî xwend, elimîn tîcaren û sinîta, heke hûn dewlimend bibîn, hûnê bikaribin xwe ji

şerê wî xelas bikin, hekî we guhda van nesîhetên min, hekî disa hûn şivanî û rîncberî tenê bikin, zemanek hindike Kurdistan wê yek car xerab bibe. Cîranêñ we Ecem jî wek Kurda bî, vî zemanê paşê ewan jî qenc zanîn bê ilim û huner nabitin. Ecema gelek mekteb û medrese henin, ewladêñ xwe rê dikin welatêñ dûr, didin xwendin, niho ji begzadeyêñ Ecem sê çarek li Stenbolê li mekteba herbiyê de ne.

Gelî mîr û axano! Qenc fekrin dora xwe, hûn hingê di çi seqîrî û kêm dibin, sebeb cahiliya we ye. Elhemidulillah gelek mekteb û medrese henin, riya Xwedê de zaroyêñ xwe rîkin, bidin xwendin, ji vê cahiliyê xelas bibin, dinya û axreta xwe meemûr bikin. Xelk dibêjin; Hekî Kurd bixwînin wê ji alemê xurtir û dewlimendtir bibin.

Dîsa Hezretî Nebî eleyhîelsalam gotiye: (Etlîbû elûlme welew bil Sîn), ango ilim Çinê bitin, herin wêderê bixwazin bielimin. Gelî mîr û axano! Ez ji we dipirsim kê ji we heta niho mirovек xwe rê kiriye kûderê da bixûnit. Elhemdûllah Bexdadê, Şamê, Stenbolê mekteb û medreseyêñ hikûmetê hene, bê mesref in, heçî ji we zaroyêñ xwe teslîmî hikûmetê biket, bê mesref wî rîkin bidin xwendin.

Berî du sê sala dewleta Çin û Japonyayê şer kirin, eskerê Çinê deh cara ji eskerê Japonyayê zêdetir bî, hemî şera de ji Japonyayê karî eskerê Çinê. Werin vê care sebeba vî halî bipirsin; mirovên Çinê cahilin, mirovên Çinê tiştekî nizanin, mirovên Çinê nizanin top û tivingêñ vî zemanî

biemilînin, eskerê Japonyayê top û tivingên xwe, ew xwe çêdikin, hemi di ware tîcaretê kesib û karî dikin, loma dewlimendin, seba dewlimendiya xwe sîlahêن kemji ewqas derêن dûr kirîn û xweş xweş şerêن xwe kirin û karîn dijminêن xwe, niho hemi malêن xwe rahetin, kes nikare xwe bide ser wan.

Ez gelek dera geriya me, niho jî li Misrê me. Hemî dera zaroyêن Çerkez û Ernaût û Ereb dibînim, babêن wan, birayêن wan rêdikin mektaba, didin xwendin. Li Misrê camîea Ezher de rastî hin Kurdêن Sora hatim, hin ji Kerkûkê ne, hin ji Silêmaniyê ne hemi dixwînin. Ez tû cara lit û dera rastî mirovên Bota, Xerza, Şêrwan, Hekariyan ne hatime, ez tû mekteba rastî mirovên eşîretêن Kurda ne hatime, ez çi qasî rastî mirovên van eşîra têm, hemi jî rêncberin, jar û reben in, sineetekî, hunerekî nizanin.

Berî şeş heywa ez nesax bîm, loma vê zivistanê ez hatim Misrê. Misir biye bajarek hewqas mezin û xweş, heta mirov nebîne mirov nikare bo wesfa wê bizanibe. Ez hêdî hêdî ketim nîv Misriya de, elimîm hal û sine'etên wan kesib û kara wan. Ev xelkên Misrî mirovên bê ziravin, ne c..in, lê gelekî dişixulin, nawestin, li kûderê mekteb û medresek qenc hebit, nabêjin dûr û nêzike, zaroyêن xwe rê dikin, didin xwendin, dielmînin sineta, dielmînin hemî tişta, niha nîva Misrê de, ji xelkê Misrî hewqas xwenda û alim hene, hewqas mirovên xweş sinet û huner hene. Gelek me'reziyê bajêr ew xwe çêdikin. Nîv Misriya de mirov hene top û tivinga

çêdikin, mirov hene xaniyên pênc mezel ava dîkin. Nîv wanê xweyî sine'ta de mirov henin rojê pêncî bîst çerxiyan distînin, mal û xaniya hemiya xwes in, hemi xwedî xadim û xulam in û nîv wan de xwendayê mezin jî hene lê hindikin.

Gelî mîr û axayên Kurmanca! Ez ji we dipirsim, ji xelkê çi kêmaya we heye! Kurd ji Misriya camêrtirin, hiş û eqilê wan zêdetire, hemi şixlîda Kurd ji Misriya qenctirin. De vêca çire xeklê Misrî wê ji Kurda dewlimendtir bin. Li Misrê hin Kurmanc hene bihîstine ku ez hatime Misrê, hemi jî hatine ziyareta min, min hale hemiya pirsî, hemi jî dergevanî û xulamiya Misriya dîkin, hemi jî bin mineta wan de ne, hina jî bê edebî kirine ji cih xwe derxistine, jar û reben bîne, hekî xwenda bîna, hekî dest wan de jî hunerek, sinetek hebiya holê jar û reben nedibîn, heyfa min têt ji dergevaniyê, xulamiyê pêve kér tiştekî nayên.

Gelî ilema û mîr û axayên Kurda! Hûn hemi esil û nesilê min dizanin(?) eşîra me Botan in, şihretra nesla me Azîzan in, ez di riya Xwedê de dixebeitim, min ev cerîde çekir, di vê riyê de, ez gelek pera serif dikim, zehmetiyê dikşînim, meqseda min qenciyâ Kurda ye, hûn jî ji xêra Xwedê re dest hilînin, Kurda bidin xwendin, zaroyên xwe bielimînin ilim û edebê, bielimînin sineta, mirovên Misilman dive xwenda bin, dive bielimin dine xwe. Gelî ilemayên Kurd! Hûn çire cameeta behsa xerabiya cahiliyê û qenciyâ ilmî nakin.

Xwedê Teala û Pêxember (Eleyhî elselam), behsa ilim û cihlê çi emir kirine, hûn dizanin, vana hemiya ji Kurda re weiz bikin. Elhemdûllahî teala eve ya dikeve bara min, ez dikim. Îdî ji ilemayêñ Kurda hêvî dikim vê cerîdeya min ji mîr, axa û Kurmanca re bixwînin. Derheqa elimandina ilmî de, Xwedê Teala û Hezret Pêxember (Eleyhî elselam), çi emir kiriye, wê bikin eqlê wan de. Ji mîr û axayêñ Kurda hêvî dikim zaroyêñ xwe heta bibin deh diwazdeh salî, di gund û bajarêñ xwe de bidin xwendin, bielimînin Mishefa Şerîf û xwendina cerîdeya, paşê rêkin mekteb û medresyêñ Stenbole, Şamê, Bexdê. Da Xwedê ji hemiya razî be, da hûn ji şerê dijminê xwe emîn bin. Xwedê qencyîê bide milleta Islamê.”¹⁵

Di hejmara 2'yan de jî wiha nivîsandiye:

“Gelî mîr axa û paşano! Ez ji we dipirsim, kê ji we heta niho ji wetenê xwe re çi kiriye, da em bizanin hun hez wetenê xwe dikan, hezkirina weten ewe ku mirov nehêle dijminê mirov bikeve nîv wetenê mirov de. Hezkirina weten ewe ku mirov wetenê xwe ava bike, mektesba, medresa û xêrata çêke, hezkirina weten ewe ku mirov zaroyêñ wetenê xwe bide xwendin, bide e'limandin û sin'et û me'erifeta...”¹⁶

Her wiha di hejmara 3'yan de wiha gotiye:

¹⁵ Mîr Miqdad Midhet Bedirxan, Rojnameya Kurdistan/ hejmar 1, rûpelên 1/2/3, sala 1898, Qahîre

¹⁶ Rojnameya Kurdistan/1898, hejmar 2, rûpel 1, Qahîre

“Gelî Kurdino! Hun jî dest hilênin, bie'limin ilim û hunera da Xwedê Te'ala û resûl Ellah eleyihî ellselam ji we razî be, da hun bikaribin, dîn û namûsa xwe ji şerê dijmina hefiz bikin, da hun jî bikaribin wetenêñ xwede rûnin, da hun jî ji vê rênçberiyê xelas bibin. Ez gelek reda Kurda dibînim hemi jî rênçberin, jarin. Gelek ji wan, ji rebeniyê, ji feqîriyê, ji xerîbiyê ditelisin. Yek xweyî ilim û huner dikare pencsed mirova re şixila bibîne, loma hekî çendek ji mîr û axayêñ Kurda elimîn huner û ilmî, wê hingê Kurd wê wetenê xwe de, ji xwe re şixula bibînin, wê ne mihtac bin, biçin ji derve zar û reben bin, rênçberiyê bikin...”¹⁷

Mixabin ku di sala 1906'an de piştî kuştina Ridvan Paşa, Mir Miqdad Midhet Bedirxan sirgûnê Mekkeyê bûye û êdî tu pêzanîn li dor nîn in.

Ji aliyê din ve:

Mîr Celadet Bedirxan bû yê ku di sala 1927'an de kongreya Xoybûnê li Beyrûdê li dar xist û tev rêexistin û komeleyên Kurdan ji Qahîre, Bexdad, Şam, Parîs û Stenbolê lê kom kirin.

Mîr Celadet Bedirxan û neferên malbata xwe bûn yên ku di sala 20'an de Şerîf Paşa wek nûnerê Kurdan şandin Peymana Sewrê û bi rêka wan ew ew çend bend ji Kurdan re hatin diyarkirin.

¹⁷ Rojnameya Kurdistan/ 1898, hejmar 3, rûpel 2, Qahîre

Mîr Celadet Bedirxan û neferên malbata xwe bûn yên
ku aloziyêن di nav Kurd û Ermenan de hebûn di Peymana
Sewr û şoreşa Araratê de çareser kirin.

Mîr Celadet Bedirxan bû yê ku di 15 Gulân 1932
kovara xwe HAWAR ya bi nav û deng di esmanê kovar û
rojnameyêن Kurdan de weşand, kovara wî di wî heyamî de
ji piraniya kovarêن ko li Şamê dihatin weşandin bedewtir û
spehîtit bû û yekem car bû ku di dîroka Kurdan de zimanê
Kurdî bi tîpêن Latînî hat bikaranîn û Kurdêن her çar
parçeyêن Kurdistanê beşdarî di nivîsandina wê de kirin, çi
Kurmanc û çi Soran.

Roja îro gelek kovar û rojname li herçar parçeyêن
Kurdistanê bi wê alfâbêyê têne weşandin, mîna kovara
“Dicle” û “Gulan” li Duhok û Erbilê û kovara “Sormancî” û
rojnameya “Bedirxan” li Silêmaniye. Hem jî gelek sazî û
navend bi navê Bedirxaniyan ji rex dilsoz û wefadareñ
Kurdêن resen ve hatine avakirin wek: Pirtûkxaneya
Bedirxaniyan li Duhokê û malpera Bedirxaniyan li ser
internêtê û danîna wêneyê Mîr Celadet li ser qapa gelek
kovar û rojnameyan wek sembol.

Eger mirov bi tevayî li dîroka malbata Bedirxaniyan
vegere û berpêl bike, wê bê dîtin ku hemû Bedirxanî di
sirgûn û zîvariyan de hatine kuştin û mirin û ev yek bi tena
xwe xwes dîdevane ji dilsozî û wefadariya wan re, ji gelê
Kurd re. Ligel vê bi saya Mîr Bedirxanê Botî, kur û neviyêن
wî, roja îro em xwe payebilind di nav netewêن cîhanê de
dibînin. Bi saya Mîr Bedirxan yekemîn serhildana Kurdî a
neteweýî dest pê kiriye, bi saya kurê wî Miqdad Midhet

Bedirxan bingeha rojnamevaniya Kurdî hatiye danîn û bi
saya neviyê wî Mîr Celadet Alî Bedirxan zimanê Kurdî
bûye xwedî alfabetek xweser, ku roja îro piraniya Kurdan
bi alfabeşa wî dixwînin û dinîvisînin. Ev yek dihêle ku em
navê wan bi tîpêz zêrîn di dîroka gelê Kurd de binivîsinin.
Sed rehmet li giyanê tev neferên malbata Bedirxaniyan
bibare, bihuşt cih û warê wan be.

MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN (1893–1951)

Gelên xelkê xwe bi mirovêن xwe yên şareza, zane û mîrxas pesn û paye dikin, ew ên ku gelên wan sûdeyek ji wan dîtibe, çi di warê hilgirtina tivingê de be û çi di warê hilgirtina pêñûs û xamê de be. Lê gelê Kurd di vî warî de jî, wekî tev waran, paşketî maye. Diyar e ku sedemên vê yekê jî pir in, wek tev paşketinêن gelê Kurd. Qey ev jî Qedera me Kurdan e ?!

Bêhtir ji "10" navendêن kulturî û çandî yên Kurdan di van her "10-15" salêن dawî de hatine damezirandin, çi li welat û çi li derveyî welat (li sirgûnê). Û bêtirî "20-30" kovar û rojnameyêن Kurdî bi tîpêن Latînî têne weşandin. Ew tîpêن ku Mîr Celadet Bedirxan ji zimanê Kurdî re bijartine, piştî xebateke dûr û dirêj, ku 13 salan pê re dom kir. Mîr Celadet Bedirxan li ser rê û şopa apê xwe Mîr Miqdad Midhet Bedirxan diliviya, hawar û gaziya wî ji ya apê wî bû. Gereke ku ev navendêن çandî, kovar û rojnameyêن Kurdî, li ser jiyan û ramanêن vî kesî rawestin, nav û nîşanêن wî di nav gelê wî de belav bikin, da ku gelê wî ji nêzik ve wî nas bike, serwextî xebat û berhemêن wî bibe, nave wî ji tariya salan bê deranîn ronahiya rojêن îro.

Tiştékî girîng heye, pir bîr û baweriya min pê tê, ew jî ev e; yê ku li kevnê xwe nepirse, lê neguhdar be û neparêze, zor e ku karibe di pêşerojan de, tiştékî durist û aktîv ji gelê xwe re pêşkêş bike. Vêca gereke em guhdariyê li vê yekê

bikin, li wan mirovêن xwe yên kevnar miqate bin û gelê xwe serwextî jiyan û xebata wan bikin. Fermo bi kurtbirî jiyan û xebata zimanzan, rojnamevan, helbestvan û siyasetmedar Mir Celadet Bedirxan seh bikin.



1914, *Emin Eli Bedirxan*
(Bavê Sureya, Celadet Eli û Kamiran)



Der dora 1900'î. *Waliyê Quddûsê yê Kurd Osman Paşayê Bedirxanî*.¹⁸

Tevî ku mirê dûmahiya welatê Botan, Mir Bedirxanê Azîzî, di sirgûnê de li Şamê çûbû ber rehma Xwedê, lê sultanê Osmanî rê neda kurên wî bi vegera warê bav û kalan "Cizîra Botan", piraniya wan kirin hakim, walî û paşa, lê li dervî welatê wan, da ku ji şer û bela wan xelas be...

¹⁸ <http://ibrahimhalilbaran.tumblr.com/>

Hingê Emîn Alî, bavê Mîr Celadet kurek ji wan kuran bû, para wî bû hakimê cezayê li Stanbolê. Di wê hinge de,



Xwedê kurek dayê, nave wî kir Celadet, ango sebr û saman. Ji ber ku pir bi hêvî bû ku wê tengayî xelas bibin û rojekê li welatê xwe Botan vegerin. Vêca sebr û saman dikişand lê mixabin, ew hêviyên wî pêre çûne gorê, li cihekî dûrî welatî wî bi gelekî, li Misrê bajarê Qahîre, di sala 1926'an de.

Biçûkaniya Mir Celadet Bedirxan

Lê kurê wi Celadet ew hêviyên bavê xwe û bapîrê xwe, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî heta roja dawîn ji temenê xwe. Mîr Celadet bi welatparêzên Kurdan re, bi bay, ap, pismam û birayêن xwe re komeleyêن Kurdî yên pêşîn di Stenbolê de ava û saz kirin. Di sala 1914'an de, di eniya Qefqasê de, beşdarî di Şerê Cîhanî yê Yekemîn de kir, heta ku giha Tebrîz û Bako...

Di sala 1919'an de, ew û birayê xwe Dr. Kamîran, Ekremê Cemîl Paşa û Fayiq Tewfiq ji Silêmaniyê digel E.

W. Noel yê Îngilîz, li Kurdistana Bakur geriyan, da ku daxwazên gelê Kurd nas bikin berî ku Peymana Sewrê bê mohrkirin di navbera Hevalbendan û Dewleta Osmanî de.

Di sala 1922'yan de Mistefa Kemal Paşa fermanek deranî bi kuştin û sîrgûnkirina malbata Bedirxaniyan, vêca ji neçarî Tirkîye li şûn xwe hiştin û bi şar û welatên dînyê ketin, heta ku ew û birayên xwe li Elmanya bi cî û war bûn. Bavê wî Emîn Alî Bedirxan û birayê wî yê mezin (Sureya Bedirxan: Dr Bileç Şérko) reviyan Misrê, bajare Qahireyê. Hingê Mîr Celadet li Elmanyayê xwendina xwe di awukatiyê de bir serî û dest bi xwendina doktorayê kir. Lê dema ku seh kir şoreşa Şêx Saîdê Pîranî dest pê kiriye, di derhal de xwendina xwe li rexekî hişt û xwe bi şoresê ve gihad. Mixabin ew şores ne di çax û demê xwe de dest pê kiribû û dawî bi hovitî hat perçiqandin. Mîr Celadet jî, polîpoşman careke din zivirî Elmanyayê.

Di sala 1927'an de Mîr Celadet û Memdûh Selim Beg Wanlî, bi alîkariya Ermeniyan, komela "Xoybûn" li Libnanê damezirandin. Bi besdarbûna gelek welatparêz û serokên eşîrên mezin di Kurdistanê de.

Di sala (1929-1930) de xwe amade kirin ji 'Şoreşa Agirî' re, ku ji sînorê Sûriyê êrîşî Tirkan bikin û biavêjin ser Mêrdinê, Midyadê, Ûrfa û Cizîrê. Da ku akama artêşa Tirkan ji ser şoreşvanên Agirî sivik bibe. Lê sed mixabin wek ku Mîr Celadet û hevalên xwe dixwestin bi wan re neçû serî. Ji ber ku hingê axa û begên Binxetê xwe bi xwe ji hev nerazî bûn û şerê hev dikirin. Vêca Mîr Celadet ji

neçarı xwe bi şoreşa Agirî ve gihad, da ku di şer de li kêleka Îhsan Nûrî Paşa û Îbrahîm Hesko Têlî be...

Lê sed heyf û mixabin, ew şoreş jî bi destê Tirkan, bi tundî hat qurmiçandin. Serokên wê jî, ji neçarı xwe li Îranê girtin û Mîr Celadet Bedirxan jî digel wan.

Li Tehranê, Mîr Celadet bi şah Riza Pehlewî re rûnişt û doza alîkariya Kurdan lê kir, lê şah Riza xwe neda ber tu tiştî. Tiştî ku xwe da ber, ku Mîr Celadet bi ya wî bike û bibe şalyarekî bi kêfa xwe li dewleteke Ewrûpî. Lê Mîr Celadet bi vê tevdîra Riza Pehlewî razî nebû, vêca Pehlewî ew bi darê zorê ji tixûbên Îranê deranî û berê wî da Iraqê.

Di wî çaxî de li Iraqê, hikumeta Îngilîzî şerê Kurdan dikir, dema Îngilizan seh kir ku Mîr Celadet li Bexdayê ye, ketin hev û rêtengî jê re çêkirin, da ku ji Iraqê derkeve. Ji ber ku Mîr Celadet Bedirxan di hingê de wek sembolekê bû ji netewiya Kurd re. Û dawî ji neçarı Mîr Celadet ji Iraqê derket û careke din xwe li Sûriyê girt.

Piştî herifandina şoreşa Araratê di salên 1930'î de, piraniya serkêşen şoreşê û endamên Komela Xoybûnê xwe li nav Kurdên Sûriyê girtin.

Li ser daxwaza Kemalîstan, hikûmeta Fransî ya ku di Sûriyê de desthilat bû, piraniya wan lehengên şoreşê û lebatêن Komela Xoybûnê ji ber sînorê Tirkiyê bi dûr xistin, ew li Şamê civandin, da ku dûrî tixubên Tirkiyê bin. Hingê Mîr Celadet Bedirxan yek ji wan bû, hikûmeta Firansî ya ku desthilat bû dest danin ser û ew şandin Şamê da ku di bin rûniştina zorê de be. Wiha Mîr jî ket bin rûniştina zorê

li Şamê, digel gelekan ji welatparêzên Kurdan û serokên êl û malbatên mezin yên sirgûnkirî.

Di sala 1931'ê de Mîr Celadet bi serokên êl û eşîrên Kurdan re, bi şêx, mele û welatparêzan re komelak damezirandin bi navê *Civata Alikariyê ji Bona Kurdên Belengaz li Cizîrê*. Nemaze ji bona wan Kurdên ku ji Tirkiyeyê müşextî û sirgûnî Binxetê bûbûn û piraniya wan tazî û birçî bûn. Vêca ji bo alikariya wan, ev civat hatibû avakirin û gelek malik li şar û gundên Binxetê hatibûn vekirin. Hingê serokê civatê li bajarê Şamê Dr. Ehmed Nafiz Zaza bû û li bajarê Hesekê Hesenê Haco bû. Ji ber gelek sedeman ew civat jî pûç derket û Mîr bêhêvî bû. Mîr, rabû rêke nû da ber xwe, xwest bi pênuşa xwe azadiya zimanê xwe bilind bike û bi tena xwe kovareke bi zimanê Kurdî tîpêن Latinî di nav Kurdan de biweşîne, bi wê Alfabêya Latinî ya ku ji sala 1919'an de pê mijûl bibû. Wiha di roja 15.05.1932'yan de hejmara pêşîn ji kovara xwe 'HAWAR' li Şamê çap kir, di nav Kurd û biyaniyan de belav kir.

Mîr Celadet 13 salan di berhevkirina Alfabeya Kurdî Latinî de xebat kiriye, heyâ ku kovara Hawar derxistiye. Di hijmara 13'yan de Mîr Celadet wiha behsa xebata Elfabeya Kurdî ya bi tîpêن Latinî dike:

"...Ev elfabêya hanê ko îro em zimanê xwe pê dinivîsin paşıya xebateke salanên dirêje. Di sala 1919 an de, me dabû çiyayê Meletiyê. Em ketibûn nav eşîra Reşwan. Mêcer Nowel (İngilîzek) jî di gel me bû. Mêcer zarê

nîvro dizanibû, dixebeitî ko hînî zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsand. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin. Carinan, me li nivîsên xwe çavêن xwe digernandin, dixwend û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi lêvkirineke biyanî, lê bê dijwarî destnvîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (Û,و) ji (O,و) û (I,و) ji (E û و) b. p derdixistin, diketim ber hezar dijwari. Ma çiman? Ji ber ko Mêcer bi herfîn Latînî, lê min bi herfîn Erebî dinivîsandin. Ser vê yekê di cih de, min qerara xwe da û ji xwe re bi herfîn Latînî elfabêyek lêkanî. Ëdî min bikariya destnvîsa xwe paş hezar salî jî, bê dijwarî û wekî xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê dihate sekinandin.

Lewra ko di elfabêya Latînî de, tenê 26 herfîn serbixwe hene û di zimanê Kurdî de deng ji 26 an bêtirin, gelek herfîn hevdudanî ketibûn nav elfabêya min weko: ch, ou, aî. Ji xwe di zarotiya xwe de, wekê min di dibistanan de dixwend û hînî herfîn Erebî û Latînî dibûm, tiştak hebû ko min di çavê xwe re dikir û ji bona herfîn Erebî, di dilê xwe de digot: Ev elfabêyek welê ye ko dengin dide xwendin ko nayêñ nivîsandin, û latînî yek car vajî wê ye, herfin dide nivîsandin ko nayêñ xwendin. Belê fikra min dibabeta van her dû elfebêyan de ev bû. Bawer bike bi vê fikra ko min ji zarotiya xwe ve di serê xwe de bixwedî dikir, kêfa min ji herfîn hevedudanî re nedihat. Hingî ji zimanêñ ko bi herfîn Erebî nayêne nivîsandin min Yûnanî, hinekî Fransîzî û elfabêya Rûsî nas dikirin. Hema di ciyê de, rabûm herçî herfîn hevedudanî ji

elfabêya xwe derêxistin û li şûna wan ji elfabêya Yûnanî û Rûsî herfên derxwe êxistin. Bi vî awayî min elfabêyek bi sîh û şes herfên serbixwe existî bû dest xwe.

Wekê em vege riyan hatin Stenbolê, bi vê elfabêyê min kitêbeke elfabêyê û ferhengeke kiçik nivîsand û ji bona çapê karkirî bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng iro di destê min de ne. Di sala 1925'an de, di gel hin nivîsen min ên din gîhiştine pêşberê Mehkema Xarpûtê.

Di sala 1924'a de, li Elmanyayê min careke din çavê xwe li elfabêya xwe gerand, hûr lê meze kir û mideke xweş li ser xebitîm. Min bala xwe dida û didît ko ev sê texlît herf qenc li hev ne dihatin, herfên Yûnanî û Rûsî yekrengiya elfabêyê xerab dikirin. Jê pêve dû herif hebûn ko ji me re ne gerek bûn. Ji lewra min elfabêya xwe ji nû ve senifand: Herfên zêde jê avêtin, hin herfên Latînî bilindek li wan bar kirin û di şûna herfên Yûnanî û Rûsî de êxistin. Bi vî awayî elfabêyeke bi sîh û çar herfan û yek reng hate pê. Ez paşê bi elfabêya xwe mijûl bûm. Lê hetanî ku Tirk elfabêya xwe belav kirin ya me wekî xwe dima û tê de me tiştek bingehî ne guhert. Min her tiştên xwe pê dinivîsandin û ji nasên xwe re dida zanîn.

Wekê Tirk elfabêya xwe belav kirin, me dît ko di dengên hin herfan de elfabêyên me ne mîna hevin. Dengin hebûnko Tirkan ne bi wan herfên ko me nişan kirine lê bi herfinen din nişan kirî bûn.

Her wekî me berê jî çend caran gotî bû, ji bona hêsanî kirina xwendina nivîsarên me, ji Kurdmancêن Tirkiyê re, me dengên hin herfan bi hev guhertin û her çend hebû me ew çend elfabêya xwe xist nîzingî elfabêya Tirkan.

Ji gotinêñ jorîn qenc xuya dibe ko elfabêya me paşıya xebateke sêzdeh salîn e, gora zimanê Kurdî, gora dengên zimanê me ye. Herê ev elfabê berî sêzdeh salan hatîye nivîsandin û gora zimêñ û dengên wî hin bi hin edilî û ket halê xwe ê îro.

Berî û piştî belavkirina elfabê min fîkrêñ gelek kesan pîrsîn û gotinêñ hinekan bi kêrî min hatin. Di nav wan de mirovinen yekcar nexwenda jî hebûn.

Ji lewra ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir ji keda miletê xwe dihesibînim û pêşkêşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê her kesî hejatir û spehîtitir e.”¹⁹

Awayê xebatê:

Karekî ko bikare biçe serî, divêt jê re pironivîsek bêt çêkirin, me pironivîsa xwe li ser bingehêñ jêrîn lêkirî ye.

1 - Belavkirina Alfabêya Kurdî di nav Kurdan û hînkirina wê. Senifandina zimanê Kurdî û hin bi hin di komelê de belavkirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêexistin.

¹⁹ Hawar, hejmara 13 / 1932 Şam

2 - Sehîtiya zarêن Kurdî û berhevdanîna wan. Sehîti ser mirovatiya zimanê Kurdî digel zimanên din ên Arî. Sehîti ser bingehêن zimanê Kurdî, ser dîrok û awayê rabûna û pêşveketina wî.

3 - Berhevkirina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranêن Kurdî û birêve belavkirina wan.

4 - Senifandin û belavkirina dîwanêن Kurdî. Bi van ve jînenîgariyêن şâîr û mirovêن bijarte jî dê bêî belavkirin.

5 - Sehîti ser reqs û qeydeyêن stranêن Kurdî.

6 - Sehîti ser her texlît rêzikêن Kurdî û Kurdistanê, yên zemanê borî û yên iro û senifandina wan û sehîti ser piş û sinhetêن Kurdî.

7 - Dîrok û erdnîgarî: Sehîti ser tevayiya dîrok û erdnîgariya Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî, paşî û di wextê Mîr Şeref de.

Awayê nivîsandinê:

Di heqê zimanê me de heta niho gelek tişt hatine gotin, di nav van gotinan de tiştne rast û nerast jî hene. Ez ko Kurd û Kurdmanc ziman im û zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zimanên din daniye ber hev, kîtkîten wî hûrhûnadine; qeydeyêن wî ji hev derxistine, dikarim ji biyaniyan bêhtir û qenctir dehkera wî bidim xuyakirin û zanîn.

Zimanê me iro hem freh hem teng e. Freh e: Bi her tiştê ko Kurd pê mijûl bûne, dest dane ser wan, di wî warî de

zimanê Kurdî hin zimanên din û ji hinan bêtir pêşve çûye, kemiliye û ji tu zimanan kemilî bi şûn de nemaye. Teng e: Herçî ku ji Kurdan re nenas mane û Kurd pê mijûl nebûne, di wî warî de zimanê me rawestiyaye, pêş ve neçûye, di cihê xwe de maye.

Lê zimanê ji wan zimanan e ko ber her tiştê nuh, pirsên nuh dizên û bi rêve pirsên nuh ji wan çar dibin. Herwekî xelkê Gelyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin; ji lewre ko ji banî, ji bala difire, dîsa Kurdmancine ko telêfon dîtin ji mesmeha wê re bihîstok gotin. Jiber ko deng pê têt bihîstin.

Niho em vejerin ser gotina xwe; ser awayê nivîsandina zimanê xwe. Îro di zimanê me de du texlît kêmânî hene: Windabûna pirsine Kurdî û ketina pirsine biyanî nav zimên. Em çi bikin ko zimanê me bikare vegere ser xurtiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de bikemile û bibe zimanekî tekûz.

Di windabûna pirsan de, pirsin hene yekcar winda bûne, hin hene ji zarekî ketine lê di zarekî din de dijîn û çendek hene di axaftinê de kêm têne gotin lê di mamik, medhelok, çîrok û stranan de têne bihîstin. Em li pey wan in, hin bi hin em wan diêxin dest û disenifînin û gora mehçetê jî ji nuh ve ser awayê hevdûdanîna pirsên Kurdî pirsine nuh çedikin, ji bona pêşveçûna zimên. Divêt em bendên xwe bi tevayıya van pirsan binivîsinin û li paşıya her hijmarê ferhengokekê danîn û tê de mana

pirsên ko di zaran de kêm bûne û yên ko ji nuh ve hatine hevdûdanîn ji xwendevanê xwe re bidin zanîn.

Ji xwendevanê xwe hêvî dikim ferhengoka me qenc bixwînin û di heqê pirsekê de ko fikreke wan hebe ji me re binivîsînin; heke ciyoka pirsekê bizanîn, ewa ha jî tev mana û ferqên wê digel ciyoka xwe ji me re bidin zanîn.

Weko: rêkirin, şandin, hinartin, ciyokêن hev in, lê di mana rêkirinê de ji mana şandin û hinartinê ferqek heye. Rêkirin, herhal, bi rê êxistin û şandin e. Dîsan, xeberdan, axaftin, peyîvîn ciyokêن hev in gelo di neqeба wan de çi ferq hene?

Hawar zarokeke nûza ye. Zarowa me ye; zarowa Kurdan e. Wek her zaro bi xweyîtiya dê û bav, bira û pismamêن xwe dikare bijî. Her kes her Kurd dikare arîkariya Hawarê bike. Tu kes mebêje ko ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Ji min diayê pêve tiştek nayê. Belê, tukes vê xeberê mebêje, herkes bi tiştekî, bi awakî dikare bê hawara Hawarê. Tinê dibe ko awayê Hawarê nizane, jê re çend awa hene:

- 1 - Kiriyarê Hawarê bûyîn û jê re kiriyaran peydakirin.
- 2 - Navêن mirovêن xwendewar lê ne maldar, ko nikarin kiriyar bibin û navêن medresan ji me re dan zanîn. Da ko Hawar herwe bête şandin.
- 3 - Paş xwendina Hawarê ji heval û nasêن xwe re danxwendin û ji mirovêن nexwenda re bi xwe xwendin û ew ser têdexistiyêن komelê serwextkirin.

4 - *Ji Hawarê re her texlît şîhr û bendan nivîsandin.*

5 - *Çîrok, medhlok û mamikan berhevkirin û ji Hawarê re şandin.*

6 - *Di heqê welat, eşîr, bajar û gundên xwe de tiştine kevin û nuh ji Hawarê re rîkirin.*

7 - *Her texlît bergehêن Kurdistanê peyda kirin û digel wesfîn wan ji me re hinartin. Ji gotinêن jorîn qenc dixuye ko ji Hawarê re arikirin gelek hêsanî ye. Kesê ko dil bike dê bikare ji. (Hawar-hejmar 1)*

Digel kovara "Hawar"ê re, di roja 1/4/1942'yan de li Şamê, Mîr Celadet kovareke din bi navê "Ronahî" xwerû bi Kurdiya Latînî çap û belav kir. 28 hejmar ji vê kovarê hatine çapkirin û belavkirin.

Mîr Celadet bi bêtîrî "15" navan di van her du kovarêن xwe de dinivîsand. Ji ber ku kesên nivîskar kêm bûn û ne dixwest ku biyanî zanibin ew tenê, yan ew birayê xwe (Dr. Kamîran) tev babetê van kovaran dinivîsinin. Mîr Celadet bi van zimanan dizanî: Tirkî – Îngilîzî – Fransî – Farisî – Rûsî – Yewnanî – Elmanî - Erebî. Ji bilî ku zimanê Kurdî zimanê dê û bavê wî bû, zimanê axaftina mala wî bû.

Di pey re Mîr Celadet nav di gelek kesan de dida, ew dehf didan ber bi nivîsandina zimanê Kurdî de. Di roja îro de gelekan ji wan nav û deng dane, wek: Cegerxwîn (Mele Şêxmûs), Osman Sebrî, Qedrî Can, Mistefa Ehmed Botî, Hesen Hişyar... Hingê jî, gelek kesên bi nav û deng di kovarên wî de nivîsandine wek: Goran, Bêkes –Îhsan Nûrî Paşa, Evdulrehmanê Eliyê Ünis, Mele Ehmed Namî hwd.

Mîr Celadet di ber her du kovarêن xwe re pirtûkxaneyek vekir bi navê "Pirtûkxaneya Hawarê" û 20 pirtûk çap kirin, dîwana Cegerxwîn a yekemîn: "Birîsk û Pêt" yek ji wan e. Hem jî Mîr Celadet pêşgotin ji vê dîwana Cegerxwîn re nivîsandiye.

Di sala 1935'an de Mîr Celadet zewiciye, diyar e ku kebaniya wî keçmama wî Rewşen Xanim Bedirxan e. Ji zewaca wan kur û keçek li wan zêde bûye, kur nave wî Cemşîd e, keç nave wê Sînemxan e.

Piştî ku Fransızî ji Suriyê celî bûne di sala 1946'an de, ev rêkên rojnamevanî li ber Mîr Celadet hatin girtin, zimanê Kurdî qedexe bûye û hin bi hin rewşa Mîr Celadet ya aborî ji berê xerabtir bûye.

Di sala 1947'an de, li ser daxwaza Kurdêن Cizîrê, Mîr Celadet hatiye hilbijartîn ku bibe Nûnerê Kurdêن Cizîrê di perlemantoya Sûriyê de; belê 24 demjimêr di ser wê hilbijartînê re derbas nebûyî hikûmeta Erebî di Sûriyê de destê xwe danîn ser û careke din ew kirin bin rûniştina zorê li Şamê û diviyabû her hefte du rojan xwe şanî waliyê Şamê bide.

Di sala 1949'an de, rewşa wî ya aborî roj bi roj lawaz û kêmtiler dibû, dost û hevalên wî hin bi hin dûrî wî diketin, erê hin ji hevalên wî yên maldar û zengîn alîkariya xwe jê re pêşkêş dikirin, lê wî alîkariya kesekî qebûl nedikir.

Di sala 1950'yî de, ji neçarî razî bû ku bi hevalê xwe yê neçîrê (Hisêن Beg Îbiş) û (Malbata Xetab) re pembo biçîne li gundê Hecanê nêzikî Şamê bi nêvî, ji wî pemboyî re bîrek

kola û ji gundê Hecanê qut nebû, karê wî mabû çavnêriya karkerên avdana pembo, da ku bi hevalên xwe re rû sipî derkeve.

Li ser wê bîrê gelek caran di rewşa xwe de diponijî û digot:

“Ez li ku, cenanti û avdana pembo li ku, qey ev jî qedera min e..!”

Wî navê bîra gundê Hecanê kir ‘Bîra Qederê’ lê heger mirov li kovara ‘Ronahî’ hejmara 25’an sala 1944’an vegere wê rewşa Mîr ya xerab di warê aboriyê de xweş nas bike:

“Aniha ez di aqilê xwe dibînim ku ez bûme serseriyevêkî dinyayê, bê mal û menal û war...”

Ji wê hingê ve, tev nameyên ku ji gundê Hecanê (30 km dûrî Şamê ye) ji kebanî û zarokên xwe re dişandin, Bîra Qederê di bin wan re dinivîsand.

Di nameyekê de ji wan nameyan, mirina xwe ya nêzik jî nîşan daye:

“Ez dixwazim berî mirna xwe, ko ne dûre, tiştekî biçük ji werebihêlim, ma ev ne hewcye.. ? Tişteko ez dixwazim, ko Xwedê bi destê min bigre, bawer dikim ko ez bi pêwîstiyêñ xwe ji bo gel û welatê xwe, bi awakî çak û bêtir jî rabûm û niha divê jî bo mala xwe jî tiştekî bikim...”

"Bîra Qederê 20ê Nisanê, 1951"



1951, Şam. Cenazeyê Mîr Celadet Elî Bedirxan tê rakirin.

Piştî vê nameyê bi 84 rojan, mîrê ziman û rewşenbîriya Kurdî ya resen Mîr Celadet Alî Bedirxan bi sedema wê bîrê di roja 15.07.1951'ê de çû ber dilovaniya Xwedê. Roja îro navê wî wek stêreke geş di asmanê Kurdistanê de diçirise.

Ji berhem û afirandinên Mîr Celadet Bedirxan:

- 1-Rêzimana Alfabêya Kurdî, Şam, 1932
- 2-Rûpelinine Alfabeyê, Şam, 1932
- 3-Biyîsa Pêxember, Şam, 1933
- 4-Nevêjên Êzedyan, Şam, 1933
- 5-Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re, Şam, 1934
- 6-Li Dordoza Kurdistanê, Misir, 1943

- 7-Gramêra Kurdî, Şam, 1943
- 8- Gramêra Kurdî, bi Fransî, Parîs, 1970
- 9- Sebebê Rastyî Ketina Edirne
- 10-Ferhenga Kurdî-Kurdî
- 11-Ferhenga Kurdî-Fransî
- 12-Xwebinas
- 13-Kitêba Sînemxanê
- 14-Hevind (şanoye)
- 15-Dîwanek helbest (çapnebûyî)

MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN DI NAVBERA POLÎTÎK Û ROJNAMEVANIYÊ DE

Di nav rûpelên dîroka Kurdan de, dareke şîn hat, kok û rehêن wê rewa xwe ji xaka Kurdistanê dimêt. Darek kevnarî duçiqlî bû, her çiqliyek ji çiqliyên vê darê berekî fêkî (mêwe) û êmîş dida. Ev dar bi ava çem û cobarên Kurdistanê dihat avdan. Navê vê darê Celadet Alî Bedirxan bû. Vî lehengê Kurd, jiyana xwe li ser du eniyên şer, di ber mafê gelê xwe de xerc kiriye.

Di destpêkê de bi siyasetê mijûl bûye, politikî û şoreşgerî li ba hatine girtin, berê xwe daye eniya rewşenbirî û rojnamevaniyê û tev jiyana xwe jê re terxan kiriye.

Di vê beşê de, ez ê li ser van her du eniyên bingehîn yê di jiyana Mîr Celadet de rawestim. Tevî ko her du mijar hêjane lêkolînek dûr û dirêj.

1 - Eniya politikî:

Bêguman Mîr Celadet Alî Bedirxan ji dema bîrwer bûye û pê de piş bi siyasetê kiriye û pê mijûl bûye. Siyaset ji yekî wek wî re, her tişt bû, wek nan, av û hewayê bû, ji ber ku ew mala tê de hate xwedîkirin û mezin bû, dibistanek azadîxwazên Kurdayetiyyê bû.



Emîn Alî Bedirxan ê rûniştî çakêtê spî lê.

Di wî heyamî de, bavê wî "Emîn Alî Bedirxan" ji siasyiyêne Kurdan yên herî sereke û berz bû. Li Stenbolê hem jî ji berpirsyarên Kurdan yên herî jîr û zîrek bû. Mirov dikare bêje ku piştî koçkirina dawî ya "Mîr Bedixanê Botî" di sala 1868'an de li Şamê, barê malbata Bedirxaniyan yê dûr û dirêj ket ser milên kurê wî Emîn Alî, bavê Celadet Bedirxan.

Vêca Emîn Alî ne tenê xwe wek berpirsiyarê malbata Bedirxaniyan didît, belê pê re jî dihat naskirin wek berpirsiyarê Kurdan. Û bi rastî wilo bû, her ew bi dû doza gelê xwe de dibeziya.

Ji encamên vê berxwedana wî dostanî bi rekeberên Sultan Ebdulhemîd re danî, ew ên ko di sala 1898'an de komela "Hevgirtin û Pêşketina Tîrkan" saz kiribûn. Ji çar

kesên jîr û zîrek ku ev komele damezirandibûn, dudu ji wan Kurd bûn û her du jî dostêن herî nêzik yê Emîn Alî bûn, yek ji wan Dr. Abdullah Cewdet û yê din Îshak Sikûtî bû. Mirov dikare bêje ku dor 10 salan Kurd û Tirkan bi hev re xebat kirine, ango heta sala 1908'an. Di vê salê de, Tirkêن ciwan di holê de hatine xuyakirin û Sultan A. Hemîd neçar bûye ku pêşî bi destûrê sala 1876'an bike, ango "Huriyet, Edalet û Misawat".

Piştî berdestkirina vî destûrî, rê li ber Kurdan jî hate vekirin, ku bi rengekî berfireh doza mafê xwe bikin û di ber de xwe biwestînin.

Hingê temenê Mîr Celadet 15 sal bû, Mîr Celadet di wê biçûkaniyê de li kêleka bav, ap, bira û pismamên xwe sekiniye, digel gelek welatparêzên Kurdan yêن mayîn û bi wan re besdarî avakirin û sazkirina piraniya komeleyên Kurdi li Stenbolê bûn, ango ji sala 1908 heta 1922'yan.

Wek ku min got, Mîr Celadet Bedirxan di dibistana bavê xwe Emîn Alî de hatiye xwedîkirin û bi giyanekî Kurdperwerî mezin bûye. Ew bavê ku zarokêن xwe di dibistanêن herî bilind de li Stenbolê bixwendin û zanîn didan û di warekî Kurdheziyê de ew perwerde dikirin û her dem û gav ev gotina bavê xwe Mîr Bedirxanê Azîzî di guhê zarokêن xwe de digot:

"EZ ditirsim ku hûn di nav Tirkan de zimanê Botan ji bîr bikin. Yê ku zimanê xwe ji bîr bike, ne kurê min e."

Mîr Celadet jî, wek bavê xwe Emîn Alî û bapîrê xwe Mîr Bedirxan Botî, ji çaxê ku bîrwer bûye, dest bi siyasetê

kiriye û pê mijûl bûye û wiha bi refêن welatparêzên Kurdan re firiyaye.

Di sala 1908'an de, piştî ku Sultan A. Hemîd pîş bi destûr kiriye, neteweyêن Împaratoriya Osmanî bi hêvî bûne ku her neteweyek di ber mafê welatiyêن xwe de kar û xebatê bikin û wiha rê li ber Kurdan jî hatiye vekirin. Rewşenbîrêن Kurdan jî kêmâyî nekirine, wan jî wek rewşenbîrêن miletê din xwe di ber mafê gelê xwe de westandine û gelekî li ber xwe dane. Di serê wan rewşenbîran de malbata Bedirxaniyan hebûn û ji malbata van yê sereke Emîn Alî Bedirxan bû.

Ji hingê ve Mîr Celadet bi bay, ap, bira, pismam û gelekêن din ji welatparêz û evîndarêن Kurdayetiyê re sekiniye û bi wan re besdarî avakirin û sazkirina piraniya komele û saziyêن ku li Stenbolê hatine damezirandin bûye.

Di sala 1919'an de ew û birayê xwe Kamîran û Ekremê Cemîl Paşa, Fayiq Tewfîq ji Silêmaniyê digel Major Noel yê Îngilîz li ser daxwaza "Komela Tealî Kurdistan" bi gerekê rabûne di Kurdistana Bakur de da ku Îngilîz daxwazên Kurdan nas bikin, berî ku Peymana Sewrê (1920) bê morkirin di navbera Hevalbendan û Dewleta Osmanî de. Yanî di sala 1919'an de li kêleka mamê xwe Xelîl Ramî Bedirxan, yê ku wê hingê waliyê Meletiyayê bû, sekiniye, di serhildana Meletiyayê de.

Di sala 1922'yan de, lebateke veşartî bû di "Komela Azadî" de, ew komela ku li Erzeromê hatibû damezirandin di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de.

Di sala 1925'an de, ji Elmaniya xwe bi şoreşa Şêx Seîdê Pîranî ve gihandiye, ew şoreşa ku ji encamên Komela Azadî (1922) û Komela Tealî Kurdistan (1918) pêk hatibû. Lê mixabin, şerkeşen şoreşê, ne di çax û demên wê de dest pê kiribûn.

Di salên xwendinê de li Elmanyayê, pêwendiyên wî bi Adolf Hitler û hevalên wî re çêbûne, heta ku di dawiya sala 1924'an de piştî ku Hitler ji zindanê hatiye der, daneyeke ji pirtükên xwe ya "Berxwedana min" bi diyarî pêşkêşî Mîr Celadet Bedirxan kiriye.

Di sala 1927'an de, ew jî endamên sereke bû ji avakirina komela "Xoybûn"ê li Beyrûdê.

Di salên 1927-1930'yî de, gelek kar, bar û xebatên politîkî û diplomati ji bo Komela Xoybûnê û şoreşa Araratê kirine, heta ku di dawiyê de beşdar jî bûye.

Lê mixabin, piştî têkçûna şoreşê xwe li Tehranê, li Şah Riza Pehlewî girtiye. Lê Şah tu hêvî nekirine destê wî de. Vêca Mîr Celadet maye wek penaberekî politîkî di navbera Îran, Iraq, Libnan û Sûriyê de û li saziyên hikûmeta Fransî ya ku desthilat bû, ew kirine bin rûniştina zorê de li Şamê, digel geleke welatparêzên Kurdan...

Di sala 1931'ê de, di bin ra û tevdira wî de "Civaka arîkariyê ji bona Kurdên belengaz li Cezîrê" hatiye danîn.

Mirov dikare bibêje, ku ji roja Mîr Celadet bîrwer bûye û heta sala 1931'ê, pîş bi siyasetê û karê dîplomasî kiriye û bi rengekî aktîv pê mijûl bûye. Xwestiye di rêka siyasetê û şerê çekdarî de mafê gelê xwe yê windayî pêk bîne, lê sed

mixabin, piştî gelek hewldan, bizav û çalakiyên bixwîn, sirgûn û müşextiya welatêن dûr û xerîb û koçkirina dawîn ya bav, ap, bira, pismam, dost û hevalêن Kurdayetiyê, di sirgûn û zîvazîyan de û nemaze piştî têkçûna şoreşa Araratê, ya ku hêviyên Mîr Celadet Bedirxan gelekî pê mezin bûn; Mîr Celadet carek din serê xincera xwe sûtîye, kiriye pênûseke zérîn û bi wê pênûsê bi rondikêن çavêن Kurdan kul, êş û janêن wan nivîsandiye. Wiha eniya siyasetê li paş xwe hiştiye û berê xwe daye eniya ziman, çand û rewşenbîriya Kurdî ya giştî. Di 15'ê Gulana 1932'yan de hawar û gazî Kurdan kiriye, di nav rûpelên kovara xwe Hawarê de.

2 - Eniya rojnamevaniyê:

Wek ku me got, Mîr Celadet Alî Bedirxan di destpêka jiyanâ xwe de pîş bi siyasetê kiriye û digel re jî hewl daye ku tûrikê xwe ji rewşenbîriya giştî dagire. Wî ev her du bar bi hev re hilgirtine û şopandise. Jixwe siyaset bêrewşenbîrî û rewşenbîrî bêsiyaset tekûz nabe, ango hûnandinek di navbera her duyan de heye.

Mîr Celadet Elî Bedirxan, di biçûkaniya xwe de fêrî gelek zimanêن biyanî bûye û bi wan zimanan serwextî çand, ferheng û rewşenbîriya gelek miletan bûye, digel ku zimanê Kurdî, zimanê axaftina mala wî bû.

Di sala 1909'an de, li ber destê Mewlan Zade Rifet Efendî, xwedîyê rojnameya "Serbestî" li Stenbolê, fêrî kar û barêن rojnamevaniyê bûye. Ji hingê ve Mîr Celadet Bedirxan pîş bi karê rojnamevaniyê kiriye, pê mijûl bûye û

gelek gotar di rojnameya ‘Serbestî’ de weşandine, ew rojnameya ku di navbera salên 1909-1913’yan de li Stenbolê dihat belavkirin. Di sala 1910’an de, dema ku hê jî xwendina xwe dikir, bi kar û barê weşandina kovareke dibistanî rabûye û berpirsyariya wê kiriye. Di sala 1912’yan de, bi şagirt û qutabiyêñ Kurdên Stenbolê re beşdarî avakirina ‘Komela Xwendevanêñ Kurd’ bûye, ew a ku tê naskirin bi navê “Hêvî” û bi wan re kar di weşan û belavkirina kovar û rojnameyêñ wan de kiriye, wek:

Rojî Kurd (1913): Ev a ku di bin berpirsyariya Mihemed Salih Bedirxan de dihat weşandin.

Hetawî Kurd (1913): Ev a ku di bin berpirsyariya Hemze Begê Miksî de dihat çap û belavkirin.

Yekbûn (1913): Ev jî di bin berpirsyariya Mihemed Salih Bedirxan de dihat weşandin.

Di sala 1918’an de, alîkarî di weşan û belavkirina kovara “Jîn” de kiriye, ew a ku bi navê ‘Komela Tealî Kurdistan’ li Stenbolê dihat weşandin, di bin berpirsiyariya Memdûh Selîm Beg Wanlî û Hemze Begê Miksî de...

Ka em mêze kin, bê Celadet Bedirxan bi xwe di romana “Bîra Qederê” de çi dibêje:

“..Şerekî nû dest pê kiribû. Min kar, şixûl, mal, dezgeh, pêwendî, hedef û armanc diviyan. Min ê çi bikira? Berê xwe bida ku?

Kurdan gotibûn: Teyr baş e bi refê xwe re. Ezê bibûma hevalê kîjan rês û refan?

Min xwendin û nivîsin, ilm û irfan, rojname û kovar helbijartin. Min da ser vê riyê. Ez nikaribûm bibûma paşa, zabit, tacir, dikandar, karmend, hembal, berdevk, peyiyyê malê û xemxwarê karê rojane. Ev kar û tişt li min ne dihatin. Ne bala min li ser wan bû û ne jî wan heyecanek didan jîna min.

Lê nivîskarî, rojnamevanî, kar û dozên mezin, hedef û armancênil bilind, pîrozheycanek bê payan didan min. Ez, yan jî, ez, bira, mam û merivên xwe jî, bi hesibînim û bibêjim em, bi bir û dîtinên Roussau, Dîderot, Voltaire û feylesûf û nivîskarên din yên şoreşa Firansayê, bi şirêni Ehmedê Xanî û Omerê Xeyam û bi ders, tecrûbe û serpêhatiyêni Mîr Bedir-Xan perwerde bibûn. Ma me qîma xwe bi karêni rojane dianî? Min hedefê xwe hilbijart.

Hingê du mecmûa hebûn, ku li ber dilê min, hem pir ezîz bûn, İctihadâ Abdellah Cewdet Beg û ‘Serbestî’ ya Mewlanzade Rifet Beg.

Gava min daxwaza xwe ya xebatê, li cihê Serbestî û Mewlanzade Rifet Beg re got, wî berçavkên xwe derxistin, ez hembêz kirim (Mukemmel, Mukemmel) got û ez li aliyê din yê bureyê li ber maseke biçûk dam rûniştin. Bi vî awayî min dest bi xebata rojnamevaniyê kir.

Serbestî rê li ber min vekir ku ez bikaribim rojname û kovarêni ku min paşê li welatên dûr û xerîb derxistin, biweşînim. Eger ew tecrûbêni rojêni Stenbolê nebûna ne

Hawar û kitêbên wê, ne ji Ronahî derdiketin. Ez ne bawerim ku ewê bikaribûna derketina..."

Û wiha heta ku kovara xwe "Hawar" belav kir. Di destpêka weşandina kovara Hawarê de bi tîpêni Latînî, gelek şêx, mele û feqeyên Kurdan dijî berdestkirina tîpêni Latînî ji zimanê Kurdî re sekinîn û gotine: ev tîpêni gawiran in, çawa hûn pê zimanê me dilewitînin?! Heta ku Şêx Ebdulrehmanê Garisi fitûk deraniye û tîpêni Latînî ji zimanê Kurdî re helal kiriye.

Naveroka Hawarê bêtir li ser van babetan belav dibû: Alfabeşa Kurdî, zimanê Kurdî, gramêra Kurdî, ferhenga Kurdî, hem ji stûnek ji zarokan re û quncikek bijîşkî û tendurustî ji tê de hebû.

Gelek nivîskarêni Kurdan bi rêya Hawarê nav û deng dane. Bi derketina kovara Hawarê re, welatparêzêni Kurdan xwe li dor dane hev, nemaze ew ên ku ji ber zilm û zorê reviyabûn Binxetê. Hingê piraniya wan li Şamê, di bin rûniştina zorê de bi cî û war bibûn. Bi girsbûn ji axa, beg, şêx û rewşenbîrêni Kurdan bûn. Tevan xwe li Mîr digirtin û rûpelêni kovara wî bi berhemêni xwe dixemilandin. Gelekan ji wan hîç xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî nekiribûn. Hinek ji hebûn qet neçûbûn dibistanan, ew di rêka kovara Hawarê de hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî Latînî bibûn. Di destpêkê de, bi tenê Mîr Celadet û birayê xwe Dr. Kamîran bi nivîsarêni xwe, Hawara Kurdan neqişandine û bi gelek navan; bi tenê Helbestvan Qedrî Can, ji hejmara pêşîn de bi wan re beşdarî kiriye ango ew

nuxuriyê Hawarê ye. Di hejmara duduyan de, Osman Sebrî xwe berdaye nav karwanê nivîskarên Hawarê.

Di hejmara sisyan de, Hemîd Ferec ji Kurdistana Başûr Hawar piroz kiriye û Dr. Ahmed Nafiz Beg Zaza, wek bijîskê Hawarê, di quncika bijîskî de nivîsandiye. Lê ji hejmara çaran û pê de, Hawar bi helbest û nivîsên van kesan hatiye xemilandin wek: Dr. Kamîran Bedirxan, Cegerxwîn, Mustefa Ehmed Botî, Nûreddîn Zaza, Lawê Findî, Hesen Hişyar, Rewşen Bedirxan, Reşîdê Kurd, Ehmed Namî û Qedrî Cemîl Paşa û hwd. Hem jî ji Kurdistana Başûr van nivîskarên bi nav û deng di Hawarê de nivîsandine wek: Fayiq Bêkes, Goran, Tewfiq Wehbî, Şakir Fetah, Hevindê Sorî, Abdulxaliq Esîrî, Pêrût, Lawikê Kurd û hwd.

Her wiha rûpelên Hawarê ji wan kesên ku nû xwe fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kiribûn vekirî bû. Belê beşê Fransızî, ji bilî ku Mîr Celadet û birayê xwe Dr. Kamîran, bi gelek navan di vê beşê de dînîvîsandin, van Kurdnasên biyanî ew beş dixemilandin wek: Pr. G. Michaelian û R. Lescot.

Dikarim bibêjim ku bi xêra Ekola HAWARÊ:

- Pexşana Kurdî a nivîskî bi tîpêن Latînî dest pê kiriye.
- Bingeha gramêra Kurdî hatiye danîn.
- Edebiyata Kurdî a nûjen dest pê kiriye. Helbesta Kurdî ya nûjen bi pênûsa Mîr Celadet, Dr. Kamîran û Qedrî Can û kurteçiroka Kurdî ya hunerî bi pênûsa Dr. Nûreddîn Zaza serê xwe bilind kirin. Nivîskar û

helbestvanêن bilind di hola afirandin û çanda Kurdî de hatin xuyakirin, mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Hesen Hişyar û hwd.

- Bingeşa Ferhenga Kurdî hatiye danîn.
- Wergera bo zimanê Kurdî dest pê kiriye.
- Pirtûkxaneya Kurdî hatiye danîn û bi xêra wê dor 20 pirtûkan ji Weşanxaneya Hawarê hatine çapkiran.
- Zimanê Kurdî ji folklor û klasîkê ber bi nivîsandina edebiyata nûjen ve çûye û folklor hatiye danhev.
- Ekola HAWARê bûye pirekê di nav edebiyata Kurdî û cîhanî de.

Di sala 1942'yan de, Mîr Celadet kovarek din, digel kovara Hawarê weşandiye bi navê "Ronahî", ev kovar jî bi Kurdiya Latînî li Şamê dihat çapkiran û belavkirin. Bi vê kovarê yekemîn car e ku rojnamevaniya Kurdî bi wêne tê weşandin.

DEWLETEK Û ZIMANEK

Mîr Celadet Bedirxan zilamek bû bi karê dewletekê radibû²⁰

Kelekela germa havînê ye. Xwêdan ji bedena mirov tê xwarê, kes nikare xwe li ber tîrêjên roka vê havîna Qamişlo bigire. Çûk û çivîk li asman têne biraştin... Ji bilî ku hin tişt û mişt di hinavê mirov de dikele, difûre û wek pêlên deryayê di ser hev re diqulipe... Û bi demê re diperpite. Dawiya dawî, tev ji mirov re dibin bîranînê wek xewn û xeyalan. Wek, palgehekê ji pêşerojan re. Dibe ku mirov hin caran pala xwe bide wan, sûdeyê ji wan bigire û sebra xwe bi wan bîne.

Di vê germê de bûyerek, bîranînek, wefadariyek tu çi navî lê dikî bike, bi xurtî li dergehê hiş, mejî û dilê min dide, ew jî ev e; bîranîna 55 saliya koçkirina rehmetî Mîr Celadet Bedirxan e.

Belê, wek ku diyar e, ji sala 1991'ê ve, em vê bîranînê li Qamişlo bi bîr tînin. Lê îsal 2006, du gotaran, hevpeyvînekê û çûna min a Kurdistanê bêtir ez hejandim û livandim; ji ber ku tev li dor zîlanekê digerin, ew jî zîlana zimanê Kurdî ye. Gotara pêşîn a romannivîsê Kurd Laleş Qaso bû, bi navê 'Gelo ev Hikumeta Kurdistanê ye yan a Soristanê ye ?' di www.rizgarî.com de, roja 28 Hezîran 2006 belav bûye. Romannivîs Qaso di gotara xwe de bi

²⁰ 12/07/2006, Qamişlo

kezebşewatî dibêje, dibilîne û dipirse: “Gelo bi rastî Soran û hikûmeta wan nizanin ku di vê dewra kominîkasyona pirhêlî de, heger xwendegehê bi Kurmancî venebin, Tirk û Ereb û Farisên ku zimanê Kurmancî pûç kirine wê hîn bêhtir pûç bikin û bi Kurmancî re jî wî çaxî miletê Kurmanc bi carekê ve pûç bibe û av û av here?..”

Gotara din a rojnamevan û xwediyyê malpera www.avestakurd.net a kak Dilbixwîn Dara ye, bi navê ‘Zimanê Medyayê’ di Peyama Kurd, hejmara 92 de, roja 29 Hezîran 2006 hatiye weşandin. Birêz Dara di gotara xwe de dibêje; ku Soranî û Kurmancî her du bûne standard... û pêwîst dibîne Kurmanciya ku piraniya Kurdish pê diaxêfin bibe standard... Ne ku her yek li gor devoka herêma xwe an navçeya xwe tv.yan veke û rojnameyan biweşîne... Hevpeyvîn jî, kak Yeko Ardel bi Dr. Yekta Uzunoglu re li dar xistiye û di malpera www.Celadet.com de, roja 30 June 2006 belav bûye... Dr. Yekta di bersivêن xwe de wiha dibêje: “Başûrê Kurdistanê hêdî hêdî dibe koloniya Tirkan. Alek dane me, serokê me Kurd e, helbet baxtewarî ye. Ez ditirsim serpêhatiya welatên Afrîkî yên salê 50 û 60’î were serê Başûr jî...”

Di Nîsana 2006’an de, ez hatim vexwendîkirin bo ‘Festîvala Bedirxan’ a sisêyan li Hewlêrê, paytexta Kurdistanazad û serbixwe li Başûr. Wek ku diyar e, ev festîval her salekê li bajarekî Kurdish e. Sala pêşîn li Silêmaniye bû, sala duyem li Duhokê bû û îsal jî li Hewlêrê bû. Min jî, kar û barê xwe kir, berhema xwe ji bo xwendina di festîvalê de, li dor navê festîvalê û

Bedirxaniyan amade kir. Bi kêf, şahî û eşq, mîna sofiyekî ku here Hecê, tevî asteng û dijwariyên sînor, min xatir ji zarok, xizm û karên xwe xwest û berê xwe da Kurdistanê.

Kurdistan: Ev gotina mezin, ev xewna şêrîn a ku bi mijandina şîrê dayikê re, bi me re mezin bûye û piçik piçikên wê ketiye xwîna me. Kurdistana ku bavê min û we bi hesreta bihostek axa wê a azad bûn mirin û ev azadiya ku îro lê heye nedîtin. Ez jî çûm, di Zaxo, Duhok, Şeqlawa û Selahedîn re derbas bûm. Li Hotela ‘Birca Hewlêr’ bûm mîvan û dor hefteyekê li wir mam.

Li wir, min ji her çar parçeyên Kurdistanê, Ermenistanê û sirgunê nivîskar û rewşenbîrên Kurd yêñ bijarte dîtin. Ji Amedê (Diyarbekir), Batmanê û Stenbolê, ji Mehabad, Sine û Ormiya, ji Qamişlo, Efrîn û Şamê, hem jî, ji Silêmaniyê, Kerkûkê, Hewlêrê, Duhokê û Zaxo... Digel Emîre Sînem Xan keça Mîr Celadet Bedirxan, xanima yekem di Iraqa federal de (First Lady) Hîro Îbrahîm Ehmed û serokê hikumeta herêma Kurdistanê Birêz Nêçîrvan Barzanî. Em tev xêliyên Mîrê Botan bûn. Her yekî ji me diviyabû ku dewla xwe di bîra Bedirxaniyan û mîrnîşıya Cizîra Botan de dake û qurtek ava sar û cemidî ji bîra wan vexwe... Her yekî dixwest kevirekî, latekê an hîmekî herifi ji Birca Belek li cihê wî vegeŕine... Her yekî ji me dixwest; Memo û Zînê vejînin û Beko bimirînin û bikujin...

Li Hewlêrê, me sihbetên bedew bi hev re derbas kirin û me ji nêzik ve hev û din nas kir, li rewş û halê hev pîrsî. Li wir min gelek tiştên xweş dîtin û ji kêf û şahîyan re, xew

razî nebû ku bibe mîvanê çavê min. Lê bi tenê tiştekî girîng, gelekî girîng çavê min lê neket..! Tevî ku çavê min lê digeriyan; min zimanê Kurdî bi tîpêñ Latînî nedît; min kovarek, rojnameyek nedît ku em tev di bin sîbera wê de xwe bidin hev û bi rêka wê nûçeyên festîvalê, Hewlêrê, Kurdistanê û Cîhanê bixwînin. Mixabin û sed carî mixabin me ew rojname nedît. Ev Kurdistana azad ku ji 15 salan ve bingehê wê hatiye danîn, ji 15 salan ve gelê Kurd li wê herêmê, desthilatiya xwe bi xwe dike. Bi al, hikumet, perlemento û wezîr...

Gelo roja îro, çilmisandin, ne avdan û ne guhdana zimanê Kurdî bi tîpêñ Latînî li herêma Kurdistana azad û federal, gunehê kê ye..? Gelo gunehê nivîskar û rewşenbîrêñ Badînan e ku alfabeşa Latînî pêş naxînin û guh lê nakin, an bi wê rola ku ji wan tê xwestin ranabin..?! Gelo rola rewşenbîr û nivîskarêñ Soran ji yên Badinan aktivtir e û rê nadîn wan..?! Çima hikumeta herêma Kurdistanê û rewşenbîrêñ wê bi çavê ku tê xwestin li birayêñ xwe di parçeyêñ din de nanêrin yên ku bi Latînî dixwînin û dinîvîsînin..?! An tiştin din hene û hê jî dem nehatiye ?!

Di sala 1932'yan de, dema ku Mîr Celadet Bedirxan kovara xwe Hawar li Şamê, bi tîpêñ Latînî weşand; naveroka wê bi berhemên nivîskarêñ Kurmancan û Soranan xemiland. Hingê ew li yekîtiya Kurdan digeriya, ji ber ku wî yekîtiya Kurdan di yekîtiya ziman de didît û yekîtiya ziman, bêguman di yekîtiya tipan de ye... Li Afganistanê mêze kin; ji ber pirzimaniya gelên Afganistanê

û nebûna zimanekî standard, ku gelên wê tev xwe di bin sîbera wî zimanî de bidin hev, yekîtiya Afganistanî têk diçe. Pakistan jî mîna wê, ji ber pir zimaniya axaftina tê de, biryar stand ku zimanê Îngilîzî bibe zimanê fermî ji dewletê re.

Mîr Celadet Bedirxan berhemên piraniya nivîskarên Kurdan bi şêwezarê Soranî û Badînanî di kovara xwe Hawarê de belav dikirin. Mixabin, ku roja iro nîvdewletek me çêbûye nikare kovarekê wek Hawarê bi her du şêwezaran biweşîne. Kovara Hawarê, ev kovara ku yekem car di dîroka Kurdan de zimanê Kurdî bi Kurdiya Latînî, her du şêwezar, di nav rupelên wê de cih digirtin. Bi saya vê kovarê, yekemîn car e ku zimanê Kurdî bi her du şêwezarên, bi tîpêن Latînî berdest dibe. Ev kovar li bajarê Şama şerîf, dihat çapkîrin û weşandin û li nav Kurdên Cizîrê, Efrînê, Zaxo, Hewlêr, Rewanê, Karmanşahê û heta Mûsil û Bexdayê belav dibû.

Bi rastî, em Kurdên Binxetê û Libnanê jî heta roja iro, em negihane ku em kovarekê an rojnameyekê wek Hawar, Ronahî û Roja Nû, zengîn bi naverok û bi berdewamî derxînin. Tevî ku va ew qas sal di ser derçûna Hawarê re derbas dibe. Di heyamê Hawarê de û tevî ku Mîr Celadet bi tena xwe Hawar derdixist, kovara wî di Şamê de, ji çêtirîn kovar di nav kovarên Erebî û Farisî de dihat hejmartin.

Xuya ye ku Mîr Celadet Bedirxan bi tena xwe, bêdewlet û hikumet, bîra vê rojê dibir û nediviyabû ku di pêşerojan de du alfâbeyêñ standard ji zimanê Kurdî re werin bikaranîn.

Di hewldanê Mîr Celadet Bedirxan de, mirov dibîne bê çendî di pêşerojan de diponijî û nediviyabû ku Kurd têkevin wiha gengeşe û aloziyan. Ew di vî warî de, dûrdîtî, şaraza û zana bû. Lê sed heyf û mixabin ku Xwedê jê razî Tewfiq Wehbî Beg, di vî warî de, warê standardkirina alfabetîya Kurdî Latînî û belavkirina wî di nav Badînan û Soran de, xwe ji dûv da paş û alîkarî pê re nekir, wek ku Mîr Celadet dixwest... Ji bo vê yekê mirov dikare li kovara Hawarê hejmara 10'an sala 1932'yan vegere.

Pîrût di gotara xwe de (Eksî Sedayî Hawar) ji Mîr Celadet Bedirxan dipirse û dibêje:

“...Le paşî erk û xerikbonikî çend saleyekik le zeman şanase qîmetdarekanî Kurd-Tewfiq Wehbî Beg-li ser biney Latînî tîpî bo zemanî Kurdî helbijard, alfabetîki le ser ew tîpe dana û gelî lawanî Kurdî Iraq fîrî ew tîpe bûn wa istayehke lekî ehênin. Keçî le seriyevê terewe kar bi destanî xoşewîstî govarî Hawar çeşne tîpîki tiryan helbijardeweke li gel heneke key Tewfiq Wehbî Beg rêk nake wêt. Aya mimkin niye bo ewy rê be ser lê têk çûn nederêt. Komelikî şareza lem dû tîpeû werd bînewe, yayekikiyan hel bijêrinû ya yekikiyan bixine û biwe terme tîpîkiyek reng bo zemanî Kurdî dabînin?”

Mîr Celadet Bedirxan jî di eynê hejmara Hawarê de, di bin navê ‘Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdi’ vê bersivê ji Pîrût re dibêje:

Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdî

Le bo Pîrûtê xoşewîst

Gotinên xoyê benda ‘Ekis Sedayî Hawar’ gelek rast û qencin. Di ser wan re tu gotin nînin. Her weyî me çend caran gotiye yekîtiya miletê Kurd bi yekîtiya zimanê Kurdî tête pê. Di yekîtiya zimên de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e. Yanî ji bona nivîsandina zimanê miletekî, divêt zana û xwendewarên wî miletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabêyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabayê bêne nivîsandin. Ji hejmara pêşîn ve xuyaye ku armanca Hawarê a pêşîn û bingehî eve:

Di Her Tiştî De Yekîti

Ev armanca ha ji me re bûye destûr. Heta niho em bi vî destûrî ve çûn, iro diçin û di dawiyê de dê biçin. Wekî niho, kiryariya her rojname û kovarê ji bona welatê biyaniyan ji cihê çapkîrinê girantire. Lê Hawara ku di her tiştî de mîldarê yekîtiyê ye kiryariya xwe ji bona her welatê ku tê de Kurd hene wek hev kirine. Bi vî hawî li Hawarê jiyan dibe. Ji ber ku heqê postê ji bona Sûriyê (10) santîm, lê jo bona Iraq û Iran û welatên Qefqasê (150) santîme. Lê em pê qayil bûn da ku Kurd di kiryariya Hawarê de jî wek hev bibin.

Belê em dizanin ku zimanzanayê bi qîmet û hêja mamoste yê giram Tewfiq Wehbî Beg jî bi herfîn Latînî

elfabayek çêkiriye. Pey ra rokê me hevdû li Şamê dît elfabayên xwe ji hevre dan zanîn û ew danîn ber hev. Di navber wan de ferqin hebûn. Me dil kir di cih de elfabayên xwe bigihînin hev û ji herdiwa elfabêyek nû bibijêrin û belav bikin. Hingê destbirayê min ê xoşewîst û giram digot ku hîn li ser elfabêya xwe dixebeitim. Ji lewra yekkirina elfabêyên xwe me avêtibû dawiyê.

Di pey re Tewfiq Wehbî çû Iraqê. Lê teşqelenin ne xweş qewimîn ku ji bona her kesî nasin. Di gel vê hindê min jê re çend caran nivîsand, lê li min venegerandibû. Vê paşiyê me zanî ku nivîsarên me ne gihabûn destê wî.

Ji xwe derketina Hawarê ji bona vê yekê dereng maye. Hawar di meha Gulanê de derket. Min rixseta Hawarê di bîst û şesê çiriya berê 1931ê de girt û karêñ derxistina wê di pêşîya gicokê (Şibatê) de pêk anîbû. Çar mehan ez li hêviyê mam, da ku bi destbirayê xwe ve dest bi dest elfabêyeke welê derînim ku pêşdetirî li dû pityê vemekit. Lê her wekî min li jor got li min nehat vegerandin. Jê bêtir jî min nikaribo ez li hêviyê bimînim. Ji lewra me dest bi derxistina Hawarê kir û elfabêya xwe ji Kurd û biyaniyan re da zanîn. İro di meydanê de tiştekî çêkîrî heye. Kovarek û elfabêyek. Elfabêyek û kovarek. Nik dilê min ji bona iro ya çêtir û rastir ev e ku em hêla xwe bidin û vê elfabêyê heta hingê ku mehceta edlandinê bikevêt pêşiyê û rê li me bigirêt, pêşve bibin.

Di gel vê hindê divêt ez careke din jî bibêjim ku em her gav meyldarê yekîtiyê ne û armanca xebata me yekîti ye.

*Em bi gavinin bi vîn û hişk ber bi armanca xwe ve diçin
û nasekinin. Ji ber ku destpêkirina me ji xwe bi derengî
ketiye. Em nema dikarin di hêviyê de bisekinin. Gelek
spasan li Pîrûtê delal dikim ku ev hinceta ha xiste destê
min.*

Xwediyyê Hawarê

Sed heyf û mixabin ku di wê hingê de berêz Tewfiq Wehbî Beg xwe ji ber projeyê Mîr Celadet Bedirxan da alî..?! Ku di wê hingê de berêz Tewfiq Wehbî Beg dengê xwe tevî dengê Mîr Celadet Bedirxan kiribûya û piştgiriya wî ji weşana Hawarê û tîpêن ku wî ji zimanê Kurdî re bijartine, bi erênî pejirandibûya, iro roj ev problema ku li Kurdistanazad, di warê standardkirina zimanê Kurdî de heye, çênedibû. Ev problem gelekî xerab e wek ku hûn tev dizanin, cudabûnê dixe nav Kurdê Bakur û Başûr.

Berî ku ez mijara xwe bi dawî bînim, çav bi gotarê kak Zekî Ozmen xwediyyê malpera www.Celadet.com ketim. Hêja ye ez çend hevokan ji gotara wî, yê ku iro di eynî malperê de hatiye weşandin li dor van yekan ji xwendevanan re raxînim. Birêz Ozmen bi kezebşewatî di vê bîranînê de, vê nûçeya nû belav dike û dibêje: "Van rojan nûçeyên behsa Windowsa Kurdî têن kirin, pêrgî mirov têن. Mixabin tu kes ne di ferqê de ye û tu kes nabêje ku ev Windows wê ne bi alfabeşa Celadet afirandî be.

Bêguman xebata Windowsa Kurdî ya di navbera Hikumeta Kurdistanê û Microsoftê de tişteke girîng e lê

belê mixabin ev xebat wê ji bo standardkirina zimanê Kurdî û standardkirina alfabya Kurdî ti xizmetê neke û ev xebat wê bibe sedem ku hewlên standarkirina zimên û alfabeyê pêrgî zehmetiyên mezintir werin.

Erdal Ronahî, ku digel çend hevalên xwe pergala xebatê ya bi navê Linuxê werdigerîne Kurdî, li ser van nûçeyan wisa got: ‘Ecêb e, hemû kes bi xweşbinî pêşwazî vê xebata Windowsa Kurdî dikan lê belê tu kes nabêje ku piraniya Kurdan wê ji vê Windowsê bêpar bin. Windows wê bi zaravayê Soranî be û wê bi alfabeşa Erebî be’ ...”

Di vê kelkela germa Temûzê de, di vê bîranîna Mîr Celadet Bedirxan de, min gotara wî ‘Zilamek û Zimanek’ (ya ku li jêr cih distîne) li dor vejandina zimanê İbranî û Elyêzer bin Yehûda xwend, pê re pê re jî min dîsa ji xwe re got: Mîr Celadet Bedirxan zilamek bû bi karê dewletekê radibû.

Ziman mîna alê ye, pêwîst e zimanekî me yê neteweyî hebe, em tev li dor kom bibin, pê biaxivin, pê binivîsin û bi gotin û bêjeyên wî zimanî hestên xwe derînin û hez hev bikin...

Niha gotara ku min li jor behs kiribû bi we re par ve dikim. Mîr Celadet Bedirxan ev gotar di kovara xwe Hawarê de di sala 1942’yan di hejmara 40’î de belav kiriye:

Zilamek û Zimanek

Herekol Azîzan: (Mîr Celadet Bedirxan)

Belê, heke ew zilamê xurt û bi vêney peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne. Herweki emê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanên zindî, nav wan zimanên ku mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eşkere dikan.

Me got zimanên mirî, zimanên zindî. Bêdiro, ji awirê jiyînbariyê ve ziman jî wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordünde diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kêl ne kitêb. Hinên din di pey xwe re eserine mezin, kitêbne hêja dihêlin û ew kitêb hetanî iro jî têne xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ku êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Li Ewrûpayê Latînî, li Rohelatê Nîzing İbranî zimanine mirî bûn. Latînî iro jî zimanekî mirî ye. Lê herçî İbranî êdî ne zimanekî mirî, lêbelê zimanekî zindî ye.

Belê ew mirovê bivên di nav Cihûyan de derket û zimanê İbranî vejand. İbranî zimanekî Samî, zimanekî kevnare, hevalê Erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivîsandin. Bi tenê zanayan pê

dizanîn û di kiniştan de Tewrat bi vî zimanî dihate xwendin.

Herçî Cihû bi zimanine din, bi zimanên welatên ku tê de rûdiniştin xeber didan. Yanî Cihûyan zimanekî milî, zimanekî xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan.

Di sala 1877'an di şerê Ûris û Tirkî de zora Tirkan çû bû û herçî miletên Belqanê hene ji bindestiya Tirkan xelas bû bûn. Xelaskirina dewletên Belqanê nemaze bi destê Çarê Ûris çû bû seri û miletê Ûris bi xwe bi vî işî bendawar dibû û rojnameyên Rûsî gelek qala dewletên Belqanê ên nû dikir.

Di welatê Ûris de xortekî Cihû bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû. Kurê Yehûda wek herkesî bi vî şerî bendewar dibû û didît ku miletên bindest wek Sirbistan û Birxaristanê û ên mayîn ji nîrên zorkerên xwe xelas dibûn û digihaştin istiqalalên xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hişyar dibû û li ber halê miletê xwe diket. Yehûda didît ku halê miletê wî ji halê her miletê din xirabtir e. Cihû ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê wan jî nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê Cihû qerara xwe da û di dilê xwe de got: divêt Cihû vegerin welatê pêşiyên xwe, welatê kurên Israîl, û disan divêt ku Cihûyan jî wekî xelkê zimanek hebe û têkde pê baxêvin. Ev ziman jî zimanê pêşiyân, zimanê Îbranî ye.

Yehûda hînî zimanê xwe bû û di sala 1878'an de qesta Parîsê, qesta wî bajarê mîvanhewîn kir.

Li Parîsê, Elyêzer bin Yehûda têkilî Cihûyên Parîsê bû. Elyêzer ji alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fîkrêñ xwe ên milî belav dikirin. Lê welatiyêñ wî bi xwe lê radibûn û heye ku digotin ev mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezin re bi vêneke xurt û mezin û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kiribû serê xwe ji miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê. Yehûda bi xwe hînî zimanê xwe, hînî Îbraniyê bûbû. Niho diviya bû Îbraniyê di nav civata miletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881'ê de Elyêzer keça mamosneyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Felestînê. Bi vî awayî jinikek, hîmê xanimanekê, ketibû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda bi rê ve, di vaporê de dersa jina xwe got û hetanî ku gihaştine erdê Felestînê jina wî hînî çend pirsên Îbranî bûbû.

Gava pê li erdê pêşîyan kirin Yehoda gote jina xwe, ji niho û pê de emê bi tenê bi Îbranî xeber bidin. Ibraniya jinikê gelek hindik bû. Jinikê kir ne kir lê mîrê wê ji querara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye ku zaroyêñ Yehûda hetanî ku bûne xort ji Îbraniyê pê ve bi tu zimanî ne dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesêb. Lê bi vê laliyê miletê Cihû wek miletine din bû xediyê zimanekî, xwediyê zimanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zîvariyyê de dijîn. Lê çi xem. Ji fikirine mezin re fedakarîne mezin divêtin. Ji ber ku xelk bi derbekê bîra fikira mezin nabe. Yehûda nanê tisî dixwar lê gava didît ku xelkê mala wî bi Îbranî xeber dida, bawer bikin, xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi Îbranî belav kir ji xwe re xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hin dibistanê Cihû de dest bi xwendina Îbraniyê jî kirin.

Ji milê din Yehûda ferhenga miletê xwe çêdikir û bêjeyên ku di zimanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê Îbranî jî di nav Cihûyan de belav dibû. Di sala 1922'an de gava Elyêzer bin Yehûda mir zimanê Îbranî yê ku berî 30-40 salî zimanekî mirî bû, bûbû zimanê miletekî. Ev ziman îro di Felestînê û di rex Erebî û Ingiliziyê de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ku bi vêna zilamekî tête pê. Di kar û biserhatiya vî zilamî de pend û derseke mezin heye. Herçî miletên bindest û bêziman an bê zimanê nivîskî divêt jê ibretê bigirin. Herçî em Kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her mileti êdi ne bi tenê wezîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne wezîfa xwe a milî pêk ve

neanîne û bi kêrî miletê xwe nehatine. Ji bona ku mirov bikare xwe ji miletekî bihesibîne divêt bi kêrî wî bêt.

Piştî ku em Kurd jî wek miletên din bûne xwediyê elfabeke xweser, xwendin û nivîsandina zimanê me gelek hêsanî bûye. Tecrîbê şanî daye ku li gora jîriya mirov Kurd ji heftekê heta çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Belê piraniya Kurdan bi tenê bi zimanê xwe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derve be bi tenê bi Kurdi dipeyivin. Lê di nav Kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahiyê an di welatê xerîbiyê de bûne an iro tê de dijin. Tişte ku ji vê hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî ewîlî hînî wî bibin û pişre di nav mala xwe û bi zar û zêçen xwe re herwekî Elyêzer dikir bi tenê bi Kurdi xeber bidin.

Belê ji van Kurdan re divêt, gava derve têne mal, herwekî cilêن xwe ji xwe dikin û wan bi cilêن malê diguhêrînin, zimanê xwe jî welê biguhêrînin û bi zimanê kûçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştekî miqedes hilînin.

JI ŞİRETÊN MÎR CELADET BEDIRXAN (Xwebinas)

Wek ku diyar e, di 15^ê Tîrmehê de (2007), 56 sal di ser oxirkirina dawîn a Mîr Celedet Alî Bedirxan re derbas dibe. û wek ku hûn tev dizanin di 15^ê Gulana îsal de jî, 75 sal di ser derçûna kovara wî Hawarê re derbas bûn.

Bi vê helkeftinê ez dixwazim careke din dewla xwe di bîra Mîr Celadet Alî Bedirxan de dakim û kela xwe û kela tiyên ziman û rewşenbîriya Kurdî a nûjen -yê ku bixwaze-di vê havîna germ de, bi qurtek ava sar û cemidî, ji ava bîra Mîr Celedet Alî Bedirxan vexwim û xwe hênik bikin...

Bê şirovekirin û dirêjkirinê de werin em bi hev re li hin şîretên wî guhdarî bikin:

“...Dema ku tu dixebeitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebeitin an ne. herçî ku dixebite karê xwe pêk tîne û karê tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Her dar bi pelên xwe saye dare, ne bi pelên dara dorê.

Ew ne bi tenê ye. Di dora te de hinin din jî hene ku dixebeitin. Heke te tiştek pek anî li dora xwe vedkire, lê tiştekî welê bigere ku bi yê te bêtir û tekûztir bit.

Hûn hemî ji bona avahiyekê dixebeitin. Her kê ji we hîmê wê daniye xwedê jê razî bit. Pesin jê re bit, heqê wî ye. Hûn jî herin dar û qırş, herî û kevirî peyda bikin, dîwar an banekî wê çêkin. Nav didaniyê bidin. lê ne ku bidexsin.

* * *

Tu ketiye cînariya yekî ku avahiyek bi du mezelan anije pê. Tu di xwe re wî xurtî di bînî ku bikarî avahiyekê çend tayîn û mezelên ber pê bikî. Lê avakirina mala mezin bi xerabkirina a kiçik dest pê meke.

Belê xorto! Di dewra xwe de kêm û zêde, kiçik mezin, civat, kom, civanokan dê bibînî. Di dinyayê de tu tişt nîne ku tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nûdetspêkirî de, pir car kêmanî hene. Heke te ew kêmayî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ku tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsaniye, huner di rastkirina stûna xuwar deye.

...Xorto! Holê bixebite, an bi xwe çêke an arîkariya ewan bike ku çêdikin, ava dikan. Lê heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkiroxan bikî hingê bi ên çêkirî şâ û kêfxwêş bibe. Ji ber ku ew ji bona te, ji bona miletê te hatine çêkirin. Nav di wan de bide, wan bi pesinîne.

Xorto! Te dît ku bazekî kevroşkek girtiye, mebêje, ma girtina kevroşkê jî tişteke. Lê bêje te xezalek girtiye. Ji bona ku baz li xezalê bigere û bide pey wê.

Xorto ! Min got heke tu nikarî çêkî, lê bawer bike, ewlebe ku te dil hebe tu ê bikarî jî. Herçî ku dixwaze dikare jî.

* * *

Wekî ku dixebtî dexiskер ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinêwan damine (daneyne) ber dilê xwe.

Heke di riya xebata xwe de şemitî û ketî, tu zanî ewê çibikin. Mebêje ewê bêñ bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No; ewê ji hevdû bipirsin, gelo lingê wî ne şikyaye.

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatparêz pesnê te bidin, tu ê giram bibî. Ên dexsok tu zanî dê çibikin! Mebêje ku bo xelkê re çeplikan li te xin. No, daxis wan nahêle. Ewê bêjin: Ma ev çi kiriye, ji bona xwe xebitiye û bi nav û deng bûye, di her derê de pesnê wî didin. Ma ev jî tişteke.

* * *

Xorto! Herçî ku bi te berberiyê bikin ji te bêtirin. Ji xwe di dora gulekê de strî bi hezarî ne.

Ew di nav xwe de nexweş bibin, pev biçin jê, li te dibin yek, destêñ xwe didin hev. Ji ber ku ji te kêmtirin. Kêmaniya wan wan digihîne hev.

Ji xwe di tebiêtê de jî welê ye. Tiştên qenc û hêja hindikin, nehêja û bêkêr zehfin. Ma tu nizanî ku di gundekî de du sê hespêñ kehêl hebin, di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarêñ reş hene. Li nik xelkê gundi ne piraniya garanê, lê hindikaiya hespêñ kihêl bi qedir û hêjaye.

* * *

Her wekî min got tu guh mede wan. Her çî ku elîhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide,

*ew peyayêñ nekerhatî û mivrone. Nikarin, nizanin, ji
lewra kurt û pist û gotûgota wan e.*

* * *

*Xorto! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê
tête vemirandin.*

*Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengî bi deng û pêjinê
temirî ye.*

Tu her bixebite, Qet mesekine, karê xwe biserxe.

*Dengê te ku ji pifkirinê natirse, ewê her bilintir, çira te
ku bi pêjinê na lerize ewê her geştit bit.*

* * *

Keçê! di van gotinan de para te ne hindike.

*Keçê! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, diya wî xortî
yê ku min şiretan lê kir û kar û xebata wî şanî we da.*

*Belê keçê, Ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew
lorand. Di daweta wî de te jê re tilîland. Di roja
qewimandinê de, te nav di wî da. Ji xwe tu birkê wî yî.*

*Keçê! Min ji te divêt, tu xortê min welê bixwedî bikî û
bigihînî ku li pesin û şabaşan sezabit û loma jê mebit.*

*Keçê ! Tu di her kar û diravî de arîkariya xortê minî. Tu
ê pêre bijî, pêre jî bimiri.”²¹*

Qamişlo 15/07/2007

²¹ Mîr Celadet Ali Bedirxan (Kovara Hawar ê, H: 18 / 1933, Şam)

HÎNBÛNA ZAROKAN Û VEKIRINA DERSXANEYAN DI NÊRÎNA MÎR CELADET ALÎ BEDIRXAN DE

Ji berî dû hezar sal ve, helbestvanê Çînî (Kîn Tîzo) ji bo hînbûna zarok û nûgihiştiyan wiha gotiye:

“Hînbûna xwendin û nivîsandinên ji nifşekî re, hînbûne ji wî gelî tevî re heta dawiya zemîn...”

Mîr Celadet Bedirxan jî, bîra vê yekê biribû û li ser sekînîbû. Hînbûna xwendin û zanînê ji nifşekî Kurdî re, girîng didît gava di kovara Hawarê de digot:

“Bivê nevê heqê nûgihiştiyan jî di ‘Hawarê de hebû, ji xwe Hawar ji me bêtir ya wan bû, ji ber ku em yên iro û ew yên dawîne...”²²

Daxwaz û armancêñ nemir ne tenê hînbûna navser û gihiştiyan bû, belê zarok û nûgihiştî jî bûn, wî diviyabû wan xwedî bike bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî û zanînê, da ku di rojêñ bê de bi kêrî millet û welatê xwe bêñ. Zanîn û xwenasîn bêtir ji mafê wan didît. Ji ber wî nûgihiştî didîtin ji rojêñ bêre, vêca wî stûneke cihê di Hawara xwe de ji zarokan re vekir, bi nave ‘Stûna Zarowan’ di vê babetê de wiha gotiye:

²² Mir celadet Bedirxan, Hawar, hejmara:17/Şam, 1933

“...Lewra dilê me hebû, em ji wan re, ji nûgihiştiyan re, stûneke cihê vekin, her wekî me vekirbû jî...”²³

Zindî di destpêka çapkirina Hawarê de, çend helbestên xwe ji zarok û nûgihiştiyan re weşandin, lê piştî sê çar hejmarên pêşîn ew stûn ji kovara xwe da alî, ji ber dît ku, nivîskarên zane peyda nabin ku bi berdewamî, bi awayekî qenc û rast û zimanekî xiro Kurdî di wê stûnê de, ji zarokan re binivîsin. Di wan sê çar jimarên pêşîn de, wî bi tena xwe, ew stûn bi helbest, bendik û çîrokên xwe, dixemiland, wekî van nimûneyan:

Kovara Hawar Jimar:1. helbestek bi navê: Bihar

Kovara Hawar Jimar:2. helbestek bi navê: Tola Welatê

Kovara Hawar Jimar:3. helbestek bi navê: Şeva We Xwêş

Kovara Hawar Jimar:3. Bendek bi navê: Dibistan

Di jimara 4'an de, çîrokek weşand bi nave 'Ber tevna mehfûre: Rindê û Zîzê'

Di jimara 5'an de, helbestek weşand bi nave 'Alê Kurdan' di nav gotinên wê de pesnê Ala Kurdan daye, dilê zarokan bi rengên wê xwêş kiriye:

Alê Kurdan di nav rok

Çi bedew û bi heybet

Bi çar rengî rengên te

Çi delal û çi xwêşkok

²³ Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, hejmara:17/Şam, 1933

*Xêzek kesk û xêzek sor
Nav sipê û nîvek zer
Keskore, bi roje
Ev li jér ew li jor*

Di jimara 6'an de, du çîrokên zargotinî-folklorî ji zarokan re, bi awayekî şîrîn û xweş weşandine, di bin navê: 'Dîk û Rovî' û 'Mar û Mirov' de.

Di jimara 8'an de, helbestek ji zarokan re weşandiye bi navê 'Dawete' ji gotinêن vê helbestê tê xuyakirin ku Mîr Celadet hawar û gazî Kurdan dikir, da ku wan şiyar bike, ku li xwe binêrin bê di çi halî de mane.

Tevî vê rewşa dijwar, Mîr Celadet ji xwe bi bawer û piştrast bû, xwe wekî Çiyayê Herekolê di erdê de, bi heybet û saw didît û kovara xwe Hawar di rengê Quling de didît, ku wê Kurd pê şiyar bibin û wê li xwe bipirsin:

*Ji zozana hat quling
Xeber anî ji xweying
Dibê werin dawete*

.....

*Bê xweyi man gund, kelat
Gazî dike ev welat
Dibê werin haware*

Belê 'Stûna zarowan' ji jimara çaran û pê de, ji kovara xwe da alî, hem kesî zane tunebû jê pê ve, ku ji zarokan re binivîse, hem jî wî mezin û biçûk wekî hev didîtin di warê xwendin û nivîsandinê de, çînku her du cî nezan bûn, vêca wî ev yeka han daye zanîn û gotiye:

“Bi tenê tiştek heye, gelo zarok kîne... heye ku em tevde hêj zarokin, di babeta xwendinê de, mêt û zarokbûn ne bi salane...”

Di nav me de gelek mêtê sere hene, ku di riya xwendin û nivîsandinê de, zaro têne hesibandin, lê wextê berê me mêt û zarobûn bi hilgirtina tivingê ji hev vedigetandin...”²⁴

Zindî, her du nifş bi hev re girê didan, dizanî ku her du cî nezanin, vêca peydakirina kovarê girîng didît... Baweriya wî ku, dema mezin kovarê ji xwere peyda bikin û bixwînin, hingê wê zarok jî karibin bixwînin û hînî xwendin û nivîsandinê bibin, bi mezin û seran re. Paşê wê serwextî zanînê bibin.

Raste Mîr Celadet stûna zarakan ji kovara xwe da alî, lê ew ji bîr nekirin, bê ku nîşan bike an bi nav bike, belê wî gelek helbestên torevanên jêhatî di nav rûpelên kovara xwe de weşandin wek: Osman Sebrî, Botî, Cegerxwîn û Qedrî Can.

Kela dilê wî bi kovara Hawarê tenê hênik nebû, rabû wî di kovara Ronahî de jî çîrok û helbestên zarakan weşandin hem ji zargotina Kurdî, hem ji afirandinê hozanên jîr û zîrek, ew ên me li jor nîşan kirin. Di vî warî de dibêje:

²⁴ Mîr Celadet Bedirxan, Ronahî, hejmara:19/Şam, 1943

*“Belê bi vî awayî Hawar bibû dibistana nûgihiştiyan û
tê de çend xortên me kêm û zêde, hînî nivîsandinê bûn
û iro dibin jî...”²⁵*

Xuya ye ku armanca nemir ne tenê guhestina pend û çîrokê bû, an ji torevanya wê bû, belê daxwaz jê ew bû ku xwendevan hînî zimanê xwe bibin, bê ku jê bicefilîn û dijwariyan di xwendina xwe de bibînin, tevî vê yekê jî kela dilê wî hênik nedibû û nikaribû bi tenê xwe dibistanan ava bike, vêca ji neçarî dergehê her du kovarêن xwe ji xwendevanan re vekirî hiştin, ci bi çûk be, ci mezin be.

Dixwest ku gelê Kurd li dor her du kovarêن xwe bicivîne û kom bike, nexusim di riya olîtiyê re, da ku hînî zimanê xwe bibin, bi zimanê xwe Qur'an û Hedîsê bixwînin. Hingê birayê wî Dr. Kamîran Tefsîra Qur'anê û heft sed û du hedîsên cenabê pêxember wegerandibûn zimanê Kurdî. Vêca wî ew tefsîr û hedîs di kovara Hawarê de belav kirin, ji hejmara 27'an û pê de da ku bi dû riya olîtiyê re xwendevanan peyda bike û hînbûna zimanê Kurdî belav bibe.

Zindî bi hêvî bû ku dibistan ji Kurdan re, bi alîkariya Kurdêن dewlemend bêñ avakirin, lê mixabin wan kesan xwe bi nav û nîşan nekirin û lavelava Mîr di ser guhan re dihat avêtin. Vêca di vê babetê de, piştî ku ma bê çare wiha gotiye:

²⁵ Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, hejmara:17/Şam, 1933

“Ma em çi bikin, kanî dibistana Kurdan, ev çend dewlemendên me hene, bela yek ji wan rabe û ji me re dibistanekê ava bike. Îro dibistanêñ me nînin, û dewlemendên me jî guh nadin...”²⁶

Ji tirsa ku milet nexwende û nezan bimîne, rabû tevdîrek din danî, ji bilî avakirina dibistanan, ew tevdîra nû vekirina dersxaneyan bû. Wekî dersxana ku birayê wî Dr. Kamîran li Beyrûdê, ji Kurdên müşextîre vekiribû û ew tê de hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dibûn, hingê mamostayê wan birêz Mustefa. A. Botî bû.

Tevdîra ku Mîr Celadet ra pê anî gelekî hêsan û durist bû, vekirina dersxaneyan ji tunebûnê çêtir bû. Nemir bi kerb û kîn bang li Kurdan dikir û digote wan:

“Îro li ser xwendeyên Kurdan wezîfeye ferde û ferdeke eyne lê ne kefaye vekirina dersxanan...”²⁷

Tevî ku mîr hînbûna xwendina zimanê Kurdî didît ku, ferz e li ser mirovê Kurd, lê kesî pîş bi gotinêñ wî nedikir, û ew xwendevanêñ ku wî, ew di çav xwe re radikirin, xwe nedidan ber dersxaneyan û ji xwe re nekirin kar û bar. Piraniya wan amade bûbûn ku mamostetiya zimanê Kurdî, ji zarok û seran re di dersxaneyan de bikin.

Gelekan jî digotin ku, mamosteyêñ ku em hînî xwendê bikin di van dersxaneyan de nîn in. Mîr Celadet li wan vedigerand û digot:

²⁶ Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, hejmara:17 / Şam, 1933

²⁷ Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, hejmara:17 / Şam, 1933

“Yê ku bi sîh û yek tîpê Kurdi dizane, ew kes mamosteyeke, ji xwe tiştê ku iro ji mere divêtin mamostene, mamosteyên gerok yên ku tîpêne me di nav milet de belav dikan, xelkê hînî xwendin û nivîsandinê dikan...”²⁸

Vêca nemir ji neçarî pirtûkek amade kir bi navê ‘Kitêba Sînem Xanê’ bi awayekî sade Kurdî, bi zelalî li ser gramêra zimanê Kurdî jî zarokan re axiviye, da ku xwendevanê Kurd çî zarok bin çî sere bin serwextî gramêra zimanê xwe bibin.

Dîbaca vê pirtûkê di kovara Ronahî de çap bûye sala 1943’yan, lê mixabin ev pirtûk heta roja iro nebedî ye.

Mîr Celadet ji berî niha nêzikî 80 salî ve bîra hînbûna gelê xwe biribû, dil kiribû û xebitibû ku gelê xwe şiyar bike, wî bigihîne zanîn û felatê, lê sed heyf û mixabin, wekî wî dixwest, milet pê re alîkarî nekir, lê guhdarî nekirin, yên ku lê guhdarî kirin jî, ew seh nekirin û li ber neketin..!!

Gava Mîr Celadet dikir hawar di Hawara xwe de welatiyên wî li hêviya tiştin dî sekinîbûn?!

Gelo ma ew tovê Mîr Celadet Bedirxan di erdê de werkiriye, wê kengî şîn bê...?! Va ev nêzikî 80 salî ye ku ew tov di erdê deye. Bersiv ji kê tê xwestin..?!

²⁸ Mîr Celadet Bedirxan, Roja Nû, hejmara:1 / Beyrûd, 1943

ELFABEYA MÎR CELADET Û PÎVANA PÊWISTIYA TÎPAN

‘Elfabeya Mîr Celadet Alî Bedirxan û Pîvana Pêwistiya Tipan’ pirtûkek nûye, ji rex mamoste Derwêşê Xalib ve hatiye berhevkirin.

Mamoste Derwêş ev pirtûk, piştî xebateke salane ku tê de ponijiye berhev kiriye. Ew bi zimanê Fransî, Îngilîzî, Silavî dizane, hem jî xwe bi şêwazê Soranî re westandiye digel ku ew ji wan kesên pêşîne yên ku ji Ewrûpayê vegeriyan û dest bi nivîsîna Kurdî kirin û wiha te roja iro.

Di van çend salêن dawî de, wî barekî giran daniye ser milê xwe bi sazkirin û serkêsiya ‘Komîta Fêrbûna Zimanê Kurdî’ de; ev komîta ku bi sedan keç û xort, ji piraniya herêmên Kurdan di Binxetê de fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kirine û dike.

Mamoste Derwêş li dor vê armanca Mîr Celadet Bedirxan liviyaye û wek bawerî dengê xwe tevî dengê Mîr dike. Di pêşgotina xwe de armancêن xwe tevî armancêن Mîr dike û dibêje: “Rexneyênerewa li vê elfabeyê dibin, ya seyr ew e ku her yek tiştekî li gor xwe dibêje. Ji ber vê gerek ji her hêlê ve rastiyêñen elfabeya Celadet Bedirxan diyar bibin.

Armanceke me ya din jî heye; diyar e ku yekgirtina elfabeya Kurdî rola kevirê qorziyê di yekgirtina zimanê Kurdî de dilîze. Mîr Celadet me hişyar dike:

“Herweki me çend caran gotiye; yekîtiya miletê Kurd bi yekîtiya zimanê Kurdî tête pê. Di yekîtiya ziman de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e. Yanî ji bona nivîsandina zimanê miletekî divêt zana û xwendewarên wî miletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfebeyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabê bêne nivîsandin.”

Ev pirtûk ji sê besênen serekî pêk tê:

1 – Rexneyêni li elfabeya Mîr Celadet û bersivêni wan: Di vê besê de diyar dike ku elfabeya Mîr Celadet Bedirxan durist e û li ser bingehekî zanistî hatiye avakirin û tev rexneyêni ku li elfabeya wî hatine kirin û têne kirin ne li ser bingehekî zanistî ava bûne û ava dibin.

2 – Pîvana boşıya tîpan li gor Şanon²⁹, wek ku di zimanê İngilîzî de hatiye, wî jî, 20 milyon tîpêni Kurdî berhev kirine û di hemû qonaxêni pîvana Şanon re derbas kirine. Di encam de dîtiye ku 50% ji tîpêni Kurdî boş derdikevin. (Bo zanînê; li gor pîvanêni Şanon, di zimanê İngilîzî de jî 50% boş derketiye.).

3 – Pîvana pêwîstiya tîpêni elfabê: Di vî besî de jî mamoste Derwêş diyar dike ku li gor rebazêni Şanon, bihevguherîna du (LL) bi (L)ê an du (RR) bi (R)ê, durist e û têgihiştina şêwezarê Soranî giran nake. Hem jî diyar dike

²⁹ Şanon: Claude Elwood Shannon, Zanyareki Amerîkî bú, sala 1948 'A mathematical Theory of Communication, belav kir, ku iro bi navê (Teoriya Ragehandinê: Information) nase. Shannon di vî warî de pir navdar e û teoriya wî di gelek warêni zanistî de bi kar tê.

ku pêwistiya van her du dengan ango (LL û RR), kêmî 2 ji 10 000'ı ye. Encama vê yekê ku di pirtûkekê de, ji 1000 rûpelî be ancax rûpelek zêde bibe, lê li gor boşiya deqan, wê dor 500 rûpelî zêde ye.

Mamoste Derwêş Xalib, nimûneyên şêwezarê Soranî ji ferhenga Estêre Geşe, rojnameya Kurdistanî newe û deq ji nivîsên rojhilatî Kurdistanê anîne.

Di encam de diyar dike ku elfabeya Mîr Celadet Bedirxan têra şêwezarê Kurmanciya Bakur û Başûrê Kurdistanê dike.

Beguman bi derketina vê pirtûkê re ronahiyek mezin li dor bikaranîna elfabeya Kurdî Latînî û hilgirtina dengê tîpan zelal dibe û ji her du şêwezarên Kurdî re.

Em jî ji can û dil spasiya mamoste Derwêş dikan, westandina wî di ber ferheng, rewşenbîrî û zimanê Kurdî de piroz dikan û bi hêviya ku rewşenbîrên Kurdan li dor vê pirtûkê bisekinin û rexneyên xwe bibêjin û diyar bikin.

BEDIRXANIYAN BI ŞÊWIR KOVAR Û ROJNAMEYÊN XWE DIWEŞANDIN

Her ku ez Hawarê an Ronahiyê an Roja Nû dixwînim û berpêl dikim, tiştên nû di nav rûpelên van kovar û rojnameyêن ku Bedirxaniyan bi dû xwe de ji me re hiştine dibînim. Vê carê, ez li Roja Nû vege riyam û min ev gotarê li xwarê, ê Mîr Celadet Bedirxan xwend. Di vê gotarê de xuya dike ku Bedirxaniyan bi şêwir kovar û rojnameyêن xwe diweşandin û piştgiriya hev dikirin. Û tu rojname berî rojnameya ‘Kurdistan’ a ku Mîr Miqdad Midhet Bedirxan li Qahîre diweşand, nehatine weşandin. Hem jî ku Mîr Emîn Alî Bedirxan piştgirekî sereke bû ji birayê xwe Midhed Beg re dema ku wî rojnameya xwe Kurdistan li Misrê çap dikir.

Û her wiha di derketina rojnameya Roja Nû de Mîr Dr. Kamîran Bedirxan ji birayê xwe ê mezin Mîr Celadet û hin din dixwest ku ji rojnameya wî re binivîsin. Û wiha di hejmara pêşîn de Mîr Celadet gotarek bi navê ‘Merhele’ nivîsandiye, di hejmara duduyan de Osman Sebrî gotarek bi nave ‘Sinc û Ol’ nivîsandiye û di hejmara sisêyan (Duşem, 17 Gulana 1943) de ji rojnameya Roja Nû careke din ev nivîsa Mîr Celadet Bedirxan hatiye belavkirin.

Belê di vê nivîsê de Mîr Celadet hin ji pêwendiyêن bavê xwe Emîn Alî û mamê xwe Midhet Beg diyar kirine, dema ku mamê wî Midhet li Qahîre rojnameya ‘Kurdistan’ çap û belav dikir, hem jî bersiva bavê xwe Emîn Alî ji

mamê xwe Midhet Beg re, di nav vê nivîsa xwe de belav kiriye.

Ji ber girîngiya vê nivîsê min jî xwest ku ez çavên xwendevanên Kurd, bi van gotinan kil bikim. Fermo, ev e nivîsa ku Mîr Celadet Bedirxan ji birayê xwe Dr. Kamîran re şandiye û di rojnameya Roja Nû hejmara 3'yan de hatiye belavkirin:

1898 – 1943, Roja Me A Nû

Xwediyyê Roja Nû ji min û ji hinêñ din, ji bo hejmara rojnama xwe a pêşîn nivîsarîn xwestibûn. Min jê re bendek nivîsand; lê beriya ku qala rojnamê bikim benda min gihandin dawiyê û xistin rojnamê û jê re (Merhele) gotin.

Herçî ez, dilê min hebû, çavêñ xwe li boriyê biggerînim û bîrekê bav û mamekî xwe, bi vê hencetê vejînim.

Rojnama Kurdî a pêşîn berî 45 salan, yanî di sala 1898'an de, li Misrê belav bûye: Di wê salê de mamekî min Midhet Beg di Qahîrê de bi zimanê Kurdî rojnameyek derêexist: Kurdistan.

Kurdistan rojnameya Kurdî a pêşîn e.

Welê dixuye ku hingê, Midhet Beg, ji birayê xwe ê mezin, Emîn Alî Beg, yê ku hingê li Stenbolê bû, nivîs xwestibûn. Emîn Alî Beg ji birayê xwe ê kiçik re, di nav nivîsarîne din de, teqrîzek jî rêkiribû, lê ne bi navê xwe, ji ber ku nikaribû, lê belê bi navê (Lawê §. E. Fetah).

*Ev e teqrîza bavê min;
Pêrûz ji te re hezar cara
Ev deng e niho li nav yara
Mizgîniya vê cerîdeya qenc
Şabaş bitin çiqa hebit genc
Ev şixlê mezin te kiriye bideet
Cara ewilî te kiriye him-met
Ev rehbera qenc te danî binyad
Kirmanc hemî te kirne irşad
Vê marîfetê tuca nehêle
Daim ji te re miîn resûl e.
Roja ku cerîde tête bajar
Her der dibitin mîsalê bazar
Çiqa hebitin li şehrî Ekrad
Qewlê xweşiya te kirne mitad
Rûhaniya bab û kal ûecdad
Pê vê hinerê te kir niho şad
Beybûniya dewleta te geş bit
Qasî tu hebî dilê te xweş bit.*

*Xwedê rehma xwe li wan û li hemî Kurdên ko, xêzek
be jî, bi Kurmancî nivîsandine bikit.*

C. A. BEDIRXAN

MÎR XELÎL RAMÎ BEDIRXAN (1862 – 1932)

Ji Kemaliyan re dijberekî hişk bû û ji şoreşa Kurdî re
piştgirekî germ bû

Bedirxanî mîna dara çinarê ne, têr şax û pax in, temendirêj û erdgirtî ne, kevin û dêrîn in, xemla Kurd û Kurdistanê ne. Eger dara çinarê xeml û rewşa çiyayê Kurdistanê be, bêguman malbata Bedirxaniyan di qonaxên têvel de, nav û dengê miletê Kurd bûn. Tev xebat û bizavêwan, bervedêrî bû di ber mafê gelê Kurd de, heta ku ji warê xwe (Cizîra Botan) derbider bûn û di çar kenarêndinayê de belav bûn.



Mîr Xelîl Ramî Bedirxan

Mebesta min ji van gotinan ku ez neferekî din ji vê malbata dêrîn û pîroz bi hezkirê zimanê Kurdî û Kurdperweran bidim naskirin. Ev nefer jî kurê herî biçûk yê Mîr Bedirxanê Azîzî ye, navê wî Mîr Xelîl Ramî Bedirxan e.

Xelîl Ramî Beg yek ji kurêñ Mîr Bedirxan yêñ paşî bû. Li gor ku di Hawarê de behsa wî hatiye kîrin û miheqeq yê ku behs kiriye Mîr Celadet e, Xelîl Ramî Beg di sala

1862'yan de li Şamê çêbûye, anku berî mirina bavê xwe Mîr Bedirxan bi pênc şes salan çêbûye. Xwendina xwe li Stenbolê, di medreseya sivil de bi dawî aniye. Ji ciwaniya xwe ve dîlê Kurdistanê û palayê serxwebûna welatê xwe bû.

Di sala 1887'an de digel biraziyê xwe Ebdurezaq Beg, yê ku bi temen jê mezintir bû, derbasî Kurdistana Îranê bûye, ji wir derbasî herêma Colemêrgê bûye û li wir ji rex zilamên Sultan Ebduhemîd ve hatiye girtin û zindankirin...

Di sala 1919'an de bûye qeymeqamê Melatiyê û di pey re muteserifê wê. Her wiha di eynî salê de, ji bo daxwazên gelê Kurd û çareseriya kêseya Kurdî, berî ku peymana Sewrê bê mohrkirin, digel du biraziyên xwe (Mir Celadet û Kamîran Bedirxan), bi Major Noel yê Îngilîz, Ekremê Cemîl Paşa, Hac Tewfîq (Piremerd) re, li Kurdistana bakur geriyaye. Hem jî di wê salê de, di rojên girêdana Kongerê Arzeromê de Xelîl Ramî Bedirxan ji rex serokwezîrê Stenbolê ve hatiye tekîfkirin ku Mustefa Kemal bigire, lê pê re neçûye serî. Serleskerê Melatyayê li dij wî derketiye û di encam de 17 rojan hatiye girtin û paşê ew sirgûnî Beyrûdê kirine. Û wiha Kemaliyan mehiya wî sekinandine û ew ji milk û malên bavê wî herimandine.

Piştî ku Kemalist di sala 1923'yan de derbasî Stenbolê bûne, ferмана bidarvekirina Xelîl Ramî Bedirxan jî di nav listeya 150 kesên ku li wan hatibûn xezebê deraniye. Hingê Xelîl Ramî Bedirxan ji neçarî bûye yek ji daniştiyên Sûriyê û Libnanê.



*Mîr Xelîl Ramî Beg di nêvî de li ser daniştekê, li çepê Qedri Beg û li rastê Haco
Axa Mîr Celadet Bedirxan li paş şipyaye*

Di sala 1927'an de Xelîl Ramî Bedirxan bi biraziyê xwe Celadet Bedirxan û kurdperweran re Komela Xoybûn li Beyrûdê damezirandine û bûye yek ji endamên Komela Xoybûnê û wiha bi kurdperweran re bizav û xebat di ber welatê xwe de kiriye. Rojên xwe yên dawî di navbera Şam û Beyrûdê de derbas kirine. Heta ku di roja 13'ê heyva Çiriya Paşî, sala 1932'yan de li Beyrûdê çûye ber dilovaniya Xwedê. Û li Beyrûdê, ew di rex birayê wî Xalid Beg Bedirxan de hatiye veşartin. Çendî diviyabû ku, li Şamê di rex gora bavê xwe Mîr Bedirxan de bê veşartin.

Di belgeyên ewlekariya hikumeta Fransî de hatiye ku, Xelîl Ramî Beg Bedirxan dijberekî hişk e ji Kemaliyan re û

piştgirekî germ e ji şoreşa Kurdî re. Ew belge berdewam dike û dibêje ku, bi jin e û du kurên wî hene, hem jî ku ew birayê Zibêr Bege yê ku ji nişteciyê Şamê ye. Dostaniya wî bi Zavayê Sultan Ehmed Namî, serokê Sûriyê re heye. Dostaniya wan ji rojê Stenbolê ve ye.

Rehmetî ji bilî zimanê xwe bi van zimanan jî zanibû; Tirkî, Erebî û Farisî. Rehmetsa Xwedê lê û li malbata wî be, Xwedê gunehê wî efû bike û cihê wî bihuşt be.

Qamişlo, 11.01.2011

MÎR DR. KAMÎRAN BEDIRXAN (1895 – 1978)

Bi min xweş e ku em careke din bi hev re Mîr Dr. Kamîran Bedirxan bi bînîn, serboriya wî bixwînin û silavekê li giyanê wî bikin! Ev ê ku digel birayê xwe Mîr Celadet Bedirxan bingeha rojnameya Kurdî ji me re daniye, zimanê me bi elfabeya Latînî nivîsandiye, ji windabûnê parastiye û di pîş û sazê xwe de daye ser şopa Ehmedê Xanî. Werin, her yek ji me, em gulek wefadariyê diyarî giyanê wî bikin.



Mîr Kamîran Bedirxan

Mîr Dr. Kamîran Bedirxan; neviyê Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxan û kurê Emîn Alî Bedirxan e (1851-1926), yê ku ji kesên pêşîn bû ku komeleyên Kurdî, ji bo mafê gelê Kurd li Stenbolê damezirandine... Mîr Kamîran di roja 21'ê Tebaxa 1895'an de li Stenbolê çêbûye, xwendina xwe li Stenbolê qedandiye. Di 17 saliya xwe de beşdarî di Şerê Belqanê de kiriye. Di sala 1919'an de bi birayê xwe Mîr Celadet Bedirxan, Ekremê Cemîl Paşa, Hac Tewfiq

(Piremerd) û Major Noel yê Îngiliz re, ji bo kar û xebatên politîk hatiye Kurdistanê, ji bo daxwazên gelê Kurd û çareseriya kêşeya Kurd, berî ku peymana Sîverê bê mohrkirin. Ji ancamên wê gerê, ev her sê bend ji bo Kurdan hatin dan; 62-63-64. Lê wê demê Mistefa Kemal rê li ber xebatên wan girtiye. Leşker şandine ser wan. Piştî ku Kemalist di sala 1923'yan de derbasî Stenbolê bûne, fermaña bidarvekirina Mîr Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî, Sureyya, Kamîran û Celadet derxistiye. Hingê Mîr Emîn Alî û kurê xwe Sureyya derbasî Misirê bûne. Mîr Kamîran û Celadet jî ji bo xwendina xwe ya bilind çûne Elmanyayê. Li Elmaniyayê Mîr Kamiran doktorayê xwe li Leipzig temam dike. Di heman demê de M. Kemal berê xwe daye Kurdan bi siyaseteke nû; çand, ziman û dîroka wan, încar kiriye.

Mîr Kamîran xwendina bilind li Elmanyayê bi dawî anîye. Û ji nû ve ketiye nav xebatên politîk. Di sala 1927'an de vegeriyaye Rojhilata Navîn û digel birayê xwe Mîr Celadet di avakirina komela Xoybûnê de xebat kiriye ku alîkariya serhildana Agiriyê bike. Lê mixabin ew serhildan di şer de têk diçe. Vêca li Beyrûdê nivîsingehek parêzeriyê vedike û di heman demê de, bi birayê xwe Mîr Celadet re giraniya xwe berdidin ser elfabeya Kurdî û xebatên rewşenbirî û ferhengî yên din û wiha bi hejmarek kesên naskirî re mîna Cegerxwîn, Ehmedê Namî, Osman Sebrî kovara HAWAR û RONAHI'yê bi nivîsên xwe dixemilînin.

Di Şerê Cîhanê yê Duwemîn de, Mîr Kamîran jî wek birayê xwe Mîr Celadet li Beyrûdê, dest bi karê

rojnamevaniyê dike û di sala 1943'yan de, kovarekê bi navê Roja Nû, du zimanî Fransî–Kurdî diweşîne. Ev rojname xwerû bi Kurdiya Latînî bû, digel ku beşekî Fransizî jî tê de hebû. Ji vê rojnameyê 73 hejmar hatine weşandin. Hejmara pêşin di 3'yê Gulana 1943'yan de derketiye, hejmara dawîn 73 di 27'ê Gulana 1946'an de derketiye.

Û di eynî salê de (1943), Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan rojnameyeke din bi navê "Stêr" li Beyrûdê çap û belav kiriye, 3 hejmar ji vê rojnameyê hatine çap û belavkirin, hejmara pêşin (1) di Meha Çileyê berê de 1943'yan, hejmara 2'an di meha Sibata 1944'an de, hejmara 3'yan û dawî di 22'yê Çiriya Berê de sala 1945'an, ango her salekê hejmarek hatiye çap û belavkirin. Dibêjin ku ev rojname wek zêdeya rojnameya "Roja Nû" bû. Di wan rojnameyên xwe de
dijayetiya xwe
ya ji bo
Nazîzmê diyar
kiriye û her
wiha bê westan
û rawestan,
xwestiye ji
cîhanê re
kêşeya gelê xwe
bide zanîn.



Mîr Kamîran Bedirxan

Biraziya wî Sînemxan Bedirxan dibêje; “Mîr Kamîran heya temenê wî 17 sal bû gelek bir û baweriyên wî li ser Îslamê bû. Wî gotibû: Baweriya min bi Îslamê gelek hebû ji bo min parastina vê olê tiştekî gelekî girîng bû. Lê rojekê Arif Beg (Jonturk, ko naskiriyê bavê wî bû û li dema xwe de dadwerê mezinê Stenbolê bû) di axaftina xwe de nêzîkbûna jenosayda Ermeniya diyar kir û dom kir, got; dema em ji wan biqedin roja Kurda wê bê. Kamîran rabû û derket bêyî ku silava wî mîrikî bike û got; ’Vê carê ez têgihiştim ku biratiya Misilmanan bi tenê peyveke û êdî tu hêviya min ji Tirkan nemaye û êdî divê dest pê bikim dijî wan rawestim û şerê wan bikin.’ Ji wê rojê ve dest bi têkoşîna siyasî û çandî kiriye.”

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn Beyrûdê li paş xwe dihêle û berê xwe dide Fransayê. Di sala 1947'an de li Parisê bi cih dibe, wek mamoste xebatê di Zanîngeha Sorbonê, Beşê Zimanê Rojhilatê de dike. Li Parîsê, navenda xwendina Kurdî vedike û dest bi karê nivîsandin û çapkirina belavokêni di derbarê gelê Kurd û Kurdistanê de dike. Di sala 1948'an de diçe Wilayetên Yekgirtiyê Emerîka û memorandûmekê li ser rewşa Kurda pêşkêşî sekreterê giştî yê Neteweyên Yekgirtî dike, lê mixabin tu bersîvê wernagire. Di heman demê de xwendina zimanê Kurdî li zanîngeha zimanê Oryantalî ya Sorbonê vedike û dest bi dersên zimanê Kurdî dike. Di sala 1954'an de dizewice.

Ji salên 1961'ê pê ve tev kar û xebatên xwe dike bin xizmeta şoreşa Kurdî ya ku bi serokatiya Mela Mistefa Barzanî dest pê kiribû û bala dewletên mezin dikişîne ser

kuştin û şewitandina gundêñ Kurdan û rojnamevanêñ biyanî amade dikirin ji bo çûn û hatinêñ Kurdistanê.

Di sala 1970'yan de diçe Kurdistanê û têkilî pêşmergeyan dibe û jiyana wan ji nêzik ve dibîne. Her wiha berî ku koça dawî bike careke din diçe Kurdistanê û nemir Mela Mistefa Barzanî bi germî pêşwaziya wî dike û rola wî gelekî bilind dinirxîne.

Di roja 04.12.1978, demjimêr 17:00'an de Mîr Kamîran Bedirxan, Nivîskar, Helbestvan, Diplomatkarê Kurd, Doktorê Hiqûq û Profesorê Zimanê Kurdî li Zanîngeha Oryantala Sorbonê, li Nexweşxaneya St. Paul li Parîsê koça dawî kir. Berî mirina xwe, termê xwe kiribû diyarî ji Fakultên Tibî re li Parîsê. Anku bêgor e.

Berhemêñ Wi:

- 1 - Elfaba Min, Çapxana Hawarê, Şam 1938,
- 2 - Langue Kurde, Paris 1953,
- 3 - La Question Kurde, Paris 1959
- 4 - Le Kurde Saus Peine, Paris 1965,
- 5 - Der Adler von Kurdistan, Postdam 1937
- 6 - Destpêka Xwendinê, Paris 1971,
- 7 - La Lyre Kurde, Le Calvaire du Kurdistan (Helbestêñ Fransizî)
- 8 - Çarînêñ Xeyam
- 9 - Dilê Kurêñ Min, Kitêbxaneya Hawarê
- 10 - Elfabeya Kurdî, Kitêbxaneya Hawarê
- 11- Xwendina Kurdî, Kitêbxana Hawarê, Demascus, 1938

- 12 - Dersên Şerîetê, Kitêbxana Hawarê
- 13 - Proverbes Kurdes (Metelokên Kurdî) Lucy Paule, Marguerite û Kamûran Alî Bedirxan, Paris, 1937
- 14 - Le roi du Kurdistan (Qralê Kurdistanê) Kamûran Alî Bedirxan û Adolphe de Falgerolle. Paris 1937
- 15 - Der Adler von Kurdistan (Eyloyê Kurdistanê) Kamûran Alî Bedirxan û Herbert Ortel, Berlin, 1937
- 16 - Der Schnee Des Lichtes (Berfa Ronahiyê) Şîhrê Kamûran Alî Bedirxan û Dr Curt Wunderlich, Berlin, 1937
- 17 - Edirne Sukutunun İç Yuzu, Kamûran Alî Bedirxan Celadet Alî Bedirxan Çapxana Serbestî
- 18 - Ji Tefsîra Qur'anê, Paris, 1971
- 19 - Le Dossier du Kurdistan du Sud(Dosya Kurdistana Başûr) Paris, 1965
- 20 - Fîrbûna Xwendina Kurdî, 1968, Paris
- 21- Türkçe İzahli Kürtçe Gramer çapa 2, Ozgurluk Yolu Stanbol, 1977
- 22- Zimanê Mader, la langue Maternelle, alphabet et lectures Kurdes, Paris, 1965
- 23-Zimanê Kurdî Gramera Kurdî, Tirkî, Dr Kamûran Alî Bedirxan û S. Şivan, Weşanên Kawa, Stanbol, 1976
- 24 - Nivîsa min, Mon Livre Cours Pratique de la Langue Kurde, Paris, 1965
- 25 - Livres Scolaries Kurdes, Damas, 1937
- 26 - Le calvaire du Kurdistan (Helbestên Fransizî), Paris

Berhemên Çapnebuyî:

- 1- Ferhenga Kurdî-Fransizî
- 2 - Tefsîra Qur'anê (Bi tenê ji hinek sûreyan çap bûne)
- 3 - Çar Încîl

Fermo vê nivîsa Mîr Dr. Kamîran Bedirxan bixwînin:

Dildiziya Gulekê

Li ber deriyê Diyarbekrê parîzekî mezin heye. Ev parîz bi sosin û rêhanan, bi lale û benefşan xemilandî ye.

Her êvar bayekî xweş û honik bi wan gulêlikan re dileyize. Bihnuñî di hêlanoka bayî de xwe dihejînin.

Avêz zelal ji sîngêz quleteynan divizikin. Ji ezmanî, stêrik, bêdeng li wan fedikirin.

Di bin wê erdê de, di bînaniya hîmêن wî parîzî de kortalek heye. Kortal, kortaleke tarî.

Di wê kortalê de Şêx Seîd bi hevalên xwe ve vaşartî ye. Ji wê kortalê deng nayit. Kortal ker û di guhdariyê de ye.

Di wî parîzî de her şev gulek vedibit. Rengê wê ji lêvêن bûkan sortir, pelên wê bel û geş in.

Gava destekî biyanî drêjî wê dibe, pelên gulê têن yêk.

Ew gul, guleke bi nav û deng e. Kurdêñ ku di şerê welatî de hazir bûn, dildiziya wê gulê dizanin. Dizanin ku spehîtî û geşîniya gulê nişanek ji imîda Kurdistanê ye.

Dizanîn ji ku di nav her pelê wê gulê de hezar axên birîndaran, hezar evdên şehîdan, bi hezaran hêşirên sêwî û jinûbiyan, bi hezaran şînên welatiyan di xew de ne.

Şevkê, zabitekî dijmin, bi delala xwe ve hat û ket nav wî parîzî. Bi gavinêñ hişk û kanc pê li çîman û bîhnûniyan kir.

Hêşînahiyêñ zirav şkestin, pelêñ kulîlkan ji hev ketin.

Di nav bayê êvarê de nalîneke zîz û zelûl hebû.

Zabit, çengê wî di bin çengê delala wî de, xwe da ber gulê û dest avêt gulê. Gul dil kir xwe bigre. Lê ewî ew çinî.

Wekî gul ket nav destên wî, sînga xwe vekir, xwe geş kir.

Her duwan ew bîhn kirin û mirin.

Mîr Dr. Kamîran Bedirxan

Hawar, hejmar: 5, 1932, Şam.

06.12.2010

REWŞEN XANIM BEDIRXAN (1909–1992)

Xweyîngino! Ez careke din dibêjim me jinêñ Kurdên îro, yêñ ku nifşê miletê me yê ayindê li ber destê xwe bixwedî dikan, me dû wezifeyêñ giran hene: hînbûn û hînkirin. Ji lewra ji me re divêt berî pêşin em bibin şagirt û di pey re mamoto: mamotoyê zarokêñ xwe...³⁰

Di vê mijarê de bi min xweş e ku hinekî ronahiyê berdim dor navê Rewşen Xanim Bedirxan, wek jinek Kurd ku xebat û bizav di ber rewşenbîriya Kurdî de kiriye û navê wê di huş û bîra Kurdan hatiye tomarkirin. Belê berî ku ez derbasî mijara xwe bibin, pêdivî ye ku ez bi rengekî panoramî û bi kurtî rewşa jina Kurd di çerxê 20'an de, di ber çavan re derbas kim.

Di destpêka çerxê 20'an de, navê hin jinêñ Kurd di nav tevger û civata Kurdî de hatine diyarkirin, ew ên ku li kêleka mîrê Kurd sekinîne û pê re besdarî di bûyerên Kurdistanî de kirine. Ci di warê têkoşîn û berxwedanê de û ci di warê rewşenbîri û civakî de.

³⁰ Rewşen Xanim Bedirxan / Hawar No: 27 / 1941

Di sala 1908'an de, piştî mirina Îbrahîm Paşayê Millî, jina wî Xensa Paşa, şûna wî girtiye û bi kar û barê hoza Milan ve rabûye. Di sala 1920'an de, keç û jinên Bedirxaniyan komeleyek bi navê jinan li Stenbolê, ji bo mafê xwe yê windayî ava kirine. Di nîvê çerxê 20'an yê pêşîn de Hefse Xanim Neqîb, nav û dengekî bilind di Kurdistanê de daye û hatiye naskirin wek pêşewaya Silêmaniyê; hem bi çalakiyên xwe di ber jina Kurd de û hem bi bervedêriya xwe di ber mafê gelê Kurd de. Mala vê



şêrejina Kurd li Silêmaniyê wek dibistanekê bû ji jinên Kurdan re û çendî car vê jina Kurd hawar û gaziya Kurdan gihandiye Ewrûpayê û ew bû ya ku Komara Demokrat li Mehabadê pîroz kir.

Rewşen Xanim

Di serhildana Sasonê 1925-1936'an de jî, rola jina Kurd hebû. Di wê berxwedanê de navê van her du jinên Kurd bi mîranî hatiye holê Reqiya Xanim û Zariya Xanim. Di salên 1927-1930'yî de jî navê Yaşar Xanim, kebaniya qehremanê Kurd Îhsan Nûrî Paşa di nav gel de bi mîranî hatiye belavkirin û bi saya wê gelek jinên hoza Celaliyan beşdarî şerê Romê bûne. Di sala 1946'an de, Mîna Xanim Qazî, kebaniya Pêşewa Qazî Mihemed roleke berz di

şiyarbûna jinê Mehabadê de lîstiye, hem jî qencî jêreye ku wê bingehê Yekîtiya Afretên Komara Mehabadê daniye.

Li gor xwendin, xepartin û serwextiya min ji civata Kurdî re û ji gelek rexan ve, mîze dikim ku jina Kurd li gel mîrê Kurd rolek berçav lîstiye. Belê ji ber gelek sedeman ve, navê wê di tariyê de maye, hê jî ew ronahiya pêdivî nehatiye berdan ser kar û xebatên wê.

Sebareti Rewşen Xanim Bedirxan, wek rewşenbîrek Kurd a jin; mîze dikim ku vê şerejina Kurd ji sala 1935'an û virde, rolek berz di şiyarbûn û tevdana hestê neteweyî de lîstiye, nemaze di warê rewşenbîrî de. Ew yekemîn jina Kurd e ku bi elfabeya Kurdi Latînî nivîsandiye û di vî warî de alîkarî bi kurmamê xwe Mîr Celadet Bedirxan re kiriye. Nexasim di derhênan û weşandina her du kovarêن wî de; Hawar û Ronahî. Hem jî bi navtêdan û dehifdana wê û Mîr Celadet nivîskarêن wek Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can hatine holê. Piştî koçkirina Mîr Celadet, Rewşen Xanim di sala 1955'an de komelak bi navê ‘Komela Vejandina Çanda Kurdi’ li Şamê damezirandiye, digel Dr. Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Hemîdê Derwêş û ji wê hingê ve, bi rengekî aktîv bi karê rewşenbîrî rabûye.

Erê, mala wê li Şamê wek balyozxaneyekê bû ji siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan re. Ji her çar parçeyên Kurdistanê rewşenbîran xwe li mala wê digirtin. Ji kaniya Bedirxaniyan û bi taybetî kaniya Mîr Celadet Bedirxan ava cerê xwe dadigirtin. Ji encama çalakiyên wê di sala 1957'an de bingehê partî (PDKS), di mala wê de hat danîn.

Belê ji kêmasiyên wê, ku wê nikaribû di warê ziman û rewşenbirî de li ser rêbaza Mîr Celadet Bedirxan bilive. Nikaribû xebatê ji zimanê Kurdî re bike wek ku pêdivî û lazim e. Nikaribû wan şagirtên Hawarê li hev bicivîne. Bi tenê hêza xwe berda ser wergerandina ji Tirkî bo Erebî û di vî warî de serketî bû. Û dikarim bibêjim ku ew yekemîn rewşenbîra Kurd e ya ku wêjeya me ji zimanê Kurdî wergerandiye bo zimanê Erebî û Ereb bi wêjeya me dane naskirin. Dema ku wê di sala 1954'an de gurzek ji helbestên helbestvanên Kurd wek Cegerxwîn, Osman Sebrî û yên mayî wergerandin Erebî, di bin navê Çend Rûpel ji Wêjeya Kurdî weşand. Hem jî, Nameyek Bo Gelê Kurd, a helbestvanê navdar Goran, ji Kurdî kir Erebî.



Seriyê çepê Rewşen Bedirxan

Rewşen Xanim, di navbera sala 1925–1926'an de, ji bo doza Erebî dijî Fransizan bi nivîsên xwe sekiniye û bi taybetî di rojnameyên Filistîniyan de wek kovara Munîrva a Libnanî.

Di navbera salên 1926–1973'yan de, gotar ji kovara Alhuriye re dînîvîsandin, ew a ku xwediyyê wê Yûsif Melek bû. Di navbera salên 1958–1959'an de, wek bêjer çîrokên zarokan di radyo ya Sûriyê de digotin.

Di sala 1957'an de, di ber gelê xwe de çûye Yewnanistanê, di kongreya Antî Kolonyalîzmê de bi tena xwe amade bûye û her çar kursiyên ku navê Kurdistanê li ser wan hatibû nivîsandin, bi heybet û sawa xwe dagirtine. Tevî ku gelek kes li dij wê sekînîn û rêtengî jê re çêkirin, mîna Mîşêl Aflaq, lê wê guh li wan nekir û navê gelê xwe bilind kir, bi tenê sefîrê Sûriyê Yorkî Hekîm li pişt sekiniye, wek ku wê ji min re got.

Di sala 1971'ê de çû Kurdistanâ Iraqê, serdana Mele Mustefa Barzanî û li Hacî Amran, bi jinêne Kurdistanîyan re Hevgirtina Afretên Kurd damezirand.

*Ji Kar û Xebatên Rewşen Bedirxan di warê
rewşenbîrî de:*

- 1– Bîranînên jinekê: Ev pirtûk ji zimanê Tirkî wergerandiye bo zimanê Erebî û di sala 1951'ê de li Şamê çap kiriye.

- 2– Bîranînê keçek mamoste: Ev pirtûk jî, ji zimanê Tirkî wergerandiye bo zimanê Erebî û li Şamê çap kiriye.
- 3– Evîna min û Jana min: Ev pirtûk jî, ji zimanê Tirkî wergerandiye bo zimanê Erebî û li Şamê çap kiriye.
- 4– Çend rûpel ji wejeya Kurdî: Ev pirtûk di sala 1954'an de çap kiriye wek wefadarî ji bîranîna Mîr Celadet Bedirxan re.
- 5– Nameya Gelê Kurd a Goran, Şam, 1954
- 6– Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re: Ji Tirkî wergerandiye Erebî û di sala 1990'ı li Şamê bi alikariya Dilawer Zengî çap bûye.
- 7– Doza Kurdî: Ji zimanê Tirkî wergerandiye bo zimanê Erebî û di sala 1990'ı de, Dilawer Zengî li Şamê çap kiriye.
- 8– Gramêra Zimanê Kurdî: A Mîr Celadet û Roger Lescot e, ji Fransî hatiye wergerandin bo zimanê Erebî û di sala 1990'ı de, Dilawer Zengî li Şamê çap kiriye.
- 9– Bîranînê Salih Bedirxan, Şam, 1991

Wê bi zimanê Kurdî, Erebî û Tirkî dînivîsand û dikaribû bi zimanê Fransî û Îngilîzî bipeyive wek yekî Fransî û Îngilîzî.

Wek ku diyar e Bedirxanî di dîroka tevgera gelê Kurd de, xwedî cihekî bilind û biha ne, çi di warê xebat û bizava neteweyî de be û çi di warê wêje û rewşenbîriya Kurdî a giştî de be.

Rewşen Xanim jî neferek ji vê malbata dêrîne. Wek diya Kurdan dihat naskirin, Kurdan jê re digot Dayê. Dayê Rewşen xwedî hestekî Kurdeyatiya resen bû, pir dilovan û dilsoz bû, dêmê wê di rengê dêmên jinên Ewrûpiya de bû, nerîna çavên wê kûr û tûj bûn, dema ku mirov cara yekemîn pê re rûdinişt û lê guhdarî dikir, hestekî bi tirs diket nava cegerê wî de. Mezinahî û serboriyek dûr û dirêj di tîpêن rûyê wê de xuya dikir, mirov dixwest her dem pê re rûne û lê guhdarî bike, nemaze dema ku serpêhatiyêن jiyana xwe û Mîr Celadet Bedirxan digot û dibiland.

Rewşen Xanim Bedirxan, ev a ku gelekan ji me navê wê bihîstiye, an pirtûkên ku wê ji Tirkî wergerandine Erebî xwendîye, an pirtûka ku wê di sala 1954'an de, bi navê ‘Çend rûpel ji wêjeya Kurdî’ berhev kiriye, xwendîye. Ev yekemîn pirtûk bû, ku xwendevanêن Ereb bi rêka wê serwextî wêjeya Kurdî dixin.

Rewşen Xanim Bedirxan, ev a ku yekemîn jina Kurd e, bi Kurdiya bi tîpêن Latînî di kovara Hawarê de nivîsandiye. Yekemîn jina Kurd e ku gelek xebat, bizav û çalakiyêن têvel, di ber kêşeya gelê xwe de li Şamê kiriye, û di nav biyaniyan de dihat naskirin wek sembolekê ji rewşenbîriya Kurdî re.

Lê mixabin, vê jina Kurd heta roja îro, mafê xwe yê rêzgirtinê wek ku pêdiviye, nestandiye. Ji mafê wê bû ku di festîvala 100 saliya zayîna wê da a ku sala 2009'an, li Hewlêra paytext bihata gerandin, navê wê li ser cihekî bilind, wek peymangehekê, dibistanekê an kolanekekê bihata danîn. An peykerek bo wê, wek nimûne ku jinek Kurd a pêşeng e, tev jiyana xwe di ber welatê xwe de xerc kiriye, di

navtareke Hewlêrê an Duhokê an Silêmaniyê de bihata bilindkirin.

* * *

Rewşen Xanim Bedirxan kî ye?

Neviya mîrê Cizîra Botan e, dotmam û kebaniya pispor û zimanzanê bejinbilind Mîr Celadet Bedirxan e. Ji Bedirxaniyên pir belav di çar kenarên cîhanê de, ew mabû ku pêmayê Bedirxaniyan ji dîroka Cizîra Botan, mîrgeha Mîr Bedirxan, serboriya Mîr Celadet û Dr. Kamîran li ser refikên pirtûkxaneya hiş û xeyalê xwe de diparast û di mala xwe de bi zimanê Kurdî bi keça xwe Sînem Xan û kurê xwe Cemşîd re diaxifi.

Li gor her 83 salênu ku di sere derbas bûbûn, danûstandinên wê bi welatparêzên Kurdan re hebû û tev jê re bibûn pend, zanîn, Kurdzanîn û zanîndan. Heta berî ku koça dawî bike, Rewşen Bedirxan a tekane bû di nav Bedirxaniyan de ku navê Bedirxaniyan diparast. Wê jî mîna her du pismamên xwe Mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan ew şop dimeşand. Ji ber ku piraniya Bedirxaniyên din ji neçarî razî bûne ku li şûna navê Bedirxan 'Çinar' bê nivîsandin, bi taybetî ew Bedirxaniyên ku li Tirkîyê mane wek: Zarokên Tewfiq Beg Çinar, ku niha li Stenbolê dijîn û zarokên Hikmet Beg Çinar ku niha li Enqere û Edeneyê dijîn û malbata Walî ku niha li Misrê, bajarê Feyûm dijîn û filimçêkirê bi nav û deng di nav Ereban de Ehmed Bedirxan û kurê wî rejîsorê navdar Ali Bedirxan û gelek Bedirxaniyên din ku niha li Misirê dijîn,

ji bili Bedirxaniyê ku li Sûriyê ne wek: Zarokên Yûsif Bedirxan, ku niha li Şamê, taxa Mihacirîn dimînin û zarokên Sureya Bedirxan yên ku li Urdin, bajarê Eman in. Lê mixabin nizanin bi zimanê Bedirxan, tenê Rewşen Xanim; navê Bedirxan, dîrok û zimanê wî bi xwe re hilanî û heta roja dawîn ji temenê xwe.

Rewşen Xanim, di roja 11'ê Tîrmeha 1909'an de li bajarê Qeyserî hatiye dinyayê, dema ku bavê wê di sîrgûnê de bû. Ew ji rex bav ve, dibe; Rewşena Salihê Mehmûdê Salih (birayê Mîr Bedirxan). Ji rex dê ve ew dibe; Rewşena Samiya Bedrî Paşa (kurê Mîr Bedirxan).

Rewşen Xanim bi tenê çar sal ji biçûkaniya xwe li Stenbolê derbas kirine. Di sala 1913'yan de, careke din Bedirxanî ji Stenbolê û Tirkîyê hatine sîrgûnkirin û di Rojhilata Navîn û Afrîqiyatê de belav bûne, nemaze di Misrê, Lîbiya, Suriya û Libnanê de. Hingê para bavê Rewşen, Salihê Bedirxan li Şamê, taxa Salihiyê ketiye, hingê ji vê taxê re dihat gotin 'Salihiyet Elekradî.

Li Şamê, Rewşen Xanim dest bi xwendinê kiriye di dibistana Tereqî de, di pey re sê salan di mamostexaneyê de xwendiyê, heta ku di sala 1925'an de bûye mamosteya zimanê Erebî di qonaxa seretayî de li Şamê. Di pey re du salan zimanê Tirkî û sê salan zimanê Fransî û Îngilizî xwendiyê û wiha fêrî van zimanan jî bûye û bûye mamosta zimanan li Urdûnê, bajarê Kerek, hingê Urdûn û Suriye yek bûn.

Sê salan li Urdûnê maye, di sala 1928'an de zîviriye Şamê û li Şamê mamostetiya xwe berdewam kiriye heta sala 1935'an. Jê pê ve bûye berpirsyara dibistanê (Mudîre) heta sala 1964'an, hingê ew vegerandine karê wê yê berê mamostetiyê. Ew jî di wan salan de ji kar aciz dibe û temenê wê jî mezin dibe, vêca teqawîta xwe distîne û li mala xwe rûdinê.

Di vê navberê de du caran dizewice; cara pêşîn di sala 1929'an de bû, bi xortekî Ereb re ji Suriyê, navê wî Omer Malik Hemdî, lê pê re dom nekir. Di sala 1931'ê de hev û din berdan, bi tenê keçek bi navê Üseymaxan ji vê zewacê maye. Rewşen Xanim ev keça xwe bi xwedîkirin daye heta ku ew zewicandiye bi Zihêrê Alî Axa Zilfo re. Niha ev keça wê li Qahîre dimîne, sê keçen wê hene; Şîrîn, Nesrîn û Rewşen.



Dotmam û Pismam³¹

Cara dudiwan di sala 1935'an de, bi kurmamê diya xwe Mîr Celadet Bedirxan re dizewice. Bi vê zewacê kefxweş û şad dibe. Mîr Celadet di sala 1927'an de nû ji

³¹ www.saradistribution.com

Ewrûpa dizivire Libnanê û tê Şamê. Li Şamê çav bi Rewşen Xanim dikeve û hev nas dikan.

Piştî beravêtina şoreşa Agrî û weşandina kovara Hawarê, Mîr Celadet û Rewşen Xanim ra û tevdîrên xwe dikan yek û bi hev re dizewicin.

Ji vê zewacê keçek bi navê Sînemxan, kurek bi navê Cemşîd, du zarok ji wan re çêdibin. Berdewamiya jiyana Mîr Celadet û Emîre Rewşen di gelek qonaxên dijwar re derbas bûye, gelek rojên bi cefa dîtine; xaniyê wan bi kirê bû û heta roja ku Emîre Rewşen koça dawîn kir di xaniyê bi kirê de bû.

Li ser rewşa wî a çetîn û xaniyê bi kirê wiha ji min re got: ‘Kurê min binivîsîne, haza min fezil elekrad! Ango, ev e qenciya ku Kurdan bi min kirine. Tiştê ku ji kovara Hawarê û Ronahiyê dihat destê wan, jiyana xwe pê derbas dikirin. Tevî ku dewletên mîna Fransa, Îran, Urdûn û Tirkîyeyê dixwestin alîkariyê bi Mîr bikin lê Mîr alîkariya wan qebûl nedikir. Tenê razî bû bi wî tiştê ku ji kovarên wî dihatin destê wî, digel mehiya kebaniya wî Rewşen. Bi van her du jêderên diravî jiyana xwe derbas dikirin, tevî ku xaniyê wan ne li gor wan bû, lê ew pê razî bûn.

Bi bûyera bîra qederê a ku mîrê mezin, rojnamevanê jêhatî Celadet Bedirxan pê çû ber dilovaniya Xwedê, Emîre Rewşen Bedirxan ma dilbiêş û xemgîn, rewşa wê a aborî jî, êdî nema pê re alîkar bû. Vêca ji neçarî di sala 1972’yan de mala xwe ji Şamê bar kir bajarê Banyasê, ser keviya Derya Spî, li wir xaniyek ji xwe re kirê kir û tê de ma heta roja

dawîn ji temenê xwe. Bi tenê pîrejinek Çerkez, bi navê Sebahet (Xwîşka jina helbestvanê Kurd Qedrî Can bû), pê re dijiya û alîkariya wê dikir.

Rewşen Xanim Bedirxan, xweş nimûne ye di Kurdistanê de, ji jina Kurd a rewşenbîr û pêşketî re. Xwezî jina Kurd bide ser şopa wê, ji serboriyên wê sûdê werbigire. Ew di rewşekê awarte de hat û navê xwe çesipand. Ez ne bawer im ku nimûneyên wek wê di civata me a hevçerx de dubare bibe, ji ber ku hêj kesî cihê wê danegirtiye. Dibe ku kesêن wek wê di civata me a nûjen de derkevin, lê wê bi rengekî din bin. Ji ber ku dem tê guhertin. Ew sirgûniya Osmaniya êdì nemaye. Lê tiştê balkêş di jiyana wê de, teví ku li Kurdistanê nejiyabû, tev jiyana xwe di sirgün û zîvariyan de derbas kiribû, vê şerejina Kurd xwe dûrî urf û adetêن Kurdî nekir, pêwendiyên xwe ji Kurdistaniyan qut nekir. Hêvî û omîdêن wê vejandina zimanê Kurdî bû, yekîtî û hevgirtina Kurdan bû, serxwebûn û serfiraziya Kurdistanê bû.

Erê, bi dehan jinêن Kurd hene ku di gelek waran de berxwedan û têkoşîn kirine û nav û dengê wan di Kurdistanê de belav bûye, bêyî ku dîrok navê wan biparêze an di nav rûpelên xwe de tomar bike û wiha hatine jibirkirin. Lê navê wan di bîr û xeyala her mirovekî Kurd de hatiye tomarkirin û gelê Kurd her û her bi navê wan paye û serbilind xwe dibîne. Bi saya wan jinêن Kurd, bi hezaran mîrêن Kurd çêbûn û xwe kirin gorî xaka welatê xwe. Sebareti Rewşen Bedirxan, besî wê ye ku bi hezaran ji gelê Kurd navê wê li zarokêن xwe kirine.

Ji vê panoramaya bi lez û bez de li dor Rewşen Bedirxan wek jinek Kurd a pêşeng di warê rewşenbîriyê de, xweş diyar dibe ku jina Kurd ne kêmî jinên cîranên me ye. Tevî ku jina Kurd di nav agirê du hesargehan de dijî; yek jê bindestiya tevayî a gelê Kurd e, a din ku jina Rojhilatê bi tevayî di hesargehê de dijîn. Tevî vê rewşa xerab ya ku dubare ye li ser jina Kurd, Rewşen Bedirxan wek jinek Kurd di cihê xwe de sekinî, neliviya û li gor heyamê xwe xebat û bizav di ber hebûna gelê xwe de kir, tevî sîrgûn û dûrbûna wê ji Kurdistanê.

Hêja ye em li vê nivîsandina Rewşen Xanim Bedirxan vegerin, ev nivîsandina ku li ser rola kebaniyan di avakirina welatan de ye, a ku di kovara Hawarê, hejmara 27'an de, sala 1941'ê belav bûye:

"Xwehêñ min ên delal, herwekî hûn jî dizanin derdê miletê me ê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xudan hikûmet û teşkîlat vê nexweşiyê di xestexaneyine xisûsi de derman dikin û ji wan xestexanan re dibistan dibêjin. Mاموسته، bijîşkêن wê xestexaneyê ne.

Miletê me, ne xwediye wan xestexanan e. Miletê me miletekî bê teşkîlat, bê xwedî û serî ye, miletekî belewela ye û di bin hikmê miletnê din, miletine dijmin de ye. Lê dijminê me ê mezin, ê mezintir nezanî ye. Divêt em şerê wî dijminê xedar bikin. Di vî şerî de jî ji me jinên Kurdmanc re divêt ku arîkariya mîrên xwe bikin, zaroyêñ xwe bie'limînin xwendin û nivîsandinê û wan ji

nexweşiya nezaniyê xelas bikin. Ev xebat ji me, ji jinêñ Kurdmanc re ji hemî jinêñ dinyayê bêtir divêt. Ji ber ku zaroyêñ xelkê gava diçin dibistanê berî her tiştî hînî zimanê xwe dibin. Lê yên me wekê diçin dibistanê bi zimanê xelkê die'limin û carina yê xwe jibîr dikin, ji ber ku me dibistan nîne û zaroyêñ me diçin dibistanêñ xelkê... »

Di pêşgotina bîranînêñ bavê xwe de wiha gotiye:

«Min çi kiribû, ez nizanim, dibe ku min xwe razî kiribe, dema ku min xwe ji zarokêñ xwe re dil kir û çendî ez dilrehet bûm, çaxî ku min canê bavê wan razî kir, ew mirovê zor mezin yê ku tev jiyanâ xwe di ber kêşeyeka gelê xwe de xerc kir, ew kêşeya ku baweriya wî pê dihat...»

Li ser daxwaza wê, berî mirinê; diviyabû ku di rex bapîrê xwe Mîr Bedirxan de bê veşartin, wek ku dixwest, bi saya Kurdperwerên bi rûmet, di eynê rojê de (01/06/1992), hat guhestin Şamê û di kêleka bapîrê wê Mîr Bedirxan û pismamê wê Mîr Celadet de hat veşartin.

Min wiha Rewşen Xanim Bedirxan nas kir,
Digot: “Malê Kurdan malê min e...”

Berî pêleke dirêj kak Zekî Ozmen, xwedîyê malpera www.Celadet.com çend pirs ji min re şandibûn, li dor Bedirxaniyan. Belê mixabin, di wê hingê de, ji ber gelek xwestekêñ rojane, ew derfet li bal min nebû ku bersivê bidim.



1989-Konê Reş li mala Rewşen Xanim-Banyas

Va îro, bi helkeftina derbasbûna 16 salan di ser koçkirina Rewşen Xanim Bedirxan re, ev a ku di roja 01/06/1992'yan de çûye ber dilovaniya Xwedê, kêfxwêş dibim ku bersiva kak Zekî Ozmen a duyemîn bidim û Rewşen Xanim Bedirxan bi bîr bînim.

Pirsa wî jî ev bû: *Pêwendiyên we yên xweş bi Rewşen Bedirxan re hebûn. We kengî û çawa ew nas kir?*

Wek ku min di serî de got, ji biçûkaniya xwe de min li çîrok û serpêhatiyên çîrokbêj û dengbêjan guhdarî dikir. Di nav wan çîrokan de, gelek caran çîrokêñ mîrekêñ Cizîra Botan dihatin gotin. Û wiha sal derbas bûn, ez mezin bûm. Di nav salan de ew çîrok û serpêhatiyên mîrekêñ Botan, di hiş û xeyala min de man û mezin bûn. Min kes ji wan mîrekan mezintir nedidît.

Di sala 1977'an de çûm Elmanyayê ji bo xwendinê. Li wir min ji kurmamê xwe she kir ku Mîr Dr. Kamîran

Bedirxan ji Parîsê hatiye Bonê, ji bo avakirina Komeleya Dostaniyê di Navbera Elman û Kurdan de. Xweş tê bîra min, min ji kurmamê xwe pirsî; gelo Mîr Kamîran Bedirxan kî ye ?! Got, ew neviyê mîrê Cizîra Botan e.

Hingê careke din ew çîrokên mîrekên Botan yên ku di biçûkaniya xwe de min ew she kiribûn hatin bîra min û min ji xwe re got: Dêmek Dr. Kamîran Bedirxan ji wan mîrekên Botan e. Ew ên ku ji biçûkanî ve min li çîrokên wan guhdarî dikirin. Û wiha ji wê hingê ve, bi evîndariyek mezin min daye ser şopa Bedirxaniyan bi tevayî û vê paşiyê Mîr Celadet Bedirxan bi taybetî.

Di Adara 1989'an de min û hevalekî xwe, me kovarek biçûk bi navê Gurzek Gul (1989-1992) li Qamişlo weşand. Bi weşandina vê kovarê re, ez li Mîr Celadet Bedirxan û pêmayê wî geriyam, heta ku ez rastî wan çend hejmarên kovara wî HAWAR'ê hatim, ew ên ku rehmetî Hemreş Reşo, ji (1-24), di sala 1976'an de ji nû ve li Elmanya dabûn çapkiran. Hem jî, ew ên ku rehmetî Mihemed Bekir Axa, ji (1-9), di sala 1987'an de dabûn hev û ji nû ve çap kiribûn.

Di wê navê de min seh kir ku kebaniya wî Rewşen Xanim Bedirxan sax e, li bajarê Banyas, ser Derya Spî jiyanâ xwe derbas dike. Ev yek di havîna sala 1989'an de bû. Wiha me nimreya telefona wê ji Dilawer Zengî stand. Yê ku dostaniya wî bi Rewşen Xanim re gelekî gur u xurt bû û gelek kes di rêka wî û rêka apo Osman Sebrî re diçûn mala Rewşen Xanim Bedirxan. Bi taybetî ji Kurdên Bakur û Ewrûpa. Belê nizanim çîma Rewşen Xanim ji rex Kurdên Suriyê ve dihat veşartin..?!

Rojekê, min nav di xwe da û telefon jê re vekir:

- *Elo, ev mala Emîre Rewşen Xanim Bedirxan e?*
- *Belê, ez im Rewşen Bedirxan, tu kî yî..?*
- *Ez Kurdek im, min xwest silavekê li te bikim.*
- *Tu ji ku yî, ji ku xeber didî..?*
- *Ez ji Qamişlo bi te re me Emîre Rewşen, gelo ez dikarim carekê bême nik te..?*
- *Çima na kurê min, berî tu were xeberê bide min, telefonê veke.*

Û wiha me xatir ji hev xwest.

Piştî dor du heyvan ango di payîza 1989'an de, ez çûm bajarê Banyas, mala Rewşen Xanim Bedirxan. Li gor urf û adetên Kurmancî min hin diyarî, ji mal danehev û bi xwe re birin wek: qetirmîzek hingiv, yek rûnê malê, yek penîrê malê û hin savar û nîsk.

Li Banyas, ji hotêlê min telefon jê re vekir, soz jê stand û dawî ez çûm mala wê. Me ji nêzik ve hev dît û hev nas kir. Gelek gili û gazin di wê navê re derbas bûn. Berî ez xatir jê bixwazim min jê re got: Dayê! Min hin penîr, hingiv, rûn, savar û nîsk ji te re anîne, bi hevî me tu wan ji dest min bigire. Li min vegerand û got, te kirîne an te ji mal anîne? Min lê vegerand û got, dayê min ji mal anîne. Ji min re got; ma tu ne Kurd ï, ku tu Kurd be, ew malê min e, malê Kurdan malê min e. Hem jî got; kurê min! Penîrê te aniye yê sîrikan e? Min got na. Li min vegerand û got: Xwezî penîrê sîrikan bûya. Min soz dayê ku ez ê careke din penîrê sîrikan jê re bibim.

Ji wê çûna pêşîn ve nivîsandina pirtûkekê ket serê min de li dor jiyan û xebata Mîr Celadet Bedirxan. Hingê jî, min gelek pirtûk bi zimanê Erebî û hin nûçe li dor Bedirxaniyan û Mîr Celadet dabûn hev. Di çûna din de li bal Rewşen Xanim Bedirxan, min projeya xwe bi nivîsandina pirtûkekê li dor jiyan û xebata Mîr Celadet Bedirxan jê re got, hem jî min penîrê sîrikan ji penîrê mala Mihemedê Nayîfê Paşê jê re bir. Wê jî bi dilekî fireh projeya min pejirand û pîroz kir.

31/05/2008 /Qamişlo

Wiha, Min Xatir Ji Rewşen Xanim Bedirxan Xwest

Di roja 01.06.2009'an de, 17 sal di ser koçkirina Rewşen Xanim Bedirxan re derbas dibin û di roja 11.09.2009 an de 100 sal di ser roja bûna wê re dibihurin. Bi vê helkeftinê, bi min xweş e ku wê bi vê nivîsa xwe bibîr bînim û xwendevanên rojnameya Agirî serwext bikim.

Di roja 15.05.1992'yan de ez li Banyasê, li mala Rewşen Bedirxan bûm, ango berî 16 rojan ji mirina wê. Min û wê bi hev re firavîn xwar û projeyeke hevpiş danî, ku di roja 15.07.1992'yan de, bi me re li bajarê Qamişlo amade bibe, da ku besdariyê di bîranîna koçkirina Mîr Celadet Alî Bedirxan de bike, hem jî ku di roja 26.04.1993'yan de careke din li Qamişlo amade bibe û besdariyê bi me re di bîranîna 100 saliya jidayikbûna Mîr Celadet Bedirxan de bike.

Lê Xwedê nekir nesîb û giyanê wê di roja 01.06. 1992'yan de ji nav me revand, ango ji berî 17 salan ve. Û ew projeya me neçû serî.

Di her du salên dawîn de, ji berî mirina wê, ez her heyv 3-4 rojan lê dibûm mîvan, di wê mîvandariyê de me dîroka Bedirxaniyan û rewşa Kurdan, ji aş û bajêr ve tev dida.

Heyva ku ez nedîcûm; ji min re telefon vedikir û digot:

- Kurê min tu nehatî, xêr e..?!

Di roja din de min berê xwe dida bajarê Banyasê û ez û wê diketin nav sihbetên dûrûdirêj.

Temenê wê di ser 80 salî re derbas bûbû, sibeha zû ji xew şiyar nedibû, navmaliya wê ya Çerkezî 2-3 fincanêн qehwê jê re dibirin odaya razanê heta ku ji nû bi hiş xwe ve dihat.

Dor saet 10'ê sibehê, ji nû ez û wê li ser sifreya taştê kom dibûn û me xwe berdida nav sal û demên derbasbûyî, ew salên ku mala wê di Şamê de bûbû wek navendekê ji Kurdên müşextî û endamên komela Xoybûn re û di nav wan de rewşenbîr û torevanên Kurdan, ma kî û ne kî. Û ji min re behsa Bedirxaniyên ku li Şamê, Misrê û Urdinê belav in dikir û digot: filan ji Bedirxan e û filan ji Yezdanşêr e. Li ser zewaca xwe bi Mîr Celadet Bedirxan re wiha digot: “*Di vê zewacê de rola Haco Axa û Hisnî Berazî mezin bû.*” Gelekî pesnê Mîr Celadet dida, nexusim di der heqê guhdana keça wê Useyme Xan de û pê de diçû, digot:

“Mîr Celadet nayê jibîrkirin, rehmetî gelekî xwe diwestand heta ku jimarek ji kovara Hawarê belav dikir, gelek alozî didîtin. Ji ber ku nivîskar nebûn, yên ku hebûn jî bi tîpêن Erebî dinivîsandin û ji rehmetî re rê dikirin. Mîr bi tena xwe nivîsên wan diguhertin tîpêن Kurdî-Latînî û ji bo çapê amade dikirin. Ji bilî westandin û aloziyêن weşandina Hawar û Ronahiyê, em di rewşeke aborî a dijwar re derbas dibûn, tevî ku gelekan ji dost û hevalên me diviyabûn arîkariyê bi me re bikin, lê rehmetî razî nedibû û arîkariya kesekî qebûl nedikir, bi tenê bi arîkariya hevalên xwe yê Nêçîrê Hisêن Beg Îbeş û Elî Axa Zilfo razî dibû.”

Rewşen Xanim, pê de diçû û digot:

“Mala me ji mîvanan vala nedibû, tev Kurd bûn, ji axa û parlementêrên Kurden Cizîrê bûn, carinan di nav wan de Fransiz û Îngilîz jî hebûn.”

Û berdewam dikir û digot:

“Mîr gelekî hez kuncîlan dikir, tevî ku kêm caran ji mal derdiket, derketinêن wî jî yan wê biçûya qehwexana (Kemal) bi dû çareserkirina pirsgirêkên (gir û giriftê) Kurden Cizîrê, ew ên ku bi dû aloziyêن xwe de dihatin Şamê, yan wê biçûya nêçîra xezalan bi hevalê xwe (Hisêن Beg Îbiş) re, biniya Şamê û dor (Reqa) û (Til Ebeyd)ê...

Carekê ez di ber jinêن Sûriyê de çûm Qahîreyê, min ji Qahîreyê bedlekî spehî û cizmeyeke bedew ji Mîr re anîn, di wê hingê de Cegerxwîn mîvanê me bû, dinya

zivistan û sar bû. Ez ji dibistanê hatim, min mîze kir ku ew bedlê bedew li Cegerxwîn e, ez dîn bûm. Mîr nas kir ku ez engirîme, bi Fransî bi min re xeber da û got:

- Nepeyive, derbasî odeya malê bibe.

Di pey min re hat û ji min re got; ev Cegerxwîn e, şâirekî Kurdan e, feqîr û xizan e, ku ez lê nebim guhdar, wê kî guhdar be, ez çi li xwe kim li ber çavê xelkê rind û bedew e.”

Rewşen Xanim gelek êş, kul û keder borandibûn û gelek caran qiriktalî ji destêni mirovên Kurd dîtibû! Û ji ber berberiya wan, di sala 1972'yan de, mala xwe ji Şamê bar kir bajarê Banyasê û li ser vê babetê wiha ji min re got:

“Kurê min! Xwezî ez ne Bedirxanî bûma, barê ku ez Bedirxanî me barekî giran e, ez pê hatime girêdan..?!”

Saet 5 ê sibeha Hezîranê 01.6.1992 zingilê telîfona min lêda bi rahiştina bihîstokê, dengê jinekê hat, bi Kurdiyekî Botanî ji min pirsî: Qamişlo ye? Min got: Belê. Got: Mala Konê Reş e? Ez Useyma keça Rewşen Bedirxan im ji Banyasê dipeyivim, diya min çû rehmetê, ji min re gotibû ku ez mirim, xeberê bidin Konê Reş. Saet 11'ê nîvro em ê wê bibin Şamê.

Min jî bi lez û bez karê xwe û çûna Şamê kir û çend telefon ji dost û hevalên xwe re vekirin, bi ser riya Heleb û Şamê ve ketim. Bi rê de, min helbestek nivîsand li dor Mîr Bedirxan, Mîr Celadet û Rewşen Xanim û li ser gora wan min xwend. Ev in çend malik ji wê helbestê:

*Erê Mîro! Felek çerx û dewran e
Rewşen Xanim iro li te mîvan e
Bigerîne civateke Botanî
Digel Rewşen û Celadet û Xanî
Rewşen Xanim wê bide te mizgînî
Îro şer e li Herekolê banî
Li Cizîra Bavê Têlî, li Şirnax
Gelê Kurd mil dane hev û bi yek rex
Şiyar bûne êdî nemaye ew xew
Berxwedan û serxwebûn e û hew...*

DR. CEMŞİD CELADET BEDIRXAN (1939-1999)

Di roja 09.11.2009'an de, li bajarê Hewlêrê di bin çavdêriya serokê hikumeta herêma Kurdistanê ya kabîneya 5'an Nêçîrvan Barzanî û bi amadebûna nûnerê serokomara Îraqê Mam Celal Talebanî û wezîrê kulturê yê hikûmeta herêma Kurdistanê Dr. Kawa Mehmûd û hejmarek mezin ji berpirsên hizbî û hikumî yên herêma Kurdistanê, 100 Saliya Rojbûna Şahjina Kurd Rewşen Bedirxan hat lidarxistin û di bin durişma van gotinên wê de hat pîrozkirin: Yekîtiya Kurdan bide min, ez ê Kurdistanek azad bidime te. Gerek ev bîranîn di roja 11.09.2009'an debihata lidarxistin; roja jidayikbûna Rewşen Xanim Bedirxan. Lê wek wefadarî û rêzgirtin ji giyanê Dr. Cemşîd Bedirxan re, yê ku di roja 09/11/2009 an de, 70 sal di ser jidayikbûna wî re derbas dibe, ev bîranîn bi paş de hat xistin, da ku her du bîranîn têkevin yek rojê, anku di rojabûna Dr. Cemşîd Bedirxan de.

Dr. Cemşîd Bedirxan kî ye?

Dr. Cemşîd Bedirxan kurê Mîr Celadet Alî Bedirxan û Rewşen Bedirxan e. Ew di roja 09.11.1939'an de li Şamê ji dayik bûye. Û her wiha lê mezin bûye. Lê jî, xwendina xwe ya seretayî qedandiye. Li Libnanê jî xwendina navendî xwendîye û dawî li Şamê di xwendingeha Emerîkî û Orlhodoxiê de xwendina xwe a lîse bi dawî anîye. Di sala 1958'an de li ser wasiyeta bavê xwe Mîr Celadet Alî Bedirxan ji bo xwendina bijîskiyê çûye Elmanya Rojava.

Li Elmanya, di sala 1959'an de, dest bi xwendina bijîşkiyê kiriye û di sala 1968'an de bi pileyeke baş doktoraya xwe di bijîşkiyê wergirtiye. Her wiha di gelek nexweşxaneyên Elmanya de û nêzikî du salan jî di nexweşxaneyên Parisê de karê bijîşkiyê kiriye. Ji bo xizmetkirina gelê Kurdistanê û vekirina nexweşxaneyeke taybetî, di Temmuza sala 1970'yî de piştî beyana 11'ê Adarê seredana başûrê Kurdistanê kiriye, da ku li bajarê Hewlêrê nexweşxaneyeke taybet veke. Lê mixabin ji ber astengiyên sîstema hikûmeta wê demê projeya wî pê re neçûye serî û careke din ziviriye

Elmanyayê. Dema ku şoreşa Barzaniyê nemir dest pê kiriye, wî jî rola xwe listiye û bi dermanan û pêdiviyên tenduristiyê alîkariyên ber bi çav ji tevgera Kurdistanê re kiriye.



Dr. Cemşîd Bedirxan³²

³² www.kurdistanabinxete.com

Her wiha Dr. Cemşîd Bedirxan kar di damezrandina Komeleya Xwendekarên Kurd a li Şamê de kiriye û wiha jî di komeleya Xwendekarên Kurd a li Elmanyayê de kiriye, hem jî di rêxistina Partiya Demokrat a Kurdistanê ya şaxê Ewrûpa de kar kiriye. Vê paşiyê ji ber rewşeke taybetî dev ji kar û çalakiyên siyasi berdaye û êdî girîngî daye karê xwe yê tenduristiyê.

Di der barê 50 saliya derbasbûnê di ser Komeleya Xwendekarên (Zanîngeh û Dawiya Navendî) Kurdên Şamê de, di hejmara 398 an a Dengê Kurd, Çiriya Duyem sala 2008'an de, ê rojnameya Organa Partiya Demokrata Kurd Surî, ya bi zimanê Erebî, li dor damezrandina Komeleyê û rola Cemşîd Bedirxan tê de, wiha hatiye nivîsandin:

“Salvegera damezrandina hevbendiya xwendekarên Kurd li dawiya navendiyêni Dîmeşqê (Şam), bi heman awayî hevbendiya xwendekarên Kurd li Dîmeşqê, bi destpêkirina Xwedê jê razî Cemşîd Celadet Bedirxan, hevbendiya xwendekarên Kurd li dawiya navendiyêni Dîmeşq li payiza 1957'an hate damezirandin, ku ew bi xwe hate ew tebeqeya em lê niştecîh bûyîn. Şêx Mihyeddîn, Husêن Kîkî û Mihemed Salih Cuma jî ligel dabûn û li gel xwendekarên din ên li Taxa Kurdan...”

Her wiha Dr. Mihemed Salih Cuma hevaledî herî nêzikî Dr. Cemşîd Bedirxan bû, di hevpeyvîneke taybet de (Hewlêr, 22.12.2008), di der barê rola Dr. Cemşîd Bedirxan di rêxistina Komeleya Xwendekarên Kurd û tevgera Kurdi de wiha dinirxîne û dibêje:

“Min Cemşîd li sala 1956'an de nas kir, wê demê me pola dehan dixwend. Ji bo xwendinê em jî wekî gelek xortên Kurd ji Qamişlo cûne Şamê. Li wir me peywendî li gel Kurdên Şamê kir. Yek ji wan kesên ku me peywendî ligel kir Cemşîd Bedirxan bû. Em gelek caran ji ber pirsa Kurd diçûn mala Rewşen Bedirxan. Ji ber ku temenê min û Cemşîd Bedirxan wekî hev bû.

Peywendiyeye me yê gelekî baş hebû. Li wan salan de tevgera Kurd gelekî xurt bû, wan dixwest hem li gel xwendekarên dawiya navendî û hem jî ligel xwendekarên zanîngehê çalakiyan pêk bînin. Em (Mihemed Salih Cuma, Cemşîd Bedirxan, Hiseyn Kîkî, Braderê Dawud, Şefiq, Ednan Mihemed...) wekî xwendekarên dawiya navendî bûyîn û ji rojavayê Kurdistanê hatibûn û me dixwest di vî warî de em rêxistinék pêk bînin. Rêxistina xwendekarên dibistanê jî ji aliyê zanîngehê de Hemîd Derwêş, Îzeddin Resul û hinek Kurdên başur jî hebûn. Her wiha li wê demê de me dixwest em rêxistina PDK Suriye jî çêbikin. Ji bo wê yekê em ligel Cemşîd Bedirxan rûniştin û me peyreveke rêxistinê çêkir. Piştî ku me bendên peyrewê nivîsand, me xwest ji aliyê mafperwerî de bingehek çêbikin. Ji ber wê yekê me ligel Mam Hejar û Ali Fetah Dizeyî hevdîtin pêkanî û peyrewê me nîşa wan kir. Piştî ku li ser peyrewê me hinek guhertin çêkir û paşê jî me çap û belav kir û êdî me dest bi rêxistinê kir. Rêxistina me li salên 1956'an de û heta 59'an ku ez li wir bûm, gihîş hemû Şam, Cizîr û Çiyayê Kurmançan. Her çi qas

rêxistineke biçûk bû lê dîsa jî gelekî zû belav bû. Cemşîd li sala 1958'an çû Ewrûpayê û ez jî dawiya sala 59'an çûme Ewrûpayê.

Em her du jî endamê Partî bûn û me ligel hev kar dikir. Cemşîd Bedirxan li nav Partî de her wiha li nav xwendekarêñ Kurd leqê Elmanya de û pêkanîna rêxistinêñ Ewrûpa de û rêxistina Partiya Demokrata Kurdistanê ya li Ewrûpa de rolekî serekî dilîst. Li pêkanîna rêxistina PDK Ewrûpa de 22'yê Sibatê 1960 ez û Cemşîd jî ji Suriyê beşdar bûbûn. Ew cara yekem bû ku Partî li Ewrûpa dihate birêxistin. Cemşîd yek ji wan rewşenbîrêñ Kurdistanî bû. Peywendiyêñ wî ligel kesayetiyêñ her çar parçeyên Kurdistanê re hebû. Her wiha peywendiyeke wî yê gelekî baş ligel Nuredîn Zaza û İsmet Şerif hebû. Li gelek zanîngeh û bajarêñ Ewrûpa me semîneran li dar dixist ev e jî feydeyeke wê yê baş hebû..."

Di salên 1985 û 86'an de Dr. Cemşîd Bedirxan bi nasnameyeke din û bi navekî din yê veşartî, seredana cih û warê bav û kalêñ xwe Cizira Botanê dike. Nêzikî du mehan li bajarê Şirnex, herêma Botan û gelek bajarêñ bakûrê Kurdistanê digere. Her wiha ji bo derfeteke xebatê lêkolîn û hevdîtinan pêk tîne. Lê mixabin li wir jî ji ber bindestiya welat û astengiyêñ dewleta Tirk nikare li wir zêdetir bimîne û dîsa bi neçarı vedigere Elmanyayê.

Dr. Cemşîd Bedirxan di roja 19.09.1975'an de ligel Michield Xanim dizewice û du zarokêñ wî yêñ bi navê

Kurd (Curd) û Evîn çêdibin. Curd û Evîn her du li Elmanyayê dijîn. Dr. Curd xwendina xwe ya bijîşkiyê qedandiye û niha di nexwesxaneyên Elmanyayê kar dike. Evîn jî li Elmanya xwendina Pedagojî qedandiye û li wir kar dike. Her wiha ew ligel Jiyan Bedirxan tev li jiyana hevjîniyê bûye.

Dr. Cemşîd Bedirxan di roja 10.12.1999'an de li Brezilyayê koça dawî dike û termê wî li bajarê Koblenz yê Elmanya dispêrin axê.

Dr. Cemşîd Bedirxan ji derveyî zimanê Kurdî, zimanên Erebî, Îngilîzî, Fransî, Elmanî, Tirkî û Portogalî bi awayekî baş dizanîn.

Qamişlo, 10/11/2009

SELAH SADELLAH ZAVAYÊ MÎR Û SALEK DI SER KOÇKIRINA WÎ RE

Piştî ku Mîr Bedirxan di sala 1847'an de sirgûnî Stenbolê bûye, neferên malbata wî di çar kenarên dinyayê de belav bûne. Di wê müşextiyê keçên xwe dane gelek mirovan. Ew keçên ku dane jî, bi rêk, pêk û şêwir dane û wiha gelek zavayêwan ji malbatêna naskirî hene wek. Malbata qeralê Ûrdinê, malbata Elsulih li Libnanê, malbata Rehmî Hekarî û malbata Sadellah ji Zaxo. Belê di baweriya min de çendî zavayêniyan hebin û têvel bin, kes ji wan nagihîje bejn û bala kurê Zaxoka Botan Salah Sadellah.

Ne di ware mirovahiyê de, ne di ware ilm û zanînê de û ne di ware Kurdewariyê de, ez dikarim wî bi navê Mirê zavayêniyan Bedirxaniyan bi nav bikim.



Salah Sadellah

Di roja 18.10.2008 an de salek di ser koçkirina wî re derbas dibe. Gelo Salah Sadellah kî bû? Ew nivîskar, torevan, wergêr, zimanزان û rewşenbîrekî Kurd bû. Rehmetî di sala 1930'yi de li Zaxo hatibû ser rûyê dinyayê,

xwendina xwe li Kurdistanê, Iraqê û Brîtanyayê xwendibû, pirî jiyana xwe a karê endezyariyê li Bexdayê derbas kiribû. Di ber karê xwe yê fermî re bi ziman, ferheng, wêje û wergêra ji zimanê Kurdî bo Îngilîzî û Erebî û ji Îngilîzî bo Kurdî û Erebî mijûl dibû û wiha gelek pirtûkên wî yên hêja di vî warî de hatine çapkiran wek: Diplomat ku ji Îngilîzî wergerandiye Kurdî û pirtûka ‘Kurdistan Divided Nation of the Middle East’ ku ji berê 50 salî ve bi Îngilîzî nivîsandibû û çap kiribû, bi navê S. S. Gavan, hem jî ev pirtûk li Erebî hatiye wergerandin û paşê jî zimanê Rûsî. ‘Ferhenga Salaheddîn’ bi Kurdî û Îngilîzî ye, ku ji hezarên peyvan pêk tê. Hem jî ji xebatên wî yên herî balkêş wergerandina Mem û Zîn’ê ye ku ji Kurdî kiriye Îngilîzî û îsal hatiye çapkiran û wiha bi dehan pirtûkên wî bi zimanê Kurdî, Erebî û Îngilîzî Hene. Bihuştî di roja 18.10.2007’an de, ango berî salekê li paytexta Kurdistana azad, Hewlêr çûye ber dilovaniya Xwedê. Li ser daxwaza wî, ew li bajarê wî Zaxo di nav xizm û karên wî de veşartine.

Belê kebaniya wî Sînemxan Bedirxan qîza Mîr Celadet Alî Bedirxan û Rewşen Xanim Bedirxan e. Sînemxan Celadet Bedirxan, di sala 1957’an de bekeloriya distîne û di zankoya Şamê de xwendina xwe di avokatiyê de dixwîne. Di roja 22’ye Tebaxa 1959’an de bi endezyar, nivîskar û wergêr Salah Sadellah re zewiciye. Bi salan mala wan li Bexdayê, hem jî li Kerkûkê maye. Li Bexdayê, di bingeha Neteweyê Yekbûyî de Internationall Schoolê mamostetiya zimanê Fransızî kiriye û li Kerkûkê besdarî di avakirina Hevgirtina Jinê Kurdistanê de kiriye, niha malnîşin e

(teqawit e). Bi çend zimanê biyanî dizane wek: Erebî, Îngîlîzî, Fransızî, Almanî û Tirkî, lê zimanê Kurdî, zimanê axaftina mala wê ye. Du zarokên wan hene; Azad û Dilnaz, Azad endezyar e wek bavê xwe, niha li Qeterê dimîne. Dilnaz, li Parîsê dimîne. Ji berî dor sê salan ve mala wan ji Bexdayê hatibû Hewlîrê, niha jî ew li Hewlîrê dimîne.

Di Nîsana 2006'an de li Festîvala Berdirxaniyan a sêyemîn ku li Hewlîrê hatibû lidarxistin, ez çav bi bihuştî Salah Sadellah ketim, me çend rojên xweş bi hev re derbas kirin, ez ji sehbata wî têr nebûm. Min dît ku ew mirovekî nefşbiçûk, zanyar, bêdeng û Kurdperwer e. Belê hêja ye ku mîreka me Sînemxan Bedirxan wiha şîn û cefayê li ser hevserê xwe Salah Sadellah bikişîne û heta roja îro kincêñ reş li xwe dike.

Di roja 30'ê Adara 2008'an de çûm Hewlîr. Berî her tiştî çûm serdana Emîre Sînemxan. Min dît ku cilêñ reş lê ne û gelekî li ber koçkirina hevserê xwe Salah dikeve. Êvarî, Ferda Xanim Cemîl Paşa ez û wê û xalê Mehdî Zana digel hunermenda Kurd Şérîn Perwer û Dr. Hisêن Kîkî vexwendî şîvekê li hotêlek navdar kirin. Li hotêlê ez di navbera Sînemxan û Ferda Xanim de rûniştîm, min berê xwe da xalê Mehdî Zana û got; Îşev, ez gelekî kêfxweş im ku di navbera du jinêñ ku ji du malbatêñ dêrîn û Kurdperwerên Kurdistanî de rûniştîme. Emîre Sînemxan bi keser û kovan li min vegerand; ma ka Salah gerek ew jî bi me re ba...! Ev gotina wê gelekî kûr bû... Helbet Salah Sadellah hêja bû heta ku Sînemxan wiha hez jê dikir û ew bûbû zavayê Mîr Celadet û Rewşen Bedirxan.

Belê Sînemxan, ezbenî! Bi koçkirina Salah Sadellah re ne tenê xisar li te bûye, belê xisara mezin li rewşenbîriya Kurdî bûye û di vê biware de dikarim bibêjim; embihêvî ne tu wan cilêن reş biguhêre, karê dinyayê wiha ye. Dawî bela sere malbata wî sax be, serê xelkêن Zaxo sax be, sere gelê Kurd sax be û bihuştâ rengîn mala wî be.

Qamişlo, 17/10/2008

ÇIROKA GORA MÎRÊ CIZÎRA BOTAN (MÎR BEDIRXAN) LI ŞAMÊ

Ji 30ê Nîsana 1997'an de heta roja îro, ez li hêviya medyaya Kurdi bûm ku, li ser nûjenî û avakirina gora Mîrê Botan, Mîr Bedirxan û her du neviyên wî (Celadet û Rewşen), raweste, bipeyive û şirove bike... Lê mixabin wê medyayê em agahdarî tu tiştê hêja nekirin?!

Yê min jî, ji ber rêzdariya min ji kesên ku bi kar û barê nûjenî û avakirina gorê rabûne, min tu gav neavêtin, bi tenê min çavneriya medyaya Kurdî dikir. Û bi hêvî bûm ku tiştekî li ser vê gora ku, hestiyên Mîrê Cizîra Botan Mîr Bedirxanê Azîzî (1802–1868) û her du neviyên wî (Celadet Emîn Alî Bedirxan (1893–1951) û Rewşena Salih Bedirxan (1909–1992) hembêz dike, binivîse û me serwext bike. Lê mixabin, tiştekî wiha hêjayî nehat nivîsandin, tiştê ku hat nivîsandin jî, di warekî teng de bû ne li gor navê mîrê Botan bû.

*Konê Reş û Ibrahim Zaza
li ser tirba Mîr Bedirxan*



Û wiha, va gelek sal di ser roja vekirina vê gorê re (30.04.1997) derbas bûn û hê jî me tu saloxdanêن hêja li ser van her du goran seh nekiriye.

Vêca bi vê mebestê, ez dixwazim, xwe berdim vê meydanê û li ser dîroka gora Mîrê Botan û neviyên wî Mîr Celadet û Rewşen Xanim rawestim û we agahdarî van çend nûçeyên kevn û nû bikim. Dibe ku hin ji van nûçeyan yekemîn car e ku belav dibin.

Min jî piraniya van nûçeyan ji zardevî rehmetiya Rewşen Xanim girtiye.

Di çend salên dawî de, ji sîrgûn û zivariya ku Mîr Bedirxan di girava Girîtê de derbas kir, gelek caran ji sultan dixwest ku destûra wî bide vegere Cizîra Botan, warê bav û kalên wî, lê sultan ew rê nedayê. Vêca dawî, ji sultan xwest ku rêka çûna Şamê bidêyê, da ku her çend salên xwe yên dawîn li Şama Şerîf biborîne.

Şam jî, ji Kurdan re wek cihekî pîroz lê tê meyzandin, hem ji rex Misilmantiya wê ve, hem jî ji rex xweşiya wê ve û wek ku di nav Kurdan de belav e: “Şama şerîf erda muqedes e.” û ji mêt ve dibêjin: “Şam şekir e welat jê şêrintir e.”

Mîr Bedirxan, bi dû bajarê Cizîrê, Şam ji xwe re hilbijart û wek ku xwest, sultan rê dayê û Mîr Bedirxan ji girava Girît, bajarê bi navê Qendiyê hat Şamê.

Hingê gelek ji zarokên wî li Stenbolê û Şamê dijiyan û hin ji wan karbidestên mezin bûn, kurê wî Bedrî Paşa wê

hingê waliyê Horanê bû. Lê kurê wî Miqdad Midhet li Stenbolê xwendina xwe dikir.

Wiha Mîrê Mîran her çend salên xwe yên dawîn li Şamê derbas kirin, heta ku di rojekê de, ji sala 1868'an de çû ber dilovaniya Xwedê, hingî zarokên wî ew di rex gora Şêx Xalidê Neqşebendî de veşartin, li taxa Kurdan ya ku dikeve quntara Çiyayê Qasyiyûn de, raserî Şamê.

Li gor rêçika Neqşebendî, gora Mîr Bedirxan bêguhdan ma. Çinku Neqşebendî gelekî guh nadin avakirina goran. Lê bi tenê kêlek ma didevanê gorê, ku gor, gora Mîr Bedirxanê Azîzî ye.

Di sala 1925'an de Mîr Celadet Bedirxan Neviyê Mîr Bedirxan, ji Elmanya vege riya rojhilata navîn, xwe bi şoreşa Şêx Seîdê Pîran re gihad. Di sala 1926'an de, çû Qahîrê, li ber serê bavê xwe yê nesax rûnişt heta ku bavê wî Emîn Alî çûye ber dilovaniya Xwedê.

Di sala 1927'an de hat Beyrûdê, komela Xoybûn damezirand û kar û barêن Xoybûnê kir. Yekemîn car di sala 1928'an de hat Şamê, li Şamê berî her tiştî pirsa gora bapîrê xwe kir û çû serdana gora wî.

Hingî dît ku gor di rewşek xerab de ye, kes bawer nake ku ev gora mîrê Botan e, gor bi zor dihat naskirin, ew jî, bi xêra kêla kerimî ya ku navê Mîr Bedirxan li ser hatibû kolan...

Ji wê hingê ve avakirina gora Mîr Bedirxan, bi neviyê wî Mîr Celadet re ma û pê re mezin bû, lê kar û xebatênu ku

li pêşiyê hebûn ji avakirina gorê mezintir bûn, ew kar û xebat jî amadekirin û besdariya wî, di şoreşa Agirî de bû...

Lê sed mixabin, şoreşa Agirî jî di sala 1930'yî de beravêtî bû û Mîr Celadet bi lehengên wê re, ji neçarî xwe li Îranê girtin...

Li Îranê, Mîr Celadet Bedirxan û Şah Riza Behlewî li ber hev neketin, Şah Riza ew ji Îranê deranî. Mîr Celadet xwe li Bexdê girt. Li Îraqê, Ingilîzan rêtengî li ber danîn. Kurdên Bexdê jî, ji tırsa Ingilîzan xwe dûrî wî kirin. Dawî, ji neçarî careka din xwe li Şamê girt. Li Şamê jî hikumeta Frensi dest danîn ser û ew kirin bin rûniştina zorê de, wek tevayî endamên Komeleya Xoybûnê û welatparêzên Kurdan ji Eyndîwerê heta bi Kobanê û Efrînê.

Ji sala 1930'yî û bi vir de di bin wê rûniştina zorê de, Mîr Celadet dû çalakiyên çak pêk anîn, yek ji wan: Damezirandina "Civata alîkariyê ji bona Kurdên belengaz li Cizîrê" û ya din " avakirina gora bapîrê xwe Mîr Bedirxan, ya ku ji mîj ve di bîra wî de bû.

Ji bo avakirina gorê ji Hacî Evdilkerîm Efendî yê Botî û Resûl Axa yê Jêlî xwest ku, axê ji Cizîra Botan, jê re bibine Şamê, da ku hestiyê bapîrê xwe di nav axa Botan de veşêre. Ew axa ku her û her Mîr Bedirxan bi hesreta wê bû û çendî dixwest di nav de bê veşartin.

Ü wiha di rojekê ji rojêñ bihara 1931'ê de, bi besdariyeke mezin ji Kurdên Şamê û Kurdên sircûnkirî li Şamê, digel çend şêx û melayêñ Kurdan gora bapîrê xwe

vekir û ji nû hestiyêñ wî di nav xaka Botan de werkir û cihê termikî zêde di rex de vala hişt û ji kesên beşdarbûyî re got:

- Ku ez bimirim, divê hûn, min di vê gorê de, di rex bapîrê min de veşerin.

Û gora bapîrê xwe bi kevirêñ herî sipehî di Şamê de pêça û li ser gorê xanîkek (malgonek: kumbedek) ava kir û li ser kêla ber serî bi Kurdiya Erebî wiha nivîsand:

ELFATÎHE; Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxanê Azîzanî, rehmeta Xwedê li ser wî û li ser malbata wî bet.

1286

Sal derbas bûn û Mîr Celadet û gora bapîrê xwe li Şamê man, di cejn û Newrozan de, gora bapîrê xwe di nav gul û kulîlkan de dihişt û pêlekê bêdeng, li ber serê wî diponijî...

Di rojekê ji rojêñ salêñ 1940 de, digel kebaniya xwe Rewşen Xanim û her du zarokêñ xwe (Sînemxan û Cemşîd) û bi wan re dengbêjê wî Ehmedê Fermanê Kîkî, çûn serdana gora Mîrê Mîran Bedirxan û li ser gorê ji wan re got: Min ji giregir û mezinêñ Kurdan re gotiye, va ez ji we re jî bibêjim, ku ez mirim hûn ê min di eynê vê gorê de veşerin, di rex bapîrê min de cihê min heye, hûn ê min di rex de veşerin.

Roj, meh û sal derbas bûn HAWAR û RONAHÎ bişkivîn, Fransızî ji Sûriyê derketin, Hawar û Ronahî çilmisîn, rewşa Mîr jî hin bi hin xerab dibû, rojêñ çetin û dijwar, dijwartir dibûn.

Vêca Mîr Celadet ji neçarî, ji bo xatirê nanê xwe û xîzana xwe di sala 1951'ê de bîrek li gundê Hecanê nêzikî Şamê kola, da ku bi ava wê bîrê pembo av bide û navê bîra xwe kir Bîra Qederê. Heta ku di roja 15.07.1951'ê de qedera wî di wê bîrê de hat û çû ber dilovaniya Xwedê.

Di roja din de (16.07.1951), bi beşdariyeke zexim ji Kurd, Ereb û hevalên wî ji Xiristiyanan termê Mîr Celadet Bedirxan di eynê gora bapîrê wî de hat veşartin, wek ku wî dixwest kirin.

Di pey re welatparêz û helbestvan hêja Qedrî Can ev çend malik ji bo kêla ber serê wî hûnandin:

ELFATÎHE

Mîrê Kurd

Lawê Kurdistan

Neviyê Bedirxan

CELADET

Fidakar, xwedîyê himet

Cendekê wî ku di vir de binax bû

Giyanê wî bilindî asman bû

Di riya niştiman

Xwedî bi can

Giyanê xwe kir qurban

Ne mirî ye, zindî ye

Navê wî ebedî ye

1951/7/15

Wiha kêlek nû ji vê gorê re hat amadekirin, ev kêla nû li şûn kêla kevn hat danîn, ya kevn hat guhestin rexê din.

Di nav salan re kevirêن xanîkê kumbeda di ser gorê re, hin bi hin xwe ji ber hev berdidan, kumbed dihat herifandin. Vê paşiyê, li ser xwestina rehmetiya Rewşen Xanim, ku hîn sax bû, Dilawerê Zengî hin kar di wî xanîkî de kirin, lê gelekî kêm bû, ne li gor xwestinê bû...

Di çend salên dawî de, Rewşen Xanim gelekî bi tirs bû ku li bajarê Banyasê bimire û kes nebe ku wê bibin Şamê, wê di rex bapîr û pismamê wê de veşerin! Vêca gelek caran Kurdêن ku diçûn serdana wê, agahdarî vê yekê dikirin. Ez jî yek ji wan bûm.

Di roja 1'ê Hezîrana 1992'yan de, Rewşen Xanim li bajarê Banyasê çû ber dilovaniya Xwedê, di eynê rojê de xortêن Kurdan, li Banyasê ew birin Şamê, min jî, ji Qamişlo xwe li Şamê girt. Ü wiha ew jî, di bin wê kumbedê de, di rex bapîr û pismamê xwe de hat veşartin. Min jî ev çend gotin li ser gora wê gotin:

*Erê Mîro, felek çerk û dewran e
Rewşen Xanim îro li te mîvan e
Bigerîne civateke Botanî
Digel Rewşen û Celadet û Xanî...*

Wiha, du gor di bin wê kumbedê de bi cî bûn, yek a Mîr Bedirxan û neviyê wî Mîr Celadet e û yek a Rewşen Xanim e.

Lê her du gor û kumbeda di ser wan re, bêguhdan man, jixwe gora Rewşen Xanim ne dihat xuyakirin, kesî nizanibû ku gor e! Ew kumbeda ku di ser gorêن wan re jî, hin bi hin dihat herifandin...

Vê dawiyê mamoto Mam Celal Talebanî, mamoto Hemîdê Derwêş û mamoto Kemal Burkayî bi kar û barê nûjenkirina gorê rabûn, gora Mîr Bedirxan, Mîr Celadet û Rewşen Xanim ji nû ve restore kirin. Kumbedek nû di ser gora wan re ava kirin, bi kevirên reş û spî pêçan... Û di roja 30.04.1997'an de bi besdariyeke mezin gor vekirin. Ji kesên ku besdar bûn, sê kalemêrên ku şagirtên Mîr Celadet bûn; Dr. Xalid Qotreş, mamoto Mihemed Zemçi Zade û mamoto Xelîl Reşîd Şêxelşebab û gelek kesên din di gel birek ji torevanan wek: Ez, Diya Ciwan, Salihê Heydo, Ferhad Çelebî, Selah Berwarî, Lezgîn Teter û hwd.

Di destpêkê de mamoto Hemîd Derwîş gotina vekirina gorê got, di pey re birêz Abdîn Bedirxan gotina malbata Bedirxaniyan got digel ku şagirtên Mîr Celadet gotinên xweş û bedew gotin û piraniya wan di gotinên xwe de xweziyên me anîn ser ziman, dema gotin: Xweziya me bi wê roja ku em hestiyê Mîrê Mîran, Mîr Bedirxan û her du neviyên wî bibin bajare Cizîra Botan.

Min jî helbestek bi navê ‘Serdana Gora Mîrê Cizîra Botan Li Şamê’ xwend digel ku min belavokek bi zimanê Erebî, bi nasîna Mîr Bedirxan, Mîr Celadet û Rewşen Xanim amade kiribû, min ew belavok li besdaran belav kir.

Ev e çîroka gora Mîr Bedirxan, Mîrê Cizîra Botan li Şamê. Sed rehmet li giyanê tevan bibare.

ALA KURDAN DI NAVBERA BEDIRXANÎ Û BARZANIYAN DE

Di roja 09.06.1999'an de, serokatiya encûmenê wezîran di hikûmeta herêma Kurdistanê de projeyê bilindkirina 'Ala Kurdan' pêşkêşî parlemanê Kurdistanê kir, endamên parlemento jî bi yek dengî ew proje pejirandin.

Ala Kurdan: Ev Ala ku ji jêr ve rengê kesk e, ji ortê ve rengê spî ye û rokek di nav de diçirise û ji jor ve rengê sor e.

Bi ragihandina vî projeyê pîroz re, gelek bûyer hatin bîra min, bûyerên ku bi Ala Kurdan ve girêdayî ne û pê re pêre ez di sala 1919'an de vegeriyam. Ev sala ku Ala Kurdan tê de hatiye damezirandin.

Di destpêka sala 1919'an de, di civîneke 'Komela Tealî Kurdistan' de li Stenbolê, bi serokatiya serokê wê yê duwem Mîr Emîn Alî Bedirxan, biryar hat standin ku xaka Kurdistanê ji hêzên Tirk û biyaniyan rizgar bikin û serxwebûna Kurdistanê diyar bikin. Ew Kurdistana azad û serbixwe alek jê re diviyabû. Hingê di wê civînê de Emîn Alî Bedirxan û hevalên xwe rengên Ala Kurdistanê bijartin, amade kirin û Ala Kurdan danîn (Eynê vê Ala niha). Da ku piştî qewirandina hêzên Tirk û biyaniyan wê Alê di asmanê Kurdistanê de bilind bikin.

Lê mixabin, çendî car wê Alê diviyabû xwe aşkere bike, lê nedihat aşkerekirin, şerê wê bi dijwarî dihat kirin. Wê Alê jî ji cihê xwe yê veşartî nedîhişt ku neyarên wê têr razên. Tevî vê rewşa xerab vê Alê du carî asmanê Kurdistanê xemilandiye û dilê welatiyêن xwe geş kiriye. Cara pêşîn di sala 1929-1930'yan de bû, di van her du salan de, ev al ji rex General Îhsan Nûrî Paşa û hevalên wî di şoreşa Araratê de hatiye bilindkirin li ser Çiyayê Araratê. Cara din di roja 22.01.1946'an de bû, di roja beyankirina Komara Demokrat li Mehabadê de li navtara Çarçira de. Lê mixabin, di van her du caran de ev Al bi darê zorê hat daxistin û ma qedexe.

Di sala 1932'an de Mîr Celadet Alî Bedirxan kovara 'Hawar' li Şamê weşand. Mîr Celadet yek ji serokên civata Xoybûnê û şoreşa Araratê bû. Di hejmara 5'an de di kovara xwe 'Hawar'ê de helbestek weşand, avêtiye ser Ala Kurdan:

*Alê Kurdan di nav rok
Çi bedew û bi heybet*

*Bi çar reng e, rengê te
Çi delal û ci xweşkok*

*Xêzek kesk û xêzek sor
Nav spî û nîvek zer*

*Keskesor e bi roj e
Ev li jêr û ew li jor*

Di hejmara 8'an de ji eynî kovarê (Hawar), birayê wî Dr. Kamîran Bedirxan jî yek ji hîmdarên Komela Xoybûnê û berpirsyarekî serhildana Araratê wî jî helbestek belav kir li ser Ala Kurdan:

*Ronahiya dil û çav
Diyariya dê û bav*

*Pêşîra wê roj û tav
Spehîtiya ax û av*

*Ala Kurdan ser bi ser
Sor û gewre kesk û zer*

*Qehremanê ceng û şer
Qublegehê mê û nêr*

*Cayegahê can û ser
Afîtaba dar û ber*

*Ala Kurdan ser bi ser
Sor û gewre kesk û zer*

*Hêviya xortan û mîr
Mihraba mizgeft û dêr*

*Sahê evd û şahê şêr
Bi reng ûbihne zîv û zêr*

*Ala Kurdan ser bi ser
Sor û gewr e kesk û zer*

Tevî xwînrijandina wek çem di şoreşa Araratê de û herifandina şoreşê, Mîr Celadet bêhêvî nebû, dilê wî ma bi ser Ala Kurdan ve û Ala xwe ji bîr nekir.

Piştî helbesta xwe bi çend heyvan, gotarek bi navê ‘Welat, Welatînî û Al’ di kovara xwe Hawarê de, hejmara 9’an de weşand û tê de got:

*“Her millet xweiyê alekêye, al nişana millet û welêt e,
tevayiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye.*

Al namûs, rûmet, bextê mileta ne. Zarowên her mileti ji bona bilindî û biqedirbûna ala xwe, bê perwa xwe didin kuştin, ala her mileti jê re behaye. Di cejn û şahînetan de qesir, xanî û koçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, silavan lê dikan, wê maç dikan, datînin ser serê xwe.

Alên mileten bi serxwe, di ser kelat û bajarêwan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de divekin pêsiyê.

Lê alên mileten dîl, wek ya milete me, ji her derê bi derkirî, li hevtewandî, li ser dilê zarowêwan de hilandî ne.

Miletên dîl dixebeitin, xwînên xwe dirjênin ku biyaniyan ji welatê xwe biqewirînin û alên xwe li ser kelat û bajarêwan xwe ji nû ve daçikînin.

Ala her miletî bi çend rengan û bi şiklekî dine. Ala Kurdan ji jor ber jêr ve, ser hev; sor, sipî û keske, di nava wê de roj diçirise.

Divêt zarowên Kurdistanê bixebeitin û rojekê barê vê rayê hilînin, ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilind bikin, li wê bi birûskînin, welatê xwe ser avahiya xwe a pêşîn vegerînin û di bin tava wêre bi serxwe û bi kamiranî bijîn.”

Mîr Celadet Alî Bedirxan

Piştî van gotinên Mîr Celadet Alî Bedirxan êdî ez nema dizanim ci bibêjim; di pesnê Ala Kurdan û parastina wê de. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e: Piştî 87 salan ji danîna reng û amadekirina Ala Kurdan, piştî bi dehan şoreşen bi xwîn, bi hezaran şehîd... Va ji nû ve bi saya şorea Barzaniyê nemir, bi saya welatiyên bi rûmet, dilsoz û wefadar em Ala xwe bilind dikan di esmanê Kurdistanê de û serbilind û serfiraz em di bin siya wê de dijîn.

Heger Mîr Emîn Alî Bedirxan û hevalên xwe rengên Alê danîbin û Şêx Mehmûdê Hefid, Îhsan Nûrî Paşa, Ferzende, Memdûh Selîm Wanlı û hwd. li ser giriya bin, heger pêsewa Qazî Mihemed ji bo wê hatibe bidarvekirin û Barzaniyê nemir ji bo wê sînorên bi xwîn derbas kîrin heta ku xwe gihandiye Sowyeta berê, va îro bi saya welatiyên dilsoz û birûmet Ala me li ser xaka Kurdistanê bilind, li ba dibe. Hêvî û xewnêwan gorbihuştiyan dibin rastî û her bijî Ala Kurdan, bijî Kurd û Kurdistan.

ÇIROKA VEKIRINA PIRTÛKXANEYA BEDIRXANIYAN LI DUHOKÊ

Di şeva 10.11.1999'an de, me li Kurdistan tv.yê temaşê dikir û ji nişkan ve peyamê vekirina Pertûkxaneya Bedirxaniyan li Duhokê hat ragihandin û berçavkirin.

Bi ragihandina vê peyamê re bi dîtina avahiya vê pertûkxaneya dîrokî re û bi pişdarbûna wî cemawerê zexm re, di nav wan de Kak Nêçîrvan Barzanî û Sînemxana Mîr Celadet Bedirxan, tevzînok bi laşê min ve hilkişîyan û ji kîfan re, wek çûkekî ji ser dilê min firiya, pir kîfa min hat û kûr ramiyam, di dîroka Bedirxaniyan û Barzaniyan de û bêhay ev gotina pêşîyan hat ser zimanê min; 'Mêr mîran nas dikin' û min ji xwe re got:

- Xewnek ji xewnêن min hat cî...

Bingehê vê pertûkxaneyê, Sînemxana Mîr Celadet Bedirxan di roja 22.04.1998'an de danîbû, roja ku yekemin rojnameya Kurdî ji berî sed salî ve li Qahîreyê hatibû weşandin (roja 22'yê Nîsana 1898'an) ji rex Mîr Midhet Bedirxan ve û iro ev roj (22'yê Nîsanê) bûye roja rojnamevaniya Kurdî di nav Kurdan de.

Dergehê vê pertûkxaneyê di roja 09.11.1999'an de hat vekirin ji rex Kak Nêçîrvan Barzanî û Sînemxana Mîr Celadet Bedirxan ve digel kak Şewket Şîx Yezdîn wezîrê darayı û aborî ve /hingê/ û kak A. Azîz Teyib Parêzgehê

Duhokê yê gingê û Kak Ferda Toran serokê rêkxistina (Diyakonya) ya Siwêdî û gelek ji navdarên xelkê parêzgeha Duhokê.

Di vekirina pertûkxaneyê de Kak Nêçîrvan Barzanî gotinek balkêş der barê malbata Bedirxaniyan û rola rewşenbîriyê di avakirina welatan de got û bi firehî piştgiriya xwe ji nivîskar û rewşenbîran re da xuyakirin. gotina wî wek bangekê bû ji tev rewşenbîrên Kurd re, wek di vî perçî de got:

“Li vir ez dixwazim ji rewşenbîr û nivîskarên gelê xwe re bibêjim, li Duhokê bin li Zaxo bin, li Silêmaniyê bin, li Hewlêrê bin, heta ku li derveyî herêma Kurdistanê bin, ez ji wan re dibêjim: ev delîveya ku iro li Kurdistanê bi dest me ketiye, ji dest xwe bernedin, divê hûn rahijin pênuşên xwe û ji nû ve babetên ferheng û toreyî binivîsinin û vejînin, çawa bin ew babet ne xem e, nû bin, kevn bin, binivîsinin.”

Em wek Hikumeta Herêma Kurdistanê amade ne ji alîkarî, piştgiriya ci kesê ku projeyên ferhengî û toreyî li bal hebin...”

Di baweriya min de ev yekemîn car e di dîroka Kurdan de ku wiha pirtûkxane li Kurdistanê têne damezirandin, heger mirov li bingehê vê yekê bigere wê bibîne ku bingeh, rîbaza Barzaniyê nemir e, xwîna bi hezaran şehîdan e û encameke ji encamên şoreşa Îlon û Gulanê ye.

Ji dil û can em vê pirtûkxaneyê li gelê Kurd pîroz dikin û em piştgiriya xwe ji mamoste Enwer Mihemed Tahir re

rêveberê pirtûkxanê pêşkêş dikan, ci ji me dixwaze em jê re amade ne...

Sibeha 11.11.1999ê, ez ji mal derketim li ber derî, du cîranên min bi hev re diaxivîn, min silav li wan kir û bi wan re sekinîm.

Yekî ji wan got:

- Cîran! Te dît, şevê din di K.tv. de, bê çawa Neçîrvanê Barzanî neda pêşıya Sînemxan keça Mîr Celadet Bedirxan (keça Mîrê Botan) weleh yabo esîl e, ew jî ne kêmî bav û kalên xwe ye...

Min lê vegerand û got:

- Ma çendên wek te navê kurên xwe kirine Îdrîs? Û çima navê Îdrîs di nav me de pir belav e?

Li min vegerand û got:

- Weleh yabo, me navê rehmetiyê Îdrîsê Barzanî li zarokên xwe kiriye, ka zilamên wekî wî?

Min lê vegerand:

- Ev Şepal jî kurê wî Şêrî ye.

Û min xatir ji wan xwest û ez bi riya xwe de meşiyam.